


# Bîranîna

# ELÎ KAŞIFPÛR

1957 – 1990

**Serî dana ji bo Kurdistaneke serbixwe ye têr azadî, aştî û demokrasî**

# BÎRANÎNA ELÎ KAŞIFPÛR



Elî Kaşifpûr (1957-1990)

# BÎRANÎNA ELÎ KAŞIFPÛR

**Bîranîna Elî Kaşifpûr**

Çapa yêkemîn: Gulan / Maj 1997

Çapa dûyemin digital: August 2014

Karê teknîkî û weşan: Weşanxaneya Xanî & Bateyî: 8

ISBN: 87-983307-7-2

Amadekarîya pirtûkê ji bo weşan û çapê û redaksîyon:
**Rojan H.**

Wergêrîya ji farisî û guhartina ji soranîya tîpên kevin:
**Mizefer Begzade & Xosrow Abdullahî**

www.elikasifpur.com

**Copyright © 2014 Kerîm Kashefi**

# PÊŞGOTIN

Xwandevanên hêja!

Ev pirtûka bîranînê, tenê ji bo qedirnasîya zehmet û  çalakîyên şehîdê nemir kek Elî Kaşifpûr (Kaşifî) hate amadekirin. Di vê pirtûkê da, em tenê li ser hindek pirs û çalakîyên giştî sekinîn. Ji ber ku şertên îro yên têkoşînê û rewşa Kurdistanê, destûrê nadin ku em behsê hemû tişt û pirsan bikin û birêjin ser kaxezê. Gava roj hat, ev pirse divêt wekî dîrokê bêne nivîsîn.

Şehîd Elî, hemû pirsên girîng yên tevgerê, rojane û wekî bîrewerî dinivîsîn û xweşbextane piranîya wan nivîsar û bîrewerîyan jî hene û em hêvîdar in, ku rojekê bi pêkhatina şertên di rê da, ne tenê ev bîrewerî, belkî hemû rudayên girîng yên tevgerê, di pirtûkekê da bêne weşandin.

Di dawîyê da; em sipasî kek Rojan dikin, ku pirtûk bi tîprêzî, mîzanpaj û redaksîyonê ve amadeyî weşan û çapê kir. Dîsa sipasî Weşanxaneya Xanî & Bateyî dikin, ku pirtûk di nav weşanên xwe da weşand. Herweha sipasî kek Xosrow û kek Mizefer jî dikin, ku di wergêrîya ji farisî bo kurdî û herweha guhartina ji soranîya tîpên kevin bo kurmancîya latînî da gelek zehmetî kêşan.

Helbet li hemû dost û hevalên ku bi dîtin û bîranînên xwe yen di derheqa Elî da beşdarîya pirtûkê kirine jî, bi germî û ji dil spas dikin. Digel hemû dost û hevalan, divê em sipasî binemala Îsmaîlzade jî bikin, ku di hewar çûna Elî da, her dem mil bi milê me ve bûn.

Hêvîdar in ku xwûna van hemû şehîdan bi avê da neçe û digel hemû xelkê me yê zorlêkirî, binemalên şehîdan jî bigehin xwezîyên xwe yên demîn:

Serxwebûn, azadî, aştî û demokrasî ji bo Kurdistanê!

Malbata şehîd Elî Kaşifpûr (Adar 1997)

BIRA 1

# BÎR Û DÎTINÊN DOST Û HEVALÊN ELÎ KAŞIFPÛR

# NAMEYA ELÎ

Elî Kaşifpûr (Kaşifî), endamê berê yê komîteya navendî ya Partîya Demokrata Kurdistana Iranê û endamê komîteya navendî ya Partîya Demokrata Kurdistana Iranê – Rêveberîya Şoreşger, di nîveşeva 14.08.1990ê da ji mala xwe ya li sirgunê (tebîdgehê) li bajêrê Konyayê (Tirkîyê) hate revandin. Roja paştir, polîsê Tirkîyê cenazeyê wî yê çend gulle lêketî û di nav xwûnê da mayî, bi destên girêdayî ve li ser rêya Konya – Ankarayê peyda kir.

Elî Kaşifpûr, di sala 1957an da li gundê Pîrancikê li dorhêla Urmîyê hate dinyayê. Xwandina xwe ya seretayî (pêşîn) di gundê Howesinê da derbaz kir û di dû ra ji bo xwandina navîn digel çend xwandekarên navçeyê çû bajêrê Urmîyê. Piştî xilas kirina xwandina navîn, li zanîngeha (Universiteya) Tewrêzê qebûl bû û li wê derê salekê di branşa zanista civakî (sosyolojî) da ders xwand. Sala dîtir, careke dî di konkura seranserî da beşdarî kir û vê carê di branşa huquqa siyasî da li Unîversiteya Tehranê qebûl bû. Di sala 1978an da, ku Elî xwandekarê sala çaran bû, tufana şoreşê di Iranê da dest pê kir. Wê gave Elî jî tevî pêl u refên serhildana giştî ya dijî rejima Şah bû û çend caran ji hêla xulamokên rejîmê ve û bi tohmeta “Marksîstê Islamî” kete ber taqîb, azar û tedayê.

Hilweşîna rejima Şah, digel êrişên kevneperest û helperestan (oportunîstan), bitaybetî yên kevneaxayan, bû sebeb ku Elî ji bo parastina mafê gundî û cotyaran û herweha ji bo hişyar kirin û raperandina wan, here navçeya bakûra Kurdistana Îranê. Wî bi pêkanîna pirtûkxaneyekê li gundê Howesinê dest bi xebata xwe kir. Di dû ra bi civandina hejmarek ji hevalên xwe yên heyamê zarotîyê û xwandinê û gundîyên xort, yêkemîn komika berxwedanê çêkir, ku wê komê roleke girîng di hember êrişên axayan da leyist.

Demê ku êrişa leşkerî ya rejima melayan li dijî Kurdistanê dest pê kir û helperestên dijî mafê cotyaran li jêr sihwana himayeta hukumetê û li dijî werzigaran çek hildan, komika têkoşer û xebatgêr ya ku Elî Kaşifpûr pêkanî bû û di bakûr Rojhilata Kurdistanê da bibû xwudan rûmeteke mezin, çû nav refên Partîya Demokrati Kurdistana Îranê û xebata xwe ya hêja domand.

Di kongreya çaran ya partîyê da, ew bi geş û gurî li dijî desteya ku dixwast digel rejîmê hevalbendîyê bike, rawesta. Lê ew herwisa jî li dijî wê çendê bû ku têkoşerên Kurd li hemberî hevdu çekan bi kar bînin. Ji wê demê û pêve ew pêştir bû endamê şêwirkar yê komîteya navendî û paşê jî bû endamê komîteya navendî. Wî bi ibtikarên xwe yên leşkerî - partîzanî di seranserî bakûr Rojhilata Kurdistanê da bi gernasî deng dabû û hatibû nasîn.

Piştî deh sal têkoşîneke bêrawestan û dijwar, Elî Kaşifpûr ji bo mehekê bi rêvingî hate Parisê (Serbajêrê Fransayê). Vê rêvingîyê çavên wî yên edaletxwaz vekirin û bû sebebê nasîna hindek rastîyan. Piştî mehekê, ew dîsan vegerîya Kurdistanê. Di vê demê da, şerê çekdarî qels bibû û têkoşîna hindurî ya rêxistinî ya di nav refên partîyê da gur bibû. Elî, ji bo parastina demokrasîyê di hindurê partîyê da dest bi xebat û têkoşînê kir. Ev têkoşîna hindurî, di dawîya kongreya heştan ya partîyê da, bû sebebê cudabûna grûpa pazdeh kesî û pêkanina rêveberîya şoreşger û Kaşifpûr digel çend rêvebirên navdar yên ji partîyê cudabûyî, bû endamê komîteya navendî ya partîya nû pêkhatî.

Lê, rexne û lomeyên rast û durust yên vê grûpa nû pêkhatî û hevahengîya wan di demê cudabûnê da, ne bi wê manayê bû ku ew li ser mercên qelsbûna (zeîfbûna) tekoşînê û pêwîstîya raborîna merheleyeke borek (întîqalî), di têkoşînên xelkê Kurdistanê da xwudanê yêk dîtin û nasîneke wekhev bûn. Tengavîya şerê çekdarî, ku di mercên bi aşkerayî naberaber da ketibû astengê, pêwîstîya guhartina awayên têkoşîne didan ber çavan. Lê, wan mêrên ser hişk û polayîn, li jêr tesîra îrade û xuyên xwe yên şervanîyê, nikarîbûn wê pêwîstîyê digel mercan û guhartina awayê têkoşînê binasin û her ji ber vê yêkê jî nikarîbûn rêyên ji astengê derketinê peyda bikin û wan bi kar bînin û bi vî awayî pirsgirêkên ku bi xwe bibûn sebebê nerazîbûnê, pêkhatina hişyarî û berxwedana wan di hindurî Partîya Demokrat ya Kurdistana Îranê da û di dawîya dawîn da bibû sebebê cudabûnê, niha destên wan bi xwe di hindurê partîya nû pêkhatî da girêdidan û ji bo derketina ji vê astengê, wan ji bilî çend hereketên mişexes, ku di destpêkê da bi kar anîn, çu tiştekî dî nedinasîn.

Lê ji hêla dî ve, çekên ku ji bo şer li dijî rejima îslamî hatibûn terxan kirin, ji alîyê hevalên wan yên pêşîn ve bi caran ji bo rijandina xwûna wan kesan bi kar hatin ku cudabûnê ew ji hev û du veqetandibû û pêştir heval û hevpeymanên hev û du bûn. Di van mercan da, Kaşifpûr biryar da ku jin û zaroyên xwe ji nav agir derxîne û wan bişîne derveyî welatî. Lê di vî karî da hevalên wî wekî temaşevan man û çi alîkarî ji wî ra nekirin. Kê dizanîbû ku li derve, dûr ji enîya şerê Kurdistanê ya dorpêçkirî ya di pişt sînorên Îraqê da, enîyeke din bi awayê dafikekê ji bo Kaşifpûr di halê vekirinê da bû. Di vê cephê da, azînên (metodên) nezelal yên komîserîya bilind ya Rêxistina Neteweyên Yêkgirtî ji bo penaberan (multecîyan) li Ankarayê, bi xwe xwudanê rola yêkemîn bû û heta îro jî ji bo kesekî ku bixwaze li ser hadîseyê û çawahîya wê hindek tiştan bizane, cihê pirs û gumanê ye.

Îsrar kirina Komîserîya Bilind ya ji bo penaberan, Elî Kaşifpûr ji Îraqê kişand û anî Ankarayê û ji wira jî ew şande kampa penaberên Îranî ya bêparastin li bajêrê Konyayê. Li wê derê, di nîvê şeva 15. 08.1990an da ew ji alîyê mirovkujên Komara Îslamî ve, ku cilên polîsê Tirkîyê li ber xwe kiribûn, hate revandin. Cenazeyê wî yê di xwûnê da mayî, di roja 16.08.1990an da, roja damezrandina Partîya Demokrata Kurdistana Îranê, hate dîtin. Ev yêke, çawa ku girîng bû, ewqas jî xwudan mana bû. Elî Kaşifpûr, bi qasî deh salan serek û

fermandarê xebata siyasî û çekdarî ya di navçeya bakûr Rojhilata Kurdistanê da bû û xelkê vê navçeyê ew wekî qehremanê armanc û daxwazên xwe dinasîn û navê wî ji wan ra dibû sebebê bihêz bûn û geşbûna zewq û şewqa têkoşînê. Di demê şehîdbûnê da, Elî 32 salî bû. Lê, di têgihiştina serketin û şikestan da ewqas tecrube, agahdarî û hêjatî qazanc kiribû ku dikarîbû di sernivişta têkoşînê ya dahatî da roleke musbet bileyîze.

Kaşifpûr, mêrekî sed mêran bû, ji wan mêran ku digel şoreşê pêk tên û dikarin bi hêsanî tevî hêzên xelkî bin û di nav wan da, bêyî ku xwudanê îddîayekê bin, bigihijin rêveberîyê û xelkê ji bo bi dest xistina armancên wan ber bi pêş ve bibin. Mêrên weha, heke ku bimirin jî, ji xwûna wan qehreman tên afirandin û her çend ku dem û dewran jî derbaz bin, ew çend ew qehreman di armanc û daxwazên xelkê da zêdetir cih digirin û dibin xwudanê rûmet û rêzdarîyeke mezintir.

Elî, bi hêsanî tevî xelkê dibû, ji êş û derdên wan dizanî û digel wan dibû xwudanê tefahumeke hevbeş. Çu caran wî rêxistina xwe bitenê nehişt û di demên bi tehluke û şer da tim li rêza pêşîyê bû. Ew mirovekî xwudan inisiyatîv, sazûmander, bernamerêjekî hêja bû û inisiyatîvên wî yên deh salên şerê partîzanî di navçeya bakûr Rojhilata Kurdistana Îranê da, wê di dahatî da jî bi kêr bên.

Kaşifpûr, di danûstandinên xwe yên şexsî û rabûn û rûniştinên xwe yên insanî da jî, her xwudanê sadetî û durustkarîya qehremanan bû. Ew mînakeke herî berçav ya ji wan birêvebirên xort e, ku ji dilê şoreşê û ji kûranîya rojên bitufan û dijwar derdikevin û hêjahîya xwe nîşan didin. Wî, hişyarî, zû têgihiştin û dûrdîtinîya ronakbîrekî agahdar, tevî mêrxasî, durustkarî û şoreşgerîya kadirekî rêxistinî kiribû.

Realîzm, hişyarî û zû têgihiştina Kaşifpûr, di nameyên ku wî ji bo hevalên xwe şandine Ewrupayê, bi awayekî aşkera xuya dikin. Di nameyeke pir bi êş û kovan da, ku wî 29 rojan berî revandina xwe (16.08.1990) ji dostekî xwe ra rêkiriye û nameya wî ya herî dawîn e, wisa dinivîse: “Ji ber ku te… ji min ra şand, bi qasî dinyayekê ji te sipasdarim. Ev karê te, ez pir serbilind û keyfxweş kirim… Ev karê te, tiştekî bêhevta bû û di mercekî wiha da bû, ku ez ketibûm bêimkanîyê û li cihekî bû ku tu bi xwe dizanî cihekî çawan e… Hêvîdarim, ku rojekê ji nêzîk ve digel hev li ser pirs û pirsgirêkên heyî biaxivin û bidin û bistînin.”

“Tu, li ser mercên ku ez têda bûm û neçar bûm, kêm û zêde, hindek tiştan dizanî. Bawer bike, min qet di xewna xwe da jî fikra vê yêkê nedikir, lê problemên malbatî û mercên pêkhatî, wisan li min kirin ku ji bilî vê biryarê çu rê û çare ji min ra nemabû. Her çend ku hevalên min digel vê biryarê miwafeqet kirin, lê di emel da xwe ji min dûr girtin û ne tenê çu problemek ji problemên min çareser nekirin, belkî pir tiştên nebaş û kirêt jî li pey min xistin û li pişt serê min gotin. Qet nebe, tu hindekê min dinasi û dizanî ku ez ji wan kesana nebûm, ku di hindek mercan da hevalên xwe bitenê bihêlim û heta dawîyê digel wan

nemînim. Lê mixabin, çu çareyeke dî nêbû. Ji alîyê dî ve, rêya têkoşînê rêyeke dûr û dirêj e û şevek an rojek nîn e û xwudanê şêweyekê tenê jî nîn e. Lê hin kes nizanin û wisan difikirin ku rûniştina li pişt tixuban baştire ji çûyîna Ewrupa û nasîna dinyaya derve.

Di vê nameyê da zêdetir nanivîsim, heke nameya min gihişte destên te û min bersiv stand, di nameya dahatî da, ez dê li ser derdan pitir binivîsim...

DigeI silavan.

Elî, 16.07.1990"

**P. Heqîqet**

# JÎYAN Û MIRINA TÊKOŞEREKÊ, KU DI DILÊ XELKÊ BAKÛRA KURDISTANA ÎRANÊ DA CIHE XWE GIRTIBÛ

Elî Kaşifî, di sala 1957an da li gundê Pîrancikê li navçeya bajarê Urmîyê di malbateke navgîn (mutewessit) da hate dinyayê. Piştra malbata EIî çû gundê Howesinê û li wê derê bicih bûn. EIî xwandina xwe ya destpêkê di vî gundî da qedand. Ew şagirtekî çalak û jîr bû. Wî salên sê û çaran yên xwandina destpêkê di salekê da derbaz kirin û qebûl bû. Şagirtên gundan piştî xilaskirina xwandina destpêkê divêt ji bo dom kirina xwandinê biçûna bajêr. Elî, digel hevalên xwe yên gundî çûn bajêrê Urmîyê û li wê derê bi hev ra malek kirê kirin û mijûlî xwandinê bûn. Wî, Iîse li Urmîyê di branşa edebî da qedand. Havînan ku dihat gund, aIîkarîya malbata xwe dikir. Jêhatîbûna wî di xwandinê da, dan û standinên wî yên germ û semîmî û herwisan rûhîyeya wî ya hevkarîyê di navçeyê da deng dabû û ketibû ser zimanan. Piştî timam kirina Iîseyê, Elî di azmûna ( konkura) seranserî ya ji bo qebûl bûna di zanîngehên Îranê da beşdarî kir û di zanîngehên Tewrêz, Meşhed û Îsfehanê da hate qebûl kirin. Lê, ji ber ku zanîngeha Tewrêzê nêzîkî malbata wî bû, li wê derê di branşa civaknasîyê (sosyolojîyê) da navê xwe nivîsî û mijûlî xwandinê bû. Piştî salekê, Elî careke dî di azmûna (konkura) seranserî da beşdarî kir û vê carê li zanîngeha Tehranê di branşa hiquqa siyasî da qebûl bû û çû li wê derê xwandina xwe berdewam kir.

Gava ku di sala 1978an da serhildana gelên Îranê li dijî rejima Şahîtîyê ya malbata Pehlewî dest pê kir, Elî termîna yêkan ya sala çaran (sala dawîn) ya fakulta hiquqa siyasî xilas kiribû. Di vê raperînê da, Elî pir bi çalakî beşdarî kir û çend caran ji alîyê polîsên Şah ve bi tohmeta "Marksîstê lslamî" kete ber taqîb, lêdan û tedayê. Piştî serketina melayan û damezrandina rejima Komara Îslamî, zanîngeh bûn cigehên nivêj û lawijên olî. Bi vî awayî, hêvîdarî û daxwazên gelên Îranê, ji bo azadî û demokrasîyê, ne tenê pêk nehat, belkî melayan roj bi roj zêdetir pêşî li xebat û têkoşîna xelkê û di dawîyê da jî bi darê zorê hikûmet xistin destê xwe. Di vê demê da gelê Kurd yê Kurdistana Îranê jî, ku daxwaza azadî û demokrasîyê dikir, ji hêla rejima Komara Îslamî ve ketibû ber zulm û tedayê û bajêr û gundên Kurdan dihatin bombekirinê.

Elî, ku rojreşî û belengazîya çîna xwe û herwisa jî sitem û zordarîya ku li gelê Kurd dihat kirin, her ji berê da his kiribû, li dijî vê sitema nû dest bi xebatê kir û piştra tevî refên Partîya Demokrat ya Kurdistana Îranê bû û têda ji bo azadîya gelê Kurd têkoşî. Wî di

destpêkê da bi alîkarîya hevalên xwe pirtûkxaneyek bi navê “Pirtûkxaneya Zehmetkêşan” li gundê Howesinê damezrand û pir pirtûkên bikêrhatî li wê derê civandin. Piranîya xortên navçeyê jê istifade dikirin û ew bibû çavkanîyeke herî hêja ji bo bilind kirina sewîyeya agahdarîya xortên navçeyê Elî her tim xort ji bo xwandin û bi dest xistina zaninê teşwîq dikir û ji wan ra digot, ku sebebê paşda mayîna me nezanî û nexwandewarî ye û me divêt em li dijî nezanîyê têbikoşin.

Di navçeya bakûra Kurdistana Îranê da partî bi awayekî aşkera xwudan çalakî bû û ew navçeye bi giştî azad bibû û ketibû destên pêşmergeyan. Û di vê yêkê da beşekî herî girîng netîceya çalakî û xebata Elî bû û herçend ku hindek axayên dewerê li dijî partîyê bûn, lê çu tişt ji destê wan nehat.

Di sala 1979an da kongreya çaran ya partîyê li Mahahadê hate girtin û EIî wekî endamê şêwirdar yê komîteya navendî hate hilbijartin.

Gava ku rejîma Komara Îslamî dest bi bombekirina binkeyên partîyê yên li navçeya bakûra Kurdistana Îranê kir, yêkek ji wan gundan gundê Gîçê bû. Demê bombebarana Gîçê, Elî di gundê Axçeqelê da mijûlî amadekirina tîmê imdadê û dermanan bû û wê gavê gundê Axçeqelê jî hate bombekirin. Kek Elî digeI sê kesên dî di bombe kirina binkeya leşkerî ya partîyê ya li gundê Axçeqelê da hate birîndarkirin. Herwisan keçikeke nû destgirtî jî di vê bombebaranê da hate şehîdkirin.

Birîna Elî, birîneke xedar bû û parçeyeke gulla topê bi singê wî ketibû û tenê çend santîmetre mabû ku bigihije dilê wî.Niştegeriya herçi zûtir jê re pêwîst dikir. Lê ji ber ku di navçeyê da çu imkanên bijişkîyê nebûn, ew bi neçarî û bi hizar zehmetî bişev şandin bajer Urmîyê. Lê wê şevê ji ber êrişên balefirên Îraqî û bombebaran kirina bajêr,hemû nexweşxaneyên taybetî girtî bûn û tenê nexweşxaneya dewletê ya bi navê “Şîr û Xurşîd” vekirî bû. Bi neçarî, Elî birin wê derê û razandin. Ji ber ku birîna wî ji hindur ve xwûnrêjî dikir, divîya ku her wê şevê yê niştegerî jê re bê kirin. Lê ji ber êrişên balefirên Îraqî û vemirandina elektrîka bajêr, doktora nikarîbûn bêne nexweşxaneyê. Ji ber wê yêkê sibê zû doktoran ji bo Elî niştegerî kirin û nîv lître xwûn jî dane wî.

Her wê şeva ku Elî li nexweşxaneyê bû, pêşmergeyan êrişî ser ordîgeha Urmîyê ya bi navê “Leşkerê 64”an kirin û şerê di navbera pêşmerge û eskerên Îranê da heta gihişte ber nexweşxaneyê jî. Nexweşxane tijî birîndar û kuştîyên dijmin bibû. Lê digel wê yekê jî Elî qet neditirsîya û gelek serxwe  bû. Me pêştir tiştên weha di fîlman da dîtibû, Iê vê carê me ew yêke her rastî bi çavên xwe didît: Ew jî eve bû kesekî ku bi destê dijmin hatibû birîndar kirin, di cihekî da ku bi giranî di bin kontrola dijmin da bû dihate derman kirin. Helbet bi alîkarîya dostên gelê Kurd. Elî hefteyekê di nexweşxaneyê da ma û piştî hefteyekê ji nexweşxaneyê derket û çû bal hevtêkoşer û hevalên xwe.

Çend mehan nekişand ku cereyana kongreya çaran ya ku bi navê cudabûna "gruba heft kesî" meşhûr e, pêk hat. Ev grûpe bi alîkarîya rejimê têkoşî, ku seranserî navçeyê ji destên pêşmergeyan derxine. Bi rastî xebat û têkoşîn di navçeyê da pir dijwar bibû û bi rastî di wan mercan da dilêrî û mêranîyeke bêhempa pêwîst bû heta ku mirov bikare bi hêzeke mezin li hemberî hêzeke dî ya mezin û berfirehe êrişker bisekine. EIî, ku xiyaneta desteya heftkesî dizanî, di vê merhela dijwar da jî xekê xwe bi tenê nehêla û bi qebûl kirina hemû zehmet û tengavîyan karî bi xelkê bide zanîn ku ew deste ne tenê di fikra qazanca xelkê xwe da nîn in, belkî teslîm bûne û xwe firotine dijmin.

Di merheleyek ji merheleyên vê têkoşînê da, Elî mecbûr ma digel pêşmergeyan ji navçeya bakûra Kurdistana Îranê derkeve û biçe navçeya navendî ya Kurdistana Îranê. Li vê der de pêvîste bête gotin, ku wan Iawên mêrxas yên gelê Kurd ji bo ku xwe bigihînin mavçeya merkezî ya Kurdistana Îran divîya bi hizaran astengî û dijwarîyên mezin ra hemberîyê bikin, di vîya bi şev û roj şer bikin, ji dafik û peyketinên dijmin xwe biparêzin an wan bişkênin û h.w.d... Di dawîyê da xiyaneta taxima heftkesî jî bi ser neket û xelkê navçeyê ji xiyaneta wan têgihîştin û piştî salekê partî careke dî vegerîya navçeya bakûr rojhilata Kurdistanê. Lê vê carê wezîfeya partîyê ji cara berê girantir bibû. Divîya pêşmerge biçûna û hemû deverên vê navçeyê bidîtina. Vê carê, pêşmerge heta deverên Selmas û Makoyê jî pêşda çûn. Her çend ku êdî navçeya azadkirî kêmtir bibû û divîya pêşmerge ji sedan binkeyên dijmin derbaz bin, lê digel wê yêkê jî disan dengê gera siyasî-leşkerî ya pêşmergeyan di seranserî navçeyê da belav bibû. Yêkitî û hevkarî geştir û bihêztir bibû û vê yêkê hêvîdarîyeke mezin di nav xelkê da pêkanîbû.

Di sala 1981an da Elî bû endamê komîteya navendî ya partîyê û berpirsiyarê fêr kirina zanyarîyên siyasî ji bo pêşmergeyan yên navçeya bakûra Kurdistana Îranê. Di du salan da wî pir çalakîyên berbiçav di mintiqê da bi cih anîn. Yêkek ji çalakîyên wî yên herî girîng pêkanîna girêdanên qenc û baş di navbera navçeyên bakûr û merkeza Kurdistana Îranê da bû. Bi rastî pêştir, hindek ji berpirsiyarên partîyê yên wê demê bakûra Kurdistanê weki navçeyeke di bin kontrola pêşmergeyan da nedihesibandin, her çend ku xelkê vê navçeyê zêdetir û baştir ji hemû navçeyên di, alikarîya pêşmergeyan dikirin û ew diparastin. Paşe ev yêke di meydana emel da bi başî xuya kir û derkete meydanê, ku xelkê vê navçeyê çend hejî Iawên xwe dikin û çend alîkarî û hevkarîyê ji wan ra dikin.

EIî, di salên 1983, 1985 û 1987an da jî herweha endamê komîteya navendî ya partîyê bû.

Di demê êrişa berfireh û hov ya rejîma Komara Îslamî li dijî pêşmergeyên partîyê da, dîsa Elî fedakarîyeke bêhempa ji xwe nîşan da û mil bi milê pêşmergeyan li hemberî hêzên rejimê şer kir û di roja yêkê ya şer da derbeyên mezin li hêzên rejimê xistin. Bi dehan cendekên kuştîyên dijmin di meydana şer da mahûn. Di roja duyan ya şer da jî, Elî tevî

desteyek pêşmergeya, kesên herî dawîn bûn ku paşda vekişiyan. Bi rastî êdî çu imkan nebû ku pêşîyê ji wê êrişê ya bi çendîn hizar kesan bêt girtin.

Roja 21ê meha rojîyê, em neçar bûn ku ber bi “xaka Tirkîyê” ve paşda vekişin. Lê Elî digel hejmareke pêşmergeyan nehatin nik hêzên Tirk yên ku li ser sînor bûn. Elî digel pêşmergeyan ber bi çiyayên li pişta gundê Koranê paşda vegerîyan. Êrişa dijmin hewqas giran û berfireh bû ku bi rastî şerê cebheyî li hemberî wan nedihate kirin û heke ew kare bihata kirin, bi xwe ji bilî dînîtî û serhişkîyê çu maneyeke wê dî nebû û çu qazancek jî têda nebû. Gava ku em ber bi “xaka Tirkîyê” ve paşda vekişiyan, malbata Elî jî digel me hatibû. Em sê rojan li ser SÎnorê Tirkîyê man. Zext û fişareke mezin li ser me bû. Heta ku karbidestên Tirkîyê yên navçeyî karîn ji karbidestên bilind yên wî welatî destûrê wergirin ku em bê çek û fîşek derbazî “xaka Tirkîyê” bin. Me çek û fişekên xwe dan wan kesana ku dixwastin di navçeya bakûra Kurdistana Îranê da bimînin.

Ew kesana digel çek û fîşekan vegerîyan wê navçeyê. Di dawîyê da em bi qasî du sed kesî digel jin û zarokan derbazî “xaka Tirkîyê” bûn û li bajarokê BaşkaIeyê (Elbak) di medreseyeke şevûrojane da bi cih bûn. Ew du sed kes divîya hemû di wê medresê da bimana. Jin û zarok di qatekê da û mêr jî di qatekeke dî da bi awayê komelî radizan. Xwarin pir kêm bû. Kêmasî di alîyê paqijî û leşsaxîyê da hewqas berbiçav bû, ku mirov dikarî bigota ku qet nebû. Em hemû bêhal û wekî nexweşan bûn.

Me his dikir ku wekî ku em di girtîgehekê da ne. Heqê me nebû ku em ji hewşa medresê derkevin. Lê tiştê herî girîng ev bû ku, xelkê navçeyê di destpêkê da bi dilfirehî di warê xwarinê û imkanatên dî yên ji bo çay çêkirinê  û xwarin daninê da, ji me ra alîkarî kirin. Di van deman da bû ku Elî bi pey hev ji me ra name dişandin û dixwast ku jin û zaroyên wî vegerin nik wî. Wî di nameyên xwe da weha dinivîsî: “Ez his dikim ku hatina jin û zaroyên min digel we, dibe sebebê qelsbûna (zeifbûna) rûhîyeya hindek pêşmergeyan û mimkune ku ew fikir bikin ku ez jî dê wan bi cih da bihêlim.”

Em biqasî sê mehan di wê medresê da man. Hejmareke berfireh ji wan kesên ku digel me bûn vegerîyan Îranê. Û herwekî Elî bi xwe jî dixwast, em mecbûr man, jin û zaroyên Elî digel hindek jin û zaroyên dî yên hevalên ku li nik Elî mabûn, bişînin ser sînor û teslîmî Elî û hevalên wî bikin. Piştî sê mehan karbidestên Tirkîyê yên navçeyê em şandin Stanbolê û li wê derê kampa penaberan ya I.C.M.C (Neteweyên Yêkgirtî) da bi cih bûn. Piştî salekê li wê derê mayînê, em ji alîyê heyeta Hollandê ve hatin qebûl kirin û çûn Hollandê.

Elî,her tim ji min ra name dişand û di nameyên xwe da ji min ra dinivîsî, ku te divê tu ji imkanatên xwandinê yên wî welatî istifade bikî, heta ku di dahatî da bikarî bibaşî ji gelê xwe ra xizmetê bikî. Nebe ku dest vala vegerî, Heke bi destên vala vegerî, dê paşê bi xwe poşman

bî, Iê hingê çu fayde nake. Heke mirov bixwaze, mirov dikare bigihîje her tiştî û di dawîyê da tim ev gotina hanê dinivîsî: “Divê tu tim di fikra vegerê û xizmetkirinê da bî “ Elî.

Di sala 1987an da Elî ji alîyê partîyê ve hate Parisê û bi qasî mehekê li wê derê ma. Lê, mixabin, min tenê karî ez çar rojan digel wî bim. Wî dixwast ku ji bo dîtina hevalên xwe serekê were Hollandê. Lê mixabin, ew imkan pêk nehat. Ez jî vegerîyam Hollandê heta ji bo wî vîzeyekê bistinim. Lê mixabin ez bi serneketim û dewleta Hollandê vîze neda. Di wî dema kurt da ku li Parisê bû, Elî li ser civaka ewrûpî û bitaybetî li ser danûstandinên partîyê yên digel rêxistin û grûpên dî yên siyasi gelek nasyarî bi dest xist.

Bi giştî ew ji rewşa partîyê li derveyî welat razî nebû û di çend civînan da ew yêke ji sekreterê giştî yê partîyê ra got daku di pêşerojê da ew rewş ber bi başbûnê ve biçe û piştî mehekê Elî vegerîya Kurdistanê û ji nû ve dest bi karê xwe kir. Di hindurê partîyê da hem têkoşîna hindurî berdewam bû û hem jî fişara rejîmê ya li ser partîyê zêdetir bibû. Binkeyên partîyê yên siyasî û leşkerî ber bi sînorên Îraqê ve vedikişiyan û di dawîyê da derbazî xaka Kurdistana Îraqê bûn. Li vê derê, têkoşîna hindurî êdî xwudan tesîreke berbiçav nebû.

Elî, ku li navçeya bakûra Kurdistana Îranê dima, nikarîbû ji dûr ve li ser têkoşîna hindurî ya partîyê çu qezawetô bike (çu biryarê bide). Di dawîyê da Elî jî digel piranîya pêşmergeyan hate nawenda partîyê. Partîyê jî ji bo girtina kongreya xwe ya heştan xwe amade dikir. Di sala 1988an da û di cereyana vê kongreyê da bû ku hindek kes ji partîyê cuda bûn. Têkoşîna hindurî êdî ne mimkun bû û ji bilî cudabûnê çu çareyek dî nemabû. Elî ku her tim dijî cudabûn û duberekîyan radiwesta, tevî 15 kesên ji endamên komîteya navendî, polîtburoya û endamên şêwirdar yên komîta navendî di vê kongreyê da ji partîyê cuda bûn. Vê koma 15 kesî di bihara 1988an da bi derêxistina daxuyanîyeke (beyannameyek) bi deh xalan ragihandin, ku ewê ji vir û pê ve di bin navê Partîya Demokrata Kurdistana Îranê - Rêveberîya Şoreşger da bixebitin.

Elî dîsan bû endamê komîteya navendî ya Partîya Demokrata Kurdistana Îranê - Rêveberîya Şoreşger û niha zêdetir ji pêş, hisa berpirsiyarîyê dikir. Wî ku her tim tekrar dikir û digot ku rêveberîyeke Şoreşger divêt di meydana têkoşîn û emel da nîşan bide ka bi rastî şoreşger e. Ji bo sabit kirina vê bîr û bawerîyê, berê xwe da navçeya bakûra Kurdistana Îranê û çû wê derê.

Elî di meydana têkoşînê da sabit kiribû ku çu tiştek nikare wî bide sekinandin û bawerîya wî sist û qels (zeîf) bike. Elî ji bo çareser kirina pirs û pirsgirêkan pir bi ciddî bû û çu caran, berjewendîyên gelê xwe û partîya xwe gorî berjewendîyên şexsî û dostînîyê nedikir. Ew digel pêşmergeyan gelek bi semîmî bû û bi dilekî şewat û pir bi haydarî guh dida pirsgirêk û narehetîyên wan û ji bo çareser kirinê digel wan bi dilsojî hevkarî dikir. Ew xwudanê jiyanek pir sade (besît) bû û yêkek ji xasîyetên wî yên herî baş ew bû ku bi sedaqet şaşîyên

xwe qebûl dikirin û digot ku mirov divêt ji şaşî û serpêhatîyan dersê bistîne. Elî evîndarê têkoşîn û jiyanê bû û tim û tim bi dilekî evînî di derheqa van du babetan da diaxivt.

**Elî çima çû Tirkîyê?**

Ji mêj ve bû ku min ji bo jin û zarokên Elî, ji dewleta Hollandê daxwaza penaberîyê kiribû. Her ji bona vê yêkê jî jin û zarokên Elî digel malbata hevalek ji hevalên wî hatin Tirkîyê û li Ankarayê xwe bi komîserîya bilind ya Neteweyên Yêkgirtî ya ji bo penaberan, dan nasandin. Dewleta Hollandê jî ragihandibû ku dê wan qebûl bike û gava ku heyeta Hollandê ya ji bo wergirtina penaberan çûbû Ankarayê, xwastibû ku digel jin û zarokên Elî jî hevpeyvînê çêbike. Lê komîserîya bilind ya Neteweyên Yêkgirtî bersiv dabû ku jin û zarokên Elî hêj wekî penaber nehatine qebûl kirin. Heyeta Hollandî jî teslîmî dîtina komîserîya penaberan bibû û tenê malbata ku digel malhata Elî hatibûn qebûl kirin. Me ji berpirsiyarên Rêxistina Neteweyên Yêkgirtî ya Tirkîyê pirsî ku çima malbata EIî wekî penaber qebûl nekirine?

Wan bersiv dan û gotin ku ji ber ku malxwêyê (serperestê) wan digel wan nîn e, ew nikarin biçin welatekî dî anku welatekî sêyemîn û ji bo ku em daxwaza wan ya penaberîyê qebûl bikin, pêvîst e ku malxwêyê wan digel wan be. Me EIî li ser rewşa pêkhatî agahdar kir. Piştî çûyîna malbata ku tevî malbata Elî hatibû Tirkîyê, jin û zarokên Elî li wî welatî bi tenê man. Elî mecbûr bû ku ji bû serperestîya wan biçe Tirkîyê. Li wê derê, ew çû Rêxistina Neteweyên Yêkgirtî û digel berpirsiyarên wê rêxistinê rûnişt û ji wan ra got ku ew nikare digel malbata xwe be û ji wan xwast ku ew penaberîya malbata wî qebûl bikin. Lê mixabin bersiva berpirsiyarên vê rêxistinê negatîv bû. Ji ber wê yêkê, EIî mecbûr ma bi xwe jî ji komîserîya bilind ya penaberan daxwaza penaberîyê bike.

Piştî wê yêkê, poIîsê Tirkîyê ew şandin bajêrê Konyayê ku malbata wî jî pêştir şandibûn wî bajarî. Elî, piştî bi cih kirina hindek formalîteyên îdarî, digel malbata xwe di taxek ji taxên bajêrê Konyayê da xanî girt û li wê derê bi cih bû. Ev bajêre ji bo Elî tehlîke (xeter) bû.

Elî pir zû têgihişt ku bajêrê Konyayê tijîye li ajanên rejîma Îranê ne, ku ew bajêr ji bo rejîma Îslamî wekî hêlîna mêşên hingivîn e. Wî dizanî ku li wê derê ji bo wî çu ewlehîyek (emniyetek) nîn e. Rewşa wî ya malî destûr nedidayê ku bi qaçaxî ji Tirkîyê derkeve, lê bibaşî dizanî ku dibe ew bi zûtirîn wext ji xaka Tirkîyê derkeve. Her ji bo vê yêkê jî digel heyetên Kanadayê û Finlandayê yên ku ji bo wergirtina penaberan hatibûn Tirkîyê rûnişt û li ser pirsgirêka xwe bi wan ra peyivî. Lê mixabin bersiva herdu heyetan jî, ji ber siyasî bûna meselê, negatîv bû. Bi vî awayî Elî ketibû nîveka çembera (mihasereya) dijmin, ku her roj ji roja pêştir tengtir dibû. Di wî midetê ku ew Ii Tirkîyê bû, em bi timî bi telefonê bi hev ra diaxivtin û li Hollandê her çi ku ji destên min hat, min ji bo rizgar kirina wî ji Tirkîyê kir. Lê mixabin hemû çalakîyên min bênetîce man.

Heft meh ji mayîna wî ya li Tirkîyê borî. Di havîna 1990an da, ez çûm Tirkîyê û bi qasî du hefteyan digel wî mam. Wî ji min ra behsê bîranînên xwe dikir û li ser dijwarîyên ku kişandibûn diaxivî. Ji bo penaberên Îranê yên li Tirkîyê pir ne rehet bû û digot ku piranîya wan ber bi nexweşîyên rewanî (psîkolojîk) û dînîtî û h.w.d. diçin.

Wî qet ji bajêrê Konyayê hez nedikir û digot ku ev bajêrê bi bajêrê Quma Îranê ve diçe û bajêrê dînperestan e û di bin nifûza rejima Îslamî ya Îranê da ye. Lê çi bikin, Polîsê Tirkîyê cihekî ewha ji bo penaberên Îranî hilbijartîye.

Wê havînê me karî em dayîka xwe jî bînin konyayê. 6 sal bûn ku me ew nedîtibû. Ew hatibû ku xatira xwe ji me bixwaze. Qerar bû ku piştî wê ku em ji Tirkîyê biçin, ew jî vegere Îranê. Lê wê çi dizanî ku dûr ji çavên wê serniviştеke dî bi destên dijminan dihate rêsandin! Wê çi dizanî ku dê li ber çavên wê kurê wê birevînin û bi destgirêdayî û bêdîfa, wî bibin û bi kujin. BeIê, di wan 11 salan da ku Elî li dijî rejimeke ew çend har û xwûnxwar şer kirî bû, dayîka wî tim û tim, bi şev û rojan û bi gav û seetan di tirs û sawê da jiya bû, tirs û xofa serniviştеke nediyar.

BeIê, dijminê xwûnxwar, şeva 15.08.1990an anku şeva berî roja damezrandina Partîya Demokrat ya Kurdistana Iranê, ji bo teror kirina Elî hilbijartibû. Wê şevê, dorberê seet 12an (24an), sê kes bi demance û bêtêl (bêsîm) di destên wan da ketin mala Elî. Du kesan kincên polîsê Tirkîyê li ber xwe kiribûn û kesê sêyan jî bi kincên sîvîl bû. Ew sê kes gava ku ketin hindurê xanî, ji Elî xwastin ku karta xwe ya pênasîyê nîşanî wan bide. Piştra jî destbend li destên wî xistin û gotinê ku emê tevî hev biçin îdara polîs, ji ber ku hindek pirs hene divêt tu bersiva wan bidî. Zarokên Elî, ku ji ber dengên mirovên xerîb ji xewê veciniqî bûn, gava ku babê xwe bi destên girêdayî dîtin, xwe avêtin nav dest û lingên wan mirovên xerîb û bi awayekî bê sebrane xwe li lingên wan di alandin.

Heçî dayîk û xanima Elî bûn, wan ku fikir dikirin ku ew sê kes ji alîyê polîsê Tirkîyê ve hatine, qebûl kiribûn ku ew Elî ji bo pirsîna hindek pirsan dibin û her ji ber wê yêkê jî çu reaksiyonek ji xwe nîşan nedan. Lê paşî wê ku wan Elî bi awayekî zext û bi tûjatî ji mal derxistin, hevjîna Elî telefonî polîsê siyasî yê ku berpirsiyarê kar û barên penaberan bû kir û ji wî ra got ku polîsan destbend li destên EIî xistin û ew digel xwe birin.Polîsê siyasî ewha bersiv dayê: “Mereqan nekin; ez Elî dinasim, mirovekî baş e û çu karek nekirîye. Hetmen dê sibê wî azad bikin. Qet mereqan nekin.”

Sibê zû hevjîna Elî ji min ra telefon kir û got ku duhî nîvê şevê hatin û destbend li destên Elî xistin û ew birin. Niha ez diçim îdara polîs, tu jî bizane. Min dem û dest dest Rêxistina Neteweyên Yêkbûyî yên li Ankara, Holland û Cenevreyê agahdar kirin. Lê her di gava pêşîn da tirs ketibû dilê min û ez bi rastî nîgeran bûm. Te digot qey tiştekî nediyar ji min ra dibêje ku Elî êdî jînde nîn e. Wê rojê min bê rawestan bi telefonê tevî dayîka Elî, xanima wî û

polîsê bajêrê Konyayê xeber da, heta ku di seet 17an da polîs ji min ra got: “Serê te sax be, Elî şehîd bûye û me cenazeyê wî dîtiye.”

Dayîka me biribûn ser cenazeyê kurê wê ku bi destên girêdayî û bi bêbextî hatibû şehîd kirin. Her çî ez bûm; min dikir ku pêşîya kela xwe bigirim, lê min nikarîbû. Xebrreke pir kurt bû, lê giyan û dilê mirov dihingavt û ji hemûyan xedartir, ev yêke bû ku çu tiştek ji destên min nedihat! Min dost û hevalên wî agahdar kirin. Hemû heyirî mabûn. Çu kesê bawer nedikir. Ev terore ne ya yêkemîn bû ne jî ya dawin. Mêrkujên Komara Îslamî, pêştir jî kuştina Elî, Doktor Qasimlo li Viyena, Xulam Keşawerz li Qibrisê, çend zabitên rejima Îranê ya berê û Kazim Recevî li Cenevreyê kuştibûn. Paşî kuştina Elî jî, Atifa Qazî li Swêdê bi şandina nameyeke bibombe kuştin.

Pir kesan dixwastin di merasima cenazehildana Elî da beşdar bin. Lê mixabin şerayît ne munasib bûn. Ji ber wê yêkê jî pir şexsîyet û dost û hevalên ku dixwastin li ser aramgeha wî ya dawîn amade bin û xatira xwe ji wî bixwazin, nikarîbûn di wê merasimê da beşdar bin. Ev derde jî bû derdek li ser hemû derdan!

Me cenazeyê Elî roja 17.08.1990an li bajêrê Konyayê li nêzîkî gora “Celaleddîn Muhemedê Belxî” teslîmî xakê kir û veşaret. Xwezîya dilê me ew bû, ku em wî bibin Kurdistanê û li xaka Kurdistanê li kêleka hevalên wî yên şehîd, aramgehekê ji pê ra ava kin û li wê derê nik wan wî jî bispêrin ebediyetê. Lê heyf û sed heyf, ew yêke jî mimkun nebû!

Elî, pêşmergeyekî fedakar û di eynî demê da jî berpirsiyarekî siyasî û leşkerî yê hêja bû. Wî heta roja mirinê dest ji çalakî û fedakarîyê nekişand. Civata ku têda dijîya bi başî dinasî. Wî çu caran, pirsên siyasî têkilî pirsên şexsî û girêdanên dostînîyê nedikir. Xuy û xasyet û rabûn û rûniştina wî heta ji bo kesên ku bi tenê ji dûr ve navê wî bihîstî bûn, bibû mînak û nimûne. Her ji ber wê yêkê jî bi xworayî nebû ku rejîma Îslamî bi çendîn caran û bi karanîna gelek dek û fêhlan xwastibû wî di mintiqeya Urmîyê da bikuje, lê qet serneketibû. Elî di 11 salên têkoşînê da bi xurtî nîşan dabû, ku ew bi rê û armancên xwe ra wefadar e û ji bû bi destxistina daxwazên rewa yên gelê xwe, anku azadîyê, dixebitî.

Elî li piranîya deverên Kurdistana Îranê, Îraq û Tirkîyê gerîyabû û ji nêzîk ve digel xelkê wan navçeyan rabibû û rûniştibû û behs kiribû. Dîrokê nîşan daye ku şoreş tim lawên xwe yên herî baş feda dike, daku bi xwûna wan dara azadîyê têr av be. Elî digel wê jî ku zanistgehîyek bû, lê jiyana wî hewqas sade bû ku mirov qet nikarîbû çu cudahîyekê di nav jiyana wî û ya pêşmergeyan da bibîne. Ew di warê sedaqet, pakî û dostanîyê da bêhempa bû. Ew daxwazkarê yêkitî û hevgirtinê bû û ji duberekî û ixtilafê nefret dikir.

Rast e, ku rejima melayan karîbû Elî jî wekî hezaran giyanfedayên dî ji me bistîne, lê ewê qet nikariye vîna hebûnê, gewhera hebûnê û zewq û daxza hebûn û jiyanê ji tevgera gelê me bistîne.

**Kerîm Kaşifi / 11.03.1991**

# HEVJÎNA ELÎ, LI SER RÛDANA BÛYERÊ DI AXIVE: LEPIKÊN ETLESÎ Û DESTÊN TIJÎ XWÛN

Em tevî dayîk, xanim û zarokên Elî rûniştine. Resmê wî yê xweşik di dîwarî da hilawîstîye. Di bêdengîyê da, resmê wî, salên derbazbûyî yên pir bi çalakî, dilêrî, şanazî û dostanîyê tîne bîra min. Ez hatibûm ku hale wan bipirsim. Lê çav û nêrînên Elî, min bêtewat dikin. Careke dî dixwazim çawanîya rûdana bûyerê ji hevjîna wî bipirsim, ji ber ku bi rastî dilê min hêj qinaet nade ku Elî ji destên me çûye… û dipirsim:

**Çima we biryar da ku hûn biçin Tirkîyê û li wê derê xwe bi Rêxistina Neteweyên Yêkbûyî bidin nasîn?**

Em bi du delîlan çûn Tirkîyê. Ya yêkem; ji ber ku mêrê min bi piranî mijûlî kar û barên partîyê û bi cih kirina wan memûrîyetan bû ku ji alîyê partîyê ve bi wî dihatin sipartin. Di rastîyê da, kar û barên têkoşînê ew ji me cuda kiribû. Ez û zarokên her tim bi tenê bûn. Ji alîyê dî ve min dixwast ku ez barê berpirsiyarîyên ku li ser milên mêrê min bûn, hindekê sivik bikim. Ji ber ku bûna me li wê derê û xetera ku em bi timî têda dijîyan, qet mêrê min rehet nedihêla û tim di dilê wî da nigeranî pêk dianîn. Ya duyem; zarok bûn, ku mezin dibûn û divîya çûban dibistanê. Lê mercên dewerê nedihêlan ku ew biçin dibistanê û dersê bixwunin.

Lê, çima me sala 1989ê ji bo hatina Tirkîyê hilbijart? Ji ber ku yêkek ji dostên me yê herî nêzîk biryar da, ku digel malbata xwe biçe Tirkîyê û li wê derê daxwaza penaberîyê ji bo yêkek ji welatên ewrupî bike. Ji ber ku me bi tenê nedikarî biçin Ankarayê û li wê derê xwe bi Rêxistina Neteweyên Yêkbûyî bidin nasîn, her ji bo wê yêkê jî me biryar da ku em jî digel wî dostî û malbata wî biçin Ankarayê.

Ev yêke jî divêt bête gotin ku ji mêj ve li welatê Hollandê ji bo qebûl kirina me wekî penaberan hindek kar hatihûn kirin û em teqrîben mutmeîn bûn ku dê penaberîya me qebûl bikin. Lê pirsa herî girîng eve bû ku me bi tenê nedikarî ku çûban Tirkîyê.

**Hûn kengî çûn Rêxistina Neteweyên Yêkbûyî û we xwe bi wan da nasîn?**

Em di roja 27.10.1989an da çûn Rêxistina Neteweyên Yêkbûyî û heta mehekê zûtir ji malbata ku tevî me hatibû, digel me hevpeyvîn pêkanîn (02.11.1989). Piştra penaberîya wan qebûl kirin, Iê çu bersiv nedan me, heta ku heyeteke ji welatê Hollandê hate Ankarayê.

Wê heyetê li Hollandê soz dabû ku ewê li Ankarayê hetmen bi me ra hevpeyvînê çêkin û dê me bişînin Hollandê. Lê gava ku dostê me û malbata wî digel heyeta Hollandî rûniştin, derket ku komîserîya bilind ya ji bo penaberan ya Ankarayê em wekî penaberan qebûl nekirîne.

Piştra gava ku kurmamê min digel heyeta Hollandî li ser wê babetê pirs kiribû, endamên heyetê bersiv da bûn ku komîserîya penaberan ya li Ankarayê wan wekî penaber nanase, herweha gotibûn ku delîlê qebûlnebûna penaberîya me ji hêla komîserîya bilind ve, nebûna malxwêyê malê ye. Helbet, me bi xwe jî çend caran ev gotine ji devê berpirsiyarê penaberan li bajarê Konyayê, bi navê komîser Bekir Ak, bihîstibû.

**Gelo we fikir dikir, ku mêrê te jî divîya digel we  bête Ewropayê?**

Na, min qet ew fikre nedikir. Herwekî min pêştir jî got, em mutmeîn bûn ku bêyî hatina Elî jî dê hetmen me wekî penaberan qebûl bikin. Ji ber ku em xwudanê hemû şertên penaberîyê bûn. Û di nav daxwazkarên penaberîyê da kesê ku xwudan şerayîtên me bibe nebû. Di rastîyê da heta wê gava ku em li çiyayên Kurdistanê bûn jî em di rewş û şerayîtên penaberan da bûn. Ferq tenê ev yêke bû ku li wê derê (Ii çiyayên Kurdistanê) rewş dijwartir û bi tehlîketir bû.

Piştî wê ku me ji Rêxistina Neteweyên Yêkbûyî bersiva negatîv wergirt û me nikarîbû digel heyeta Hollandî rûnin, me biryar da ku em vegerin cihê xwe yê berê li çiyayên Kurdistanê.

**Çi bû sebeb ku hûn nezivirîn û dîsa li Tirkîyê man?**

Dostê me yê ku digel malbata xwe li Konyayê tevî me di malekê da dijîya û mesulîyeta me jî qebûl kiribû, ji alîyê heyeta Hollandî ve hate qebûl kirin û piştî du hefteyan divîya ji Tirkîyê derkeve û biçe Hollandê. Di vê rewşê da, dostê me digel Elî temas girt û ew ji meselê agahdar kir. Hevjînê min di wê demê da rojên pir dijwar derbaz dikirin û tenê min dizanî ku ew di rewşeke çawan da bû. Ji alîyekê ve çu karek ji destên wî nedihat, ji hêla dî ve jî rewşa wî ya rêxistinî bi curekî bû ku wî divîya li mintiqê bimîne.

Di ser da jî heke hatiba Tirkîyê, di rastîyê da, xwe diêxiste nav bizotê agir da. Lê di dawîyê da ew mecbûr ma ku xwe bigihîne Ankarayê û rewşa xwe ya djwar ji komîserîya penaberan re beyan bike.

**Berpirsiyarên wê komîserîyê çi bersiv dan Elî?**

Elî ji berpirsiyarên Neteweyên Yêkbûyî re bas kir ku ez nikarim digel jin û zarokên xwe bimînim, ji ber ku ez endamê komîteya navendî ya partîyeke siyasî me û heke hûn jin û zarokên min wekî penaber qebûl nekin, ez mecbûr im wan digel xwe vegerînim mintiqê û di mintiqê da jîyana wan di tehlîkeyê da ye.

**Gelo we dizanî li Rêxistina Neteweyên Yêkbûyî kî digel Elî diaxivt?**

Ez hindê dizanim ku ji alîyê Rêxistina Neteweyên Yêkbûyî ya Hollandê ve ji me ra tewsîye hatibû kirin ku li Ankarayê li ser pirsa penaberîya xwe em digel kesekî bi navê "Morgan" temasê bigirin. Elî jî li Ankarayê digel wî kesî danûstandin dikir. Morgan ji Elî ra gotibû ku di dosyaya me da tiştek nîn e û ku heke em vegerin Îranê jî çu xeterek me tehdît nake û di dawîya dawîn da, ji Elî ra gotibû ku bê serperest em nikarin jin û zarokên te wekî penaber qebûl bikin.

**Çawan Elî razî bû ku xwe teslîmî Rêxistina Neteweyên Yêkbûyî bike?**

Elî herçiqas israr kir ku wan bi rêya qanûnê û bi awayekî mantiqî razî bike, ser neket. Di kutayîyê da, Elî ji wan re got: "Ez dê malbata xwe bi xwe ra vegerînim Kurdistanê." Lê berpirsiyare Neteweyên Yêkbûyî, M. Morgan vegerand û got ku ji ber ku malbata te li bajêrê Konyayê di bin çavdêrîya polîsê Tirkîyê da ye, divêt ku polîs wan bibe û teslîmî karbidesten Îranî yên li ser sînorê Îranê bikin. Elî ketibû dudilîyan û nikarîbû biryarê bide.

Her di wê demê da, birayê Elî li Hollandê hewil dida ku ji Rêxistina Neteweyên Yêkbûyî ya wî welatî aIîkarîyê bistîne. Lê ew jî bi ser neket nikarîbû karekê ji bo me bike. Ji ber ku karê me di destên komîserîya bilind ya penaberan ya Ankarayê da bû û Piştî muwafeqetkirina wê komîserîyê bû ku mirov dikarî li Hollandê yan li cihekî dî ji bo me karekê bike.

**Di wê navberê da Elî çi dikir?**

Elî digel sekreterê partîyê temas girt û ew ji rewşa me û problema pêkhatî agahdar kir. Biryar hate dayîn ku Elî xwe bi Rêxistina Neteweyên Yêkbûyî bide nasîn û daxwaza penaberîyê bike. Sekreterê giştî di ber dilê Elî da hat û ji wî ra got ku mereqan neket, ku ew rewşa wî têdigihin. Qerar bû ku piştî serastbûna karê me, Elî carek dî vegere mintiqê û têkoşînê bidomîne.

**Di wî midetî da hûn jî li Ankarayê bûn?**

Na, em li Konyayê bûn. EIî bi tenê li Ankarayê bû. Lê xeberê me ji hev hebû. Piştî ku Elî xwe wekî penaber bi Rêxistina Neteweyên Yêkbûyî da nasandin, em wekî penaber hatin qebûl kirin û Elî jî ji Ankarayê zivirî û hate Konyayê nik me. Elî li Konyayê xwe wekî kesekî

azeri da nasandin. Ji ber ku birastî ihsasa xeter û tehlîkê dikir. Ji alîyê dî ve jî nisbet bi dewlet û polîsê Tirkîyê bidguman (zenîn) bû û nedixwast li nik van bête nasîn.

**Digel wê jî, ew niha li nik we bû û hûn divîya keyfxweşbana?**

Raste, ew li bal me bû, lê dîsan jî min qet bawer nedikir ku heta ji bû demekî kurt be jî, ew ji têkoşînê qetîyaye û bi tevî me dijî. Heta li vê derê jî, wî dinya xwe ya sazûmanî ji bîr nedikir û her tim di fikra wê derê da bû. Lê em pir nîgeran bûn. Ji ber ku me his dikir ku ew ji her alî ve di tehlîkeyê da ye. Her ji bo vê yêkê jî, jîyana me tim bi tirs û xof derbaz dibû.

**Li Konyayê jîyana we çawan bû?**

Herwekî ku hûn jî dizanin, berî hatina Elî, ez û zarokên xwe, em tevî malbata dostê xwe dijîyan. Em û ew bi tevayî 11 kes bûn, hemû di maleke du odeyî da diman. Rewşa jîyana me qet ne baş bû. Bi xwe hûn dizanin ka rewşa penaberekê li wê derê çawan e. Ji ber ku hûn bi xwe penaber bûne an jî hûn kêm û zêde li ser rewşa penaberîyê li Tirkîyê agahdar in. Di ser da jî, berî wê ku em bên Tirkîyê û li wî welatî daxwaza penaberîyê bikin, em çend salan jî li çîyayan mabûn û di rastîyê da hingê jî em her di rewşa penaberîyê da bûn. Piştî wê ku dostê me û malbata wî çûn Hollandê û Elî jî hate Konyayê, em êdî tenê di odeyekê da diman.

Odeya dî, polîs dabû jinek Îranî ku digel kiç û kurê xwe têda dijîyan. Rewşa jîyana wan ji ya me baştir nebû. Jina Îranî nexweş bû û ji her nebûna imkanên malî nikarîbû biçe ser doktor. Her çend ku rewşa jîyana me bi xwe jî ne baş bû, lê dîsa Elî alîkarîya wê jina Îranî dikir heta ew biçe nik doktor û ji nexweşîya xwe ra çareyekê bibîne.

Pêwîst e ez bêjim, ku xanîyê em têda dijîyan, tenê navê wê xanî bû, lê di rastîyê da kulixteyekî tam bû.

**Wê şevê, bûyer çawan pêk hat? Gelo, hûn dikarin bînin bîra xwe?**

(Çavên wê tijî rondik dibin. li dor û berê xwe, li dayîka Elî û li zarokan, ku ker û lal rûniştine û berê xwe didin devê wê, dinêre û paşê didomîne.)

Ev yêke tiştekî veşartî nîn e. Di rojnameyan da bi dûr û dirêjî li ser bûyerê hatîye nivîsîn. Bûyer her bi wî awayî ku di rojnameyan da belav bû, qewimî. Şev li zenga derîyê malê xistin. Şev direng bû. Di wê demê direng da derî lêxistin ne tiştekî normal bû. Jinika cîrana me derî vekir. Piştra li derîyê odeya me xistin. Dîyar e ku me qet hêvîya tiştekî wisan nedikir. Min derê odeyê vekir. Du kes bi kincên polîsê Tirkîyê li pişt derî bûn.

Polîsan gotin ku em dixwazin tevî malxêyê te biaxivin û bêyî ku hêvîya bersiva min bisekinin, bi zorê ketin hindurê odeyê, Elî li kêleka min sekinîbû. Wan polîsan destên Elî girtin û ji wî kartê wî yê pênasîyê xwastin.

Paşê jî gotinê ku divê digel wan bête îdara polîs. Lê wan bêbextan heta mecal nedan, ku Eli kartê xwe nîşanî wan bide û ew ji nav zarokan ku ji ber denge denge ji xewê hişyar bibûn û bi çavên xewmijî li dora Elî civîya bûn, kişandin û ji odeyê derêxistin. Vê gavê ronahîya çirayî da hewşê û min dît ku kesekî dî jî di tarîyê da di hewşê da rawestaye û dezgehekî bêsîmê jî di destê wî da ye. Rewş ne rewşeke normal bu.

Hatina polîs ya bi zorê û di wî wextê şevê yê direng da herweha reftara wan digel Elî û awayê birina wî ji malê. Eve hemû nîşana rewşeke ne normal bûn. Her ji ber wê yêkê, min dem û dest ji polîsê siyasî yê Konyayê re telefon kir û rewş ji wan ra beyan kir û ji wan alîkarî xwast.

Polîs ji min ra got ku niha direng e û qet mereqan nekin, tiştekî girîng nîn e. Em dê sibê li ser vê yêkê bixebitin û Iê binêrin ka mesele çi ye. Lê sibê ji me ra cenazeyê Elî dîtin. Wan bextreşan her wê şevê mêrê min biribûn û li çolê teror kiribûn.

Xanima Elî rondikên çavên xwe paqij dike û di odeyê da em hemû di bêdengîyeke sar da, di şûna xwe da rûniştine. Bi rastî êdî pêwîst nîn e ku ez pirseke dî bikim. Lê her ji bo şikandina wê bêdengîyê, min pirsa jêrîn jî pirsî:

**Çend zaro wekî diyarî ji Elî mane? (Wê bi destan nîşan dan û got:)**

Çar. Du kiç û du kur. Kiça min ya mezin 14 salî ye, ya dî jî heft salî ye. Kurê min yê mezin 11 salî ye, yê biçûk jî çar salî ye.

Ma ev hinde pirs bes nîne ku ji şahidekê ku daxwazîya wê ya herî kûr eve ku xwazî ew tiştên ku wan bi çavên xwe dîtin, wekî xewnekê digel ji xew rabûnê ji bîra wan biçûya? Şahida ku pênc şahidên dî, yên ku bêdeng û bi çavên tijî rondik di odeyê da rûniştine, bi hejandina serên xwe gotinên wê teyîd dikin…

**Mizefer Begzade / 30.12.1991, Almere**

# DOZDEH SAL, MIL BI MIL DIGEL ELÎ KAŞIFPÛR

Telefonê li zengê xist. Min guhika telefonê rakir. Li pişt telefonê dengekî Ierizokî weha got; “Ez im, Mizefer…” Ji bajêrê Almereyê telefon dikir. Min halê wî pirsî. Got; ez ne baş im. Min gotê çima? Got; “Elî şehîd kirin”. Min jê pirsî; “Elî kî ye?” Got; “Ma tu Elî nanasî, Elîyê me.” Min dizanî kîjan Elîyî dibêje. Lê ji ber ku min bawer nedikir, min dîsan pirsî; “Kîjan Elîyê me?”

Li min vegerand û got; “Elîyê me yê ku li Tirkîyê bû, duhî şev hatine, ew birine û şehîd kirine…” û paşê jî telefon danî. Lê her çî ez im, guhika telefonê her wisan di destê min da mabû û ez di cihê xwe da hişk bibûm û min hêj bawer nedikir. Min qet bawer nedikir ku Elî bête şehîd kirin. Min di dilê xwe da ji xwe ra digot; ma çawan, ev yêke mimkun e? Zarokan ji min pirsîn; “çi bûye?”

Min li wan vegerand ku Elî hatîye şehîdkirin. Bi vê gotina min, li mala me bû şîn û hawar, nalîn û zarîn. Belê, bi şehîd ketina Elî, min kesek ji dest dabû ku deh salan bi domdarî ez û ew bi hev ra hevçeper û hevtêkoşîn bûn. Me pir ji hev û du hez dikir. Ew ji bo çareser kirina pirsgirêka malbata xwe hatibû Tirkîyê û xwe bi Rêxistina Neteweyên Yêkbûyî dabû nasîn, daku bikare jin û zarokên xwe bişîne welatekî ewrupayê. Lê dijminê bêbext ku li hemû cih û şûnan li dû wî digerîya, li wî welatî firset peyda kir û ew bi namerdî şehîd kir.

Şehîd kirina Elî bi awayekî weha, qet nediket serê me û me qet fikir nedikir ku ew dê bi vî şêweyî bête şehîd kirin.

Elî ji bû partîya xwe mirovekî pak û durust, ji bû gelê xwe û doza wî kesekî fedakar û

ji bo heval û hevtêkoşînên xwe têkoşerekî bêwestîyan bû. Her gava ku em li dora hev dicivîyan, Elî di got: “ Heke ez şehîd bûm, rastîya jîyana min binivîsîn û ne zêdetir.” Û em pê dikenîyan. Me nedizanî ku henekên wî dê rojekê bibin rastî. Mirovên têkoşer tim mirina xwe li pêş xwe dibînin û digel wê jî dijîn. Lê me hewqas li hev û du hez dikir ku heta bi henekan jî me nedixwast ku em wan gotinan bibihîzin. Bi rastî, nivîsîna li ser jîyana kesekî ku jîyana xwe bi giştî bi dijwarî derbaz kiribû û bi timî di fikra heval û hogir û xelkê dor û bera xwe da bû, karekî hêsan nîne û mirov nizane ji kî derê ve dest pê bike.

Piştî êrişa giran ya rejima Xumeynî li ser mintiqeya azadkirî ya bakûra Kurdistana Îranê, li devera Somayê, bitaybetî li gundên Hesenî, Koran, Godel û Sultanîyê û herweha li devera Şipîranê, şerekî giran û xwûnîn li çiyayên navbera gundên Hesenî û Sipîdere, di nav pêşmerge û hêzên êrişkar yên rejimê da qewimî. Di vî şerî da bi dehan pasdarên rejimê hatin kuştin û birîndar bûn û heft pêşmerge jî şehîd bûn û giyanê xwe ji doza gelê xwe ra feda kirin. Şer du roja domand. Şehîd Elî Kaşifpûr, ku hingê hem yêkek ji endamê berpirsiyar yê navenda Agirî (yêkek ji çar navendên Kurdistana Îranê) û hem jî endamê komîteya merkezî ya partîye bû, bi xwe di şer da beşdar bû, û bê rawestan û bi çalakî û mêranî digel hêzên rejimê şer dikir.

Piştî ku mintîqe weku xwûya kete di bin desthelata hêzên rejimê da û êdî çu binkeyên pêşmergeyan di navçeyê da neman û pêşmerge ji niçkê ve xwe di mercên bê binkeyî û gerokîyê da dîtin, Elî digel hindek berpirsiyarên dî dîsan pêşmerge bi rêkûpêkî organîze kirin û ew careke dî şandin navçeyê heta ku di nav xelkê da bixebitin û bi hizûr û xebata xwe, propagandayên rejimê yên jehrawî û derewîn yên li ser li nav birina pêşmergeyan û h.w.d. pûç bikin. Her çend ku pêçmerge êdî xwudanê binkeyên sabit nebûn, lê hemû der ji bo wan bibûn binke. Ew li jêr berekê, binê her darekê amade bûn. Bi kurtî ew hem li hemû cihan hebûn û hem jî li çu dera nebûn. Ew bibûn partîzan û bi awayê partîzanî şer dikirin.

Pêşmergeyên ku ji desteyên 20 heta 30 kesî pêkhatî bûn û di navçeyê da digerîyan, bi rastî dijmin gêj kiribû. Herçend ku mintiqe hatibû mîlîtarîze kirin, dîsan jî pêşmergeyan sê mehan temam di navçeyê da xebat kirin û rewşa xebat û çalakîyên wan pir ji demên pêşîn zêdetir pêşve çûbû.

Lê zivistan hêdî hêdî nêzîk dibû. Her ji ber wê yêkê jî ew naçar bûn ji bo borandina ew demê dijwar cihekê hilbijêrin û zivistanê li wê derê derbaz bikin. Ji bona wê çendê gundê Dêrê hate hilbijartin. Ew gund ketîye ser sînorê “Tirkîyê” û tenê çend sed metreyan ji tixubê Tirkîyê dûr e û çiyayên wê deverê pir bi asteng in. Pêşmerge çûn wî gundî û di çend binkeyan da bi cih bûn.

Cangîr Îsmaîlzade, ku ji bo beşdarî kirina plenuma komîteya navendî çûbû binkeya politburoya partîye, di dawîya payîzê da vegerîya navçeya bakûra Kurdistana Îranê û hate gundê Dêrê. Politburoya partîyê kesekî dî bi navê Cehfer Hemîdî jî digel wî şandibû navçeya me. Ew du kes digel kak Elî berpirsiyarên komîteya navenda Agirîyê bûn. Hingê partîya Kurdistana Îranê ji hêla rêxistinî ve dabeşî çar navenda kiribû: Navenda başûr, navenda bakûr, navenda merkezî û navenda politburoyê. Navenda Agirîyê anku bakûra Kurdistana Îranê ji çar bajar û qezayên bi wan ve girêdayî pêk dihat.

Navenda îdarî ya vê navçeyê li cihekî nêzîkî bajêrê Urmîyê ketibû. Dawîya payîza 1984an bû, ku Elî di komîteya navenda Agirîyê da, bû berpirsiyarê zanyarîyên siyasî û kar û barên

civakî. Di zivistana 1984an da, di jêr berpirsiyarîya Cangîr Îsmaîlzade da ekîbek ji pêşmergeyên Hêzên Sergurd Ebbasî, Hatem, Aware û şehîd Niho, digel berpirsiyarên xwe çûn dewerên Selmas û Somayê. Şehîd Elî jî digel wê ekîbê bû.

Pêşmergeyan geşta xwe ya siyasî û leşkerî di navçeya Somayê da bi awayekî rêkûpêk bi cih anîn û di kutayîyê da jî (3 ÇiIe 1985) bi emelîyatên berbiçav di hindurê bajêrê Selmasê da û herweha li ser rêya Selmas - Urmîyê, çalakîyên xwe têkuztir kirin. Di wan çalakiyan da bi dehan pasdarên Îranî digel berpirsiyarên xwe hatin kuştin û birîndar kirin. Ew çalakî hewqas bi gurc û gur bû ku rejima Komara Îslamî li hemberê wê reaksiyoneke tûj nîşan da û hêzên xwe civandin û li dûv pêşmergeyan xist. Di roja 3.12.1984an da, li serê sibê, hêzên êrişkar yên rejimê digel pêşmergeyan ketin şerekî giran ku heta êvarê domand.

Ew şere li gundê Berdiyanê qewimî. Di kutayîya wî şerî da, pêşmerge bi ser ketin û bi şev derbazî gundê Ceterê bûn. Roja dî, rejima Îranê bi zanîna wê yêkê ku pêşmerge li gundê Ceterê ne, hêzên xwe yên li bajêrên Selmas, Xoy û Urmîyê civandin û êriş anî ser wî gundî. Roja 5.12.1984an serê sibê, êrişa dijmin dest pê kir. Li wî gundî 150 pêşmerge hebûn ku Piştî du rojan şere bi mêrxasî û partîzanî, ketin mihaserê. Di her seetê da bi sedan gulleyên xumpare, top, katyûşa û R.P.G. di ser gund da dihat barandin. Di wî şerê giran û neberaber da, pêşmergeyan bi rastî berxwedaneke bi hemta û mêranî nîşan dan.

Berpirsiyarên wan jî bi mêrxasî han didan wan û ew teşwîq dikirin û bi vî awayî nedihêlan ku morala wan zeîf bibe. Êvara wê rojê li goreyî agahdarîyên ku gihiştin destên me, me zanî ku bi sedan peyayên rejimê hatine kuştin û birîndar kirin. Bi sedan çek yên hêzên rejime, çekên sivik û giran, di meydana şer da mabûn. Pêvîst e bête gotin ku di wî şerî da 13 pêşmerge jî şehîd bûn. Şev, pêşmergeyan biryar da ku ji wî gundî derkevin û biçin navçeya Biradosta. Şeva dîtir, wan mintiqeya Biradosta jî di cih da hêlan û derbazî navçeya “Gelîyê Berdereş”ê bûn.

Şerê gundê Ceterê, rûpeleke zêrîn e ku di dîroka berxwedana pêşmergeyan da hatîye nivîsîn. Piştî şerê Ceterê, Elî herweha digel ekîba xwe ya ji bo geşta siyasî - leşkerî, ma û vê carê ber bi mintiqeyên Tergever û Mergeverê ve bi rê ketin. Li wan navçeyan, piştî ku pêşmergeyan gundê Derbendê bêçek kirin, zivirîn binkeyên xwe yên li gundê Dêrê.

Piştî wê ku Elî rapora çalakîyên xwe da polîtburoyê û piştî bêhnvedaneke kurt, ew careke dî û digel ekîbeke dî vegerîya navçeya Somayê û mijulî çalakîyên siyasî yên di nava xelkê da bû.

Di cereyana guhartinên ku di bihara 1985an da li bakûra Kurdistana Îranê pêk hatin, beşekî berçav ji pêşmergeyan xwe teslîmî rejimê kirin. Lê Elî ku xwe berpirsiyar dizanî û bi timî digel pêşmergeyan danûstandinên wî hebûn, bi awayekî berdewam û bi dilsojî digel wan

rûdinişt û guh dida derd û pirsgirêkên wan u Ii ser rewşa wan xwudan agahdarîyeke berbiçav bû. Di bihara sala 1985an da hêzên rejimê êriş anîn ser gundê Dêrê. Her ji ber wê yêkê jî, binkeyên pêşmergeyan li wê derê neman. Êdî çu binkeyek ji bû pêşmergeyan nemabû û ew bi timanî di rewşa partîzanî da dijîyan. Wê gavê ez û Elî, em di yêk grupê da bûn û bi timî digel hev û du bûn. Her li wê derê bû ku min û Elî,  karî em zêdetir hev û du binasin. Pêştir, karê me ji hev cuda bû. An Elî li komîteyê dima an jî diçû devereke dî. Herçî ez bûm, ez li mintiqeyeke dî dimam.

Lê niha em gihiştibûn hev û du. Di bihara sala 1985an da em bi şikIê grupeke partîzanî di çiyayên Şêx Bayezîd, Çar Şembe û Bilindok da digerîyan. Li hemû cihan, şûnewarên pêşmergeyan û çarberîyên wan xuya dikirin. Mercên mintiqeyê ji me ra musayîd nebûn. Her ji ber wê yêkê jî, me divîya em bi timî dûr ji avahîyan û Ii çolê bijîn. Digel nebûna imkanan, nemusîdbûna hewayê, barîna baranê û sir û sermaya biharê, lê dîsa jî em pir keyfxweş û hêvîdar bûn. Em, sê mehan timam digel hev û du bûn. Paşê ji alîyê hevalên polîtburoyê ji me ra mesaj hat ku pêvîste ku em biçin nik wan. Elî, pêşmerge civandin û digel wan axivt û ji wan ra got ku em dixwazin ber bi mintiqeya Mergeverê ve bi rê kevin û li wê derê tevî pêşmergeyên Hêza şehîd Niho bibin.

Pêşmergeyan pêşniyara wî qebûl kirin û em bi şev bi rê ketin û roja dî gihîştin navçeya azadkirî anku navçeya çiyayî ya zozanên ku wê demê bê rûniştevan bûn. Paşê jî em çûn zozanên çiyayên Bere Gewre û gihîştin pêşmergeyên Hêza şehîd Niho. Piştî çend roj bêhnvedanê li ser pirsa şandina hêzên Sergurd Ebasî û şehîd Niho ber bi mintiqeya politburoyê ve, çend civînên dûr û dirêj hatin çêkirin. Di dawîyê da biryar hate dan ku grubek ji pêşmergeyan biçin dewera bakûrê û yên dî jî her bi cihê polîtburoyê ve bi rê kevin.

Elî digel du kesên din tevî wê grubê (ku ji 15 kesan pêkhatibû) ber bi navçeyên Soma û Biradosta ve çûn. Piştî sê şev û roja bi rê ve çûnê, em gihiştin gundên Kawlan û Dêrê. Elî ji bû bi cih anîna hindek karan Ii wê navçeyê ma û em yên mayîn ber bi navçeya Biradosta ve bi rê ketin. Şeva paştir, li ser sînorê Tirkîyê em rastî hindek eskerên Tirka hatin û ji bilî çar kesan hevalên me yên dî ji alîyê eskeran ve hatin girtin. Roja dî, me dem û dest xebera wê yêkê gihande Elî û piştra jî em bilez derbazî mintiqeya Somayê bûn û çûn û tevî pêşmergeyên dî ku di mintiqeyê da mabûn, bûn. Her ku nameya min gihîştibû Elî, ew her wê demê bi rê ketibû.

Piştî du roja me hev li çiyayên pişta gundê Koranê dît û ji wê derê jî em bi cî da ber bi çiyayên pişta Dêrê û Kawlanê ve bi rê ketin û li wê derê em û pêşmergeyên hêzên Aware û Niho gihiştin hev û du. Di wê navberê da ji alîyê polîtburoya partîyê ve ji Elî ra mesajek hat.

Elî divîya ji bo beşdarî kirina plinuma komîteya navendî, çûba polîtburoyê. Elî digel du kesên dî çû mintiqeya ku polîtburo Iê bû. Em yên mayî digel pêşmergeyan vegerîyan

mintiqeya Soma û Enzelê. Piştî gerîn û bi cih anîna hindek emelîyata di mintiqeyên Enzecl û Tergeverê da, em derbazî navçeya “Gelîyê Gaderê” li ser sînorê Îraq û Îranê bûn û bi qasî du mehan li wê mintiqeyê man. Meha payîzê ya dawîn, em digel hêzên Niho û Simko û herweha endamên komîteyê çûn Kurdistana Îraqê. Me zivistana 1985an li wê derê derbaz kir. Di wan sê û çar salan da, eve yêkemîn zivistan bû ku me bi rehetî derbaz dikir. Di vê salê da kongreya partîyê ya heftan dê pêkhatiba. Her ji ber wê yêkê jî partîyê xwe ji bo girtina kongreyê amade dikir. Konferansên komîteyên partîyê pêkhatin û di roja 23.12.1986an da xilas bû. Elî di vê kongreyê da bi dengên berçav hate hilbijartin û bû endamê komîteya navendî. Di rewşa leşkerî ya partîyê da jî hindek guhartin pêkhatin.

Çend hêz divîya tevî li hev bibûna û ji wan hêzek tenê pêkhatiba. Mintiqeya bakûra Kurdistana Îranê jî divîya têketa li ber wan guhartina. Ji bo wê yêkê jî komîteyên Araratê bi navên Selmas û Urmîyê û hêzên Sergurd Ebasî û Hatem bi navê hêzên Agirî û Niho di bin navê Melbenda (Nehîya) bakûr da cih girtin û Elî jî bû berpirsiyarê wê melbendê. Di destpêka bihara 1987an da em çûn mintiqeya Diyana û di gundê Mam Xetîb da bi qasî du mehan man.

Di dawîya meha sêyan ya biharê da em derbazî mintiqeya bakûrê bûn û li wê derê di çiyayên Dalanper da bi cih bûn. Piştî hindek pevçûn û şer digel hêzên dijmin, em derbazî mintiqeya Tergeverê ya çiyayî bûn û me ji bo hindek çalakîyên partîzanî yên bi rastî dijwar, xwe amade kir. Di yêkemîn êrişê da armanca me girtina du binkeyên dijmin yên bi navê Derbend û Xoşeko bû. Piştî çend seet şer, me ziyanên mezin û giran li binkeyên dijmin xistin û ew du binke nehatin girtin. Di êrişa duyemîn da ya li dijî binkeya dijmin ya bi navê Mîr Dawûd, em bi ser ketin û binkeya dijmin bi giştî kete bin destên me. Di êrişa sêyan da ya li dijî binkeya dijmin ya bi navê MeIûne, dîsa pêşmerge bi ser ketin û binkeya dijmin kete bin destên wan û bi giştî kavil bû.

Di van êrişan da, Elî mil bi milê pêşmergeyan li dijî hêzên dijmin şer dikir. Xweşbextane, di van şeran da çu ziyanek negihişt pêşmergeyan. (Ev şere di havîna 1987an da qewimîn.) Piştî wan çalakîyan, em li dora hev civîyan û me biryar da ku ez û desteyek ji pêşmergeyan ber bi mintiqeya Selmas û Şipîranê ve biçin û Elî jî digel grupek dî di bilindahîyên Kanî Kotir ji yên sinsile çiyayên bi çiyayê Çil Mêrên şehîdan ve girêdayî da, bimîne.

Biryar ew bû ku Elî li wê derê hindek çadiran vegire û herweha dermangehekê jî ji bo birîndar û nexweşan ava bike. Bi vî awayî me dixwast ku ew der bibe navendek ji bo veguhartina dîtinan, kontrol kirina dever û navçeyên Mergever û Tergever û Urmîyê û herweha danûstandina digel navçeya Selmasê û merkezek ji bo hidayet kirina komîteyên mintiqeyê di pêşve birina kar û barên wan da.

Ez digel grupa xwe, em çûn mintihiqeya Somayê û ji wê derê jî em derbazî mintiqeya Selmas û Şipîranê bûn. Armanca me ew bû ku em biçin navçeya Kotorê. Lê ji ber hindek sebeban, em neçûn wê navçeyê. Dawîya havîn û destpêka payîza sala 1987an bû ku biryar hate dan, ku em emelîyatên partîzanî bidomînin û derbeyan li binkeyên dijmin bidin. Berpirsiyarên ji bo bidestxistina zanyarîyên pêvîst li ser binkeyên dijmin û herweha karên irtibatî yên hindurî dest bi xebatê kirin û di wextekî kurt da ew kare qedandin û çalakîyan dest pê kir.

Çalakîya yêkemîn li dijî binkeya dijmin ya Ii Sipîdere bû. Di vê emelîyatê da, binkeya dijmin bigişti kete bin destên pêşmergeyan û tenê pêşmergeyek bi sivikî birîndar bû. Emelîyata duyemîn di mintiqeya Enzelê da dest pê kir.

Di vê emelîyatê da jî binkeya dijmin ya li gundê Zengekanê hate girtin û di vî şerî da jî sê pêşmerge bi sivikî birîndar bûn. Her di mintiqeya Enzelê da dîsa pêşmergeyan êrişî ser binkeya dijmin ya li gundê Kûre ya jêrîn kirin. Binkeya dijmin bi giştî kavil bû û tişt û cebxaneya têda kete destên pêşmergeyan.

Darijandina bername û bidestxistina zanyarîyên Ii ser wê binkeyê hewqas deqîq bûn ku tenê piştî wê ku pêşmergeyan her sê nobedarên binkeyê girtin, peyayên rejimê hingê pê hesîyan ku binke hatîye girtin. Hewa hêdî hêdî ber bi sarbûnê ve diçû û li bilindahîyan befir ketibû.

Me biryar da ku em xwe amade bikin û ber bi mintiqeya ku melbend (merkeza nehîyê) lê bû bi rê kevin. Me ji bû vê yêkê digel Elî ku li melbendê bû, temas girt. Lê wî ji me ra got ku heta meheke dî jî li wê navçeyê bimînin. Herçend ku hewa sar bibû, em dîsa li mintiqeyê man û bi çalakîyên siyasî û rêxistinî ve mijûl bûn. Li goreyî destura Elî, me grupek pêşmergeyan amade kir ku em wan ji bo tedarikên zivistanê bişînin. Lê wan nikarîbûn biçin. Ji ber ku befireke giran barîbû û hemû rê û rêbar hatibûn girtin. Piştî çend roja, digel wê ku befireke giran ketibû û rê hatihûn girtin û tehlîkeya ketina aşut û renîyê di wan deweran da hebû, dîsa jî em di roja 19.11.1987an da ji mintiqeya Somayê ber bi mintiqeya Kawlanê û Wargenim, ku melbend (merkez) Iê bû, bi rê ketin. Piştî sê roj û şevan rêveçûnê em gihîştin melbendê. Hingê bû ku Mela Xalid Baqî, berpirsiyarê berê yê Hêza Sergurd Ebasî û berpirsiyarê dadperwerîyê yê melbenda bakûra Kurdistana Îranê, çû ser heqîyê.

(Mela Xalid nexweş bû û ji bo çareser kirina nexweşîyê ew şandibûn cihekê. Lê mixabin, nexweşîya wî bi dermanan nehate çareser kirin û ew çû ser dilownîya xwe.)

Mirina Mela Xalid, em hemû xemgîn kirin û bitaybetî ji bû EIî pir bi dax û keder bû. Roja dûra, civîna melbendê li gundê Kawlanê hate girtin. Di vê civînê da biryar hate dan ku ez û

Elî digel desteyek pêşmergeyan biçin polîtburoya partîyê. Lê digel xilasbûna civînê, befirê lê kir û sê roj û şevan barî. Befireke giran bû û bilindahîya wê digihişte metreyekê.

Roja çaran ku befirê vekir, em bi rê ketin. Em grupeke bi 22 kesan bûn. Di seet 9ê sibê da em bi rê ketin. Lê em pir bi dijwarî pêşve diçûn. Giranîya befirê û nebûna rê û ketina Iingên me di befirê da, em pir diwestandin. Piştî çar seetan bi rêveçûnê, taze me karî em rêya ku diçû yêkemîn gundê li ser rêya me, nîvî bikin û bigihin ser kopa çiyayî. Ji wê derê jî me divîya em di nişîv da daketana. Di rê da, Elî tim alîkarîya wan pêşmergeyan dikir ku diwestîyan. Baş li bîra min e ku lingê pêşmergeyekê di befirê da ma û pêlava wî ji lingê wî derket. Elî ku ew jî wekî me hemûyan westîya bû, di dest xwe da paşve vegerîya û çû alîkarîya wî pêşmergeyî bike. Wî destên xwe dixiste nava befirê heta ku pêlava wî pêşmergeyî peyda bike. Lê herçiqas lêgerîya, ew peyda nekir.

Di dawîyê da naçar ma û lingê pêşmergeyî bi naylonekê pêça û ew girêda heta ku lingê wî ji sarmayê neqefile. Em wê rojê heta êvarê bi rê ve çûn. Bi rastî em êdî wetîya bibûn û çu hêz û taqet di me da nema bû. Lê xweşbextane, em nêzîkî gundekê bibûn. Em li ser çiyayekê bûn. Me çend gulle teqandin. Gundîyan dengê guleyan bihîst û hatin hewara me. Wan, pêşmergeyên westiyayî û qefilî dan pişta xwe û ew birin gund. Mirov digot qey Elî qet bi rê ve neçûye. Ew tim di ber dilê pêşmergeyan da dihat û moral dida wan. Piştî 11 seetan bi rêveçûnê di befirê da, em gihiştin gund.

Êdî şev bû. Me şev li wî gundî derbaz kir û sibê zû em rabûn dîsa bi rê ketin. Dijwarîyên roja pêşîn dîsa ji nû ve tekrar bûn (Roja pêşîn em ji seet nehê serê sibê heta êvarê di nav befirê da meşîya bûn û niha seet pêncê serê sibê bû ku bi rê diketin). Êvara wê rojê jî dîsa em gihîştin gundekê û piştî bêhnvedaneke kurt, me ew gund jî di cih da hêla û em bi rê ketin. Di rê da, gundîyan Elî dinasîn û bi dil û can alîkarîya me dikirin. Şeva piştra, em gihiştibûn gundekê li ser sînorê Tirkîyê, Îraq û Îranê. Pêvîst bû ku em bi zûtirîn wext ji wê derê biçin. Her ji ber wê yêkê jî, em sibê zû ji xewê rabûn û bi rê ketin. Êvara wê rojê em gihîştin navçeya Xakurkê di Kurdistana Îraqê da. Li wê derê hewa xweş bû û befir jî nebû. Pêvîst bû ku em biçin binkeyên pêşmergeyên partîyê. Em bi rastî westiyabûn û çu taw û taqetek di me da nemabû.

Piştî 8 rojan bi peyatî rêveçûn em gihîştin binkeyên pêşmergeyan û ji wê derê jî, em yêkser çûn polîtburoya partîyê. Li wê derê, piştî bêhnvedaneke bi nîvrojî, em çûn û di plênuma komîteya navendî da beşdar bûn. Civînê pênc roja ajot û bi awayekî bi serketî karên xwe kuta kirin. Di plênumê da biryar hate dan ku çend kes ji endamên komîteya navendî ji bû bêhinwedanê û herweha ji bû iznê (mirexesiyê) biçin welatên derewe. Elî yêkek ji wan kesan bû. Her ji ber wê yêkê jî Elî li polîtburoya partîyê ma û ez digel pêşmergeyan vegerîyam navçeya bakûra Kurdistana Îranê. Elî digel çend kesên dî ji endamên komîteya navendî çûn

Fransayê û bi qasî mehekê li wê derê man. Piştra, Elî di roja 11.06.1987an da digel grupek pêşmergeyan gihişte melbenda (merkeza) bakûrê li çiyayên nêzîkî gundê Wargenimê. Rojeke bi xweşî û şahî bû. Em hemû dilşa û keyfxweş bûn. Piştî çend meh dûrîtî, me careke dî hev û du didît. Me Elî û hevalên wî ji bo istirahetê, her yêk şandin cihekê. Ew zehf westiyabûn. Hefteyek bû ku ew di rê da bûn. Wan pêvîstî bi bêhnvedanê hebû.

Gava ku Elî çûbû polîtburoya partîyê, jin û zarokên wî di gundekî nêzîkî binkeyên pêşmergeyan da diman. Piştî vegerê, Elî dixwast ji bo dîtina wan biçe wî gundî. Herçend ku ew yêke pir bi tehlîke bû jî, dîsan Elî digel du pêşmergeyan çû wî gundî û piştî dîtina jin û zarokên xwe vegerîya û hate nik me û piştî du rojan, civîna melbenda navçeya bakûrê pêkhat.

Berî hemû tiştî, Elî raportek li ser sefera xwe ya li Fransayê û li ser rewşa partîyê pêşkêşî civîna kir. Dûra, raporta melbendê ji hêla hevalekê ve hate xwandin. Di dawîyê da ji bo karûbarên dahatî yên navçeya bakûra Kurdistana Îranê hindek biryar hatin standin. Yêkek ji wan biryaran ev bû: Beşekî pêşmergeyan divîya çûbane navçeyên Soma, Selmas û Şipîranê û beşekî dî jî divîya ji bo wergirtina bacê û dahatên dî li zozanên Kune Kotirê maban. Roja 9.7.87an em ber bi mintiqeya Somayê ve bi rê ketin.

Piştî meşîneke dûr û dijwar û kudandina rêyeke bi çendîn kilometreyî em gihîştin rêze çiyayên Dugehê li pişta gundê Koranê. Piştî rojekê bêhnvedanê, em dîsa bi rê ketin û çûn çiyayê Kolox li navçeya Sipîranê. Roja dî, me biryar da ku em êrişî ser du pêgehên dijmin li gundên Keleresş û Qesrikê bikin û paşê jî xelkê wan gundên ku ji alîyê rejimê ve bi zorê hatibûn biçek kirin, bêçek bikin. Her ji ber wê yêkê jî desteyek ji hevalan ji bo bidestxistina zanyarîya li ser wan pêgehan (meqeran) çûn û piştî civandina zanyarîyên pêvîst, vegerîyan û hatin bal me. Me li gorî wan zanyarîya bernameya êrişê darijand, grupek pêşmergeya da êrişî ser pêgeha Keleresşê kiriba û piştî girtina wan pêgehan, da gundîyên biçek kirî jî bêçek kiriban. Roja 24. 7. 87an grupeke êrişê bi rê ket û ez û Elî jî digel grupeke dî ya pêşmergeyan ji bo temîn kirina rêyên vegera pêşmergeyan bi rê ketin û çûn di cihên dîyar kirî da cî girt. Êrişê seet neh û nîvê şevê dest pê kir.

Bi alîkarîya bêsîma, me hev û du agahdar dikir. Xeberên xweş dem bi dem digihîştin me. Di dawîye da mizgînîya girtina herdu pêgehan û herweha bêçek kirina herdu gundan dane me. Ji gundê Kelereşê 24 tifek û ji gundê Qesrikê jî 15 tifek ketibûn destên pêşmergeyan. Bi standina wê xeberê, grupa me jî dest bi danîna mayînan li ser rêyên ku pêgehên dijmin bi hev ve girêdidan, kir. Em û grupên êrişê di seet û cihên ku di pêş da hatibûn diyar kirin, gihîştin hev û du. Em pir keyfxweş bûn. Ji ber ku di wan emeliyatan da çu zerar û ziyanek negihîştibû pêşmergeyan û em hemû bi sax û silamet bûn.

Ji wê derê jî em ber bi zozanên Aveziravikê ve bi rê ketin û nêzîkî ronahîya sibê em gihîştin wê derê. Bi dîtina me, xelkê deverê diIşahî û keyfxweşîya xwe nîşan didan û şahî dikirin.

Wê rojê em li wê mintiqê man. Lê, bi ketina tarîyê re, me dîsan dest bi meşînê kir û piştî 6 seetan, me xwe gihand zozanên li pişta çiyayê Sor. Me du rojan Ii wê derê bêhinwedan kir û tivingên bidestketî jî dan xelkê, helbet bi bihayekî pir erzan. Paşê jî em derbazî zozanên gundê Dirîşkê bûn. Le wê derê hindek ji xizm û kesên Elî dijîyan. Çend sal bû ku wan hev û du nedîtibûn. Bi vî awayî, piştî çend salan ji hev dûr ketinê, wan karî hev û du bibînin. Memûrîyeta me hêdî hêdî ber bi xilasbûnê diçû û Elî, divîya careke dî vegere melbendê.

Ew digel grupek pêşmergeya û çend endamên berpirsiyar yên melbendê ber bi Çayayên Kune Kotirê ve bi rê ketin. Ez û grupek dî ya pêşmergeyan ji bo bicihanîna hindek memûrîyeta, emelîyatên leşkerî û karên siyasî li wê derê man. Em jî piştî bicihanîna kar û barên pêsipartî û girtina pêgeha dijman ya li gundê Keyîkan (ku emelîyata me ya dawîyê bû) ber bi melbendê ve bi rê ketin. Hewa ber bi sarbûnê ve diçû. Beşek ji pêşmergeyan digel berpirsiyarên xwe yên wî zemanî çûn cigehê melbendê. Tenê, em deh kes ji bo bicihkirina hindek kar û barên partîyê di cih da man.

Elî digel pêşmergeyan her bi politburoya partîyê ve bi rê ket. Piştî meh û tiştekê, me jî berê xwe da cigehê ku politburoya partîyê lêbû. Em piştî 5 şev û rojan bi rê ve çûnê gihiştin cigehê politburoyê li gundê Bêşê li Kurdistana Îraqê. Elî hate pêşîya me û bi germî em wergirtin.

Paşê jî em di nav binkeyên pêşmergeyan da par ve kirin. Ez û yêk-du kesên dî, em li bal Elî man. Me şeva xwe bi axivtinê borand. Axivtin li ser rewşa navçeya bakûrê û xelkê wê navçeyê û h.w.d. bû. Piştî du roj istirehet, me xwe ji bo kongreya heştan amade kir. Konferansên pêş kongreyê di roja 8 / 12 / 87ê dest pê kirin û di roja 9 / 12 / l987ê da bi hilbijartina nûneran ji bo beşdarîya di kongreyê da, kuta bûn. Her di wan rojan da bû ku di mintiqeya polîtburoyê da hindek tişt dihatin gotin û bi piçepiç dihatin gerandin. Hindek kes ji wê yêkê agahdar bûn û hindek dî jî bi yêkcarî ji rewşê bêxeber bûn.

Heta wê demê ez bi rastî ji ixtilafatên hindurî yên partî û herweha ji wê yêkê ku partî ber bi kuda diçe, bêxeber bûm. Ji ber ku em li mintiqeya bakûra Kurdistana Îranê diman û ji merkeza birêveberîya partîyê dûr ketîbûn. Elî li ser wê yêkê digel me axivt. Min ewha bersiva wî da: Ji ber ku ez û tu, em dost û hevalên hev in, ez te bi tenê nahêlim û min ew bi tenê jî nehêla.

Kongreya partîyê ku di roja 17 / 01/ 1988ê da dest bi karê xwe kiribû, hindek caran hewqas cer û bas zêde di bû ku heyeta birêvebirinê jî nedikarî wê bi rêkûpêkî îdare bike. Dr. Ebdil Rehman Qasimlo, projeyek dabû ku ji alîyê hindek ji endamên komîteya navendî, endamên

cîhgir û endamên şêwirdar ve nedihate qebûl kirin. Wan ew projeye, nedemokiratîk dizanîn. Helbet divê bête gotin ku minaqeşeya ku di plênumê da destpêkiribû, di kongreyê da jî dewam kir. Di dawîyê da proje bi piranîyeke kêm ya dengan hate qebûl kirin û hindek ji endamên komîteya navendî yên bi nav û deng ku bi salan di partîyê da xebitî bûn, navên xwe ji lîsteya kandîdbûna ji bo komîteya navendî derxistin û xwe nekirin kandîd. Endamên dî yên komîteya navendî xwe kirin kandîd û hatin hilbijartin.

Elî jî yêkek ji wan kesan bû ku li dijî proje û Iîsteyê sekinî û xwe kandîd nekir. Piştî xilasbûna kongreyê, em di roja 22 /01 / 1988ê da vegeryan binkeya xwe ya li gundê Bêşê Ii Kurdistana Îraqê. Lê, êdî aşkera bibû ku di partîyê da hindek kêmasî hene. Hisa bedbînîyê, nerazîbûnê û nerehetîyê û h.w.d... her diçû zêdetir dibû.

Her Ii wê derê, endamên kevin yên komîteya navendî Ii dora hev civîyan û biryar dan ku daxuyanîyekê belav bikin. Ew daxuyanî di roja 21 / 3 / 1988ê (yêkemîn roja biharê) da bi imza kirina 15 kes ji endam û cihgirên kevin yên komîteya navendî hate weşandin û her di wê daxuyanîyê da jî bû ku pêkhatina partîyeke nû ya bi navê Partîya Demokrat ya Kurdistana Îranê - Birêveberîya Şoreşger, hate îlam kirin. Piştî weşandina daxuyanîyê, hindek pêşmerge û kadroyên partîyê jê veqetîyan û hatin tevî partîya nû pêkhatî ban. Di destpêkê da, partîya nû, karûbarên xwe pir bi diqet û bi hişyarî bi rê ve dibirin. BeIav kirina daxuyanîyekê li ser îlam kirina agirbesê digel komeleyê û yêke dî li ser birêvebirina siyaseteke bi dostanî û li hev kirinê digel grup û partîyên çep û demokrat, karên destpêkî yên partîya nû bûn.

Nifûsa partîyê roj bi roj zêde dibû û cihê gotinê ye ku; di destpêkê da rêxistin û partîyên dî digel partîya nû pêkhatî hevkarî kirin û alîkarî danê, heta ku konferansa partîyê ya çaran pêkhat. Konferans di roja 29 / 6 / 1988ê da civîya û di roja 10 / 7 / 1988ê da bi awayekî serketî karên wê xilas bûn. Elî, di wê konferansê da bi qazanc kirina hejmareke berçav ya dengan bû endamê komîteya navendî ya partîya nû. Piştî xilasbûna konferansê, ez çûm binkeya partîya nû li Rewandizê û Elî digel du, sê hevalan ji bo pêşve birina kar û baran û çalakîyên rêxistinî li polîtburoya partîya nû ma.

Partîya nû weşandina belavok û kovaran herweha didomand û roj bi roj di saya serê xebat û çalakîyên hevalan, xelkê partîya nû pêkhatî dinasîn. Li binkeya Rewandizê ku em pêşmerge û kadroyên navçeya bakûra Kurdistana Îranê, hemû digel hev diman, me rojên gelek xweş û bi şahî digel hev derbaz kirin. Piştî heşt salan têkoşîneke bê rawestan, yêkemîn car bû ku bi dûr û dirêjî li dora hev civîyabûn û me istirehet dikir. Hêdî hêdî, zivistanê dest pê kir. Roja 6 / 3 / 1989ê, ez û du heval, em bi nehênî ji rêya sînorên Îran û Tirkîyê ra derbazî navçeyên ber sînor bûn.

Biryar hatibû dan ku di biharê da Elî jî digel grupek peşmergeya ber bi navçeya bakûra Kurdistana Îranê ve bi rê keven. Her ji ber wê yêkê jî, ew di meha hezîranê da tevî grupek ji pêşmergeyên bi rêveberîya şoreşger bi rê ketibû. Le gava ku ew digihin sînorên Îraq û Tirkîyê, rastî hindek mişkiIe û dijwarîyan dibin.

Memûrên Tirkîyê yên li ser sînor, Elî digirin. Pêşmerge sê şev û rojan di nav rêhlan da bi zikên birsî li hêvîya wî dimînin. Elî ku ji bo bidestxistina hindek zanyarîyên li ser rêya derbazbûna pêşmergeyan ya here nêzîk çûbû û hatibû girtin. Piştê sê rojan ku tête azad kirin, vedigere dewsa pêşmergeyan. Lê pêşmerge ji ber bêhêzîyê û herweha ji her birsîbûnê vegeryabûne Kurdistana Îraqê. Elî bi naçarî hat û gihişte me. Paşê me digel polîtburoyê temas girt û bi wî awayî me zanî ku pêşmerge sax û silametin û em pir keyfxweş bûn.

Roja 26 / 9 / 1989ê, Elî digel sê hevalên xwe hatin nik me. Em li gundekî ser sînorê Tirkîyê û Îranê bûn. Jin û zarokên Elî jî li wî gundî diman. Me hev û du himbêz kir, me halê hev û du pirsî. Devê me bi ken û dilê me bi şahî bû. Me ji hev ra digot: “Ev rojên xweş nayên li bîr kirin!”

Pêştir me biryar dabû ku ez, jin û zarokên min û jin û zarokên Elî, em biçin Ankarayê û li wê derê daxwaza penaberîyê ji komîserîya bilind ya Neteweyên Yêkbûyî ya ji bo penaberan bikin. Elî ku hat, em çend rojan li bal hev man. Rojên me bi xweşî û rindî û şahîyê derbaz bûn. Me şev û roj behsa demên borî dikir. Roja 10 / 11 / 1989ê, ez, jin û zarokên min û jin û zarokên Elî, em çûn buroya Neteweyên Yêkbûyî Ii Ankarayê û me daxwaza penaberîyê kir. Piştî wê ku me bersiva hindek pirsên polîs û yên buroya Neteweyên Yêkbûyî da, izin dan me ku em li wê derê bimînin. Em 45 roja li Ankarayê man. Piştra, em şandin bajêrê Konyayê. 55 roja jî em li wî bajêrî bûn ku ji alîyê berpirsiyarên buroya Neteweyên Yêkbûyî ji me ra hat gotin ku heta zemanê ku Elî bi xwe neyê, jin û zarokên wî dê li Tirkîyê bimînin.

Min xeber hem ji Elî ra û hem jî ji berprisiyarên partîyê ra şand û min li ser wê meselê ew agahdar kirin. Piştî şêwrên dûr û dirêj digel berpirsiyarên partîyê, Elî biryar da ku bête Konyayê. Em bi hev ra çûn Ankarayê û li wê derê, EIî xwe bi buroya Neteweyên Yêkbûyî da nasîn.
Wan jî ew bi polîsê Konyayê da nasîn. Piştî pirsîna hindek pirsan ji wî, polîsa pêra gotin ku çend rojên dî ew dê kartê mafê rûniştinê bidin wî. Di wê navbirê da, ez digel heyeta Hollandî ya ku ji bo wergirtina penaberan hatibû, axivîm û daxwaza min ya ji bo penaberîyê hatibû qehûl kirin.

Rojên dawîn yên ku min û Elî, me bi hev ra Ii Konyayê derbaz kirî, qet çu caran ji bîra min naçin. Elî bi timî digot: “Heke hûn biçin, ez dê dîn bim. Ji ber ku min qet adet negirtîye ku bitenê bimînim.” Min di anî bîra wî ku qudreta wî ya tab kirin û tehemulê ji bo me hemûyan nimûne ye. Lê dîsan jî, wî digot: “Di destê min da nîn e, ez nikarim tehemul bikim.”

Piştî çend salan têkoşînê, yêkemîn car bû ku em bêçek di bajêrekî bîyanî da dijîyan. Bêyî ku em bizanin ku dijminê bextreş û bi rik û kîn, tim li pey me ye û li keysekî minasib digere heta ji pişt ve û ji nişkave derbê xwe li me bide.

Roja pêncşembê, di seet yêkê piştî nîvro da, EIî em bi rê kirin. Ew heta îzgeha otobusa Konyayê digel me hat û heta çûna otobusê jî li wê derê, li nik me ma. Me hev û du himbêz û maç kir û min çi dizanî ku eve cara here dawîn e ku ez wî dibînim. Me xatira xwe ji hev xwast û me ji hev û du ra got: “Bi hêvîya dîtineke dî” û otobus bi rê ket. Me herwekî deb û resmeke kevnare destên xwe ji hev ra dihejandin. Otobus her diçû dûrtir dibû, lê min herweha destê xwe ji Elî ra dihejand. Elî ji ber çavên min êdî winda bibû û min êdî ew nedidît, Iê dîsan jî min her wisan destê xwe li pişt pencereya otobusê dihejand û xatira xwe ji wî dixwast.

Û niha, piştî 6 mehan ku wî dengê lerzokî di telefonê da ji min ra gotibû: Elî şehîd bû”, ma heqê min nebû ku ez ji wê xeberê tal bawer nekim. Ez dinalim, zarezara min bû, Iê dîsan jî min ew yêke bawer nedikir.. Heta çend meh paşê jî min her bawer nedikir.

Lê, mixabin, sed cara mixabin, ew xeberê tal rast bû. Bêbextên diIreş yên mirovkuj, bi namerdî û li pêş çavên dayîk, jin û zarokên Elî, ew revandibûn û biribûn ser rêya Konya û Ankarayê kuştibûn û paşê jî cenazeyê wî avêtibûn kenarê rê. Ew dê her di dilê gelê Kurd da bijî. Ez qet nikarim wî ji bîr bikim. Bîra wî, kena wî û rabûn û rûniştina wî, dê her demî û heta roja ku li ser erdê bim, dê her wisan di bîr û dilê min da bi rêz û rûmet bin!

**Ismet Ebdî / 08.02.1991**

# AGAHDARÎ

GeIê mêrxase Îranê! XeIkê şoreşgere Kurdistanê!

Pazdehê tebaxa sala borî (1990), kek Elî Kaşifpûr ji alîyê komîserîya bilind ya penaberan ya Neteweyên Yêkgirtî ve digel jin û zarokên wî li bajêrê Konyaya Tirkîyê, hatibû cih kirin heta ku bi vî awayî bikare jin û zarokên xwe derbazî cihekî emin bike û paşê bi xwe vegere nav rêzên şoreşê. Lê di nîvê şevê da, sê kes terorîstên hirfeyî (profesyonel) yên biçek û pê cil û bergên polîsên Tirka, têne mala wî û bi hêceta ku dê wî bibine polîsxaneyê, li ber çavên jin û zarok û dayîka wî ji mal birin û mixabin roja paştir cenazeyê wî yê bêruh û dest û pê girêdayî li yêkek ji taxên kavile Konyayê ji alîyê poiîs ve hate peyda kirin.

Belê, kek Elî bi vî şêweyê necamêrane ji alîyê terorîstên gihandî yên rejima Islamî ya Îranê ve, hate teror û şehîd kirin. Aya ewî çi guneh kiribû? Bi dîtina qatilan û talankerên serdestên rejimê; kek Elî bibaşî rastîyên gelê xwe nas dikirin û tevayîya wicûda xwe ev ihsas dikirin û dizanî ku çi renc, sitem, cudahî, biçûk kirin û heqkujîyê dikêşin. Di wan şertên hanekî da tu dikarî çi bikî? Xwuya ye ku insanên xwedîşeref û wijdan û berpirs û şoreşger, dê beramberî zordaran bisekine û berxwe bide ji bo bidestanîna mafê sitemlêkirîya.

Belê, kek Elî jî ev rê an ku rêya berxwedanê û şoreşê hilbijartîbû û pir baş ji bo vê armancê xebat kir û jê ra wefadar mabû. Li goreyî dîtina rejima tarîtîyê û terorê, hemû xisletên insanî û azadîxwazî guneh (suc) têne hesabê. Zêdetir ji deh salane ku evana pê vê fikra xwe ya kevneparêz û wêranker, kesên azadîxwaz, welatparêz û şoreşgere welatê me idam dikin û di zîndanan da îşkence û eziyetê Iê dikin. Ji bo yên mayîn jî jîyana dojehê xelat anîne û ji beytilmala miletên Îranê, xercên giran têne standin, ji bo ku li herçar alîyên cihanê, kesên kêrhatî û azadîxwaz û têkoşerên siyasî, teror bikin.

Heke em, kiryarên çend salên borî yên rejimê ber çavan ra derbaz bikin, hingê emê bizanin ku rejima kevneparêz xeynî ji wêranî, kuştin, şer, fetisandin, pêpeskirina azadîyên civakî û siyasî û ferhengî, navbirina çavkanîyên welat, wêran kirina

ekonomîyê, bihabûna bêhed, enflasyon, bêkarî û ji hemûyan girîngtir keda şûm ya destê vê rejîmê, rewac kirina itiyadê di nav miletên Îranê bi taybetî cûna xort di cihê leyizên selametîyê û azadîyê da; evana hemû netîceyên fikrên rejîmê yên kevneparêzîyê ne.

Misellem e ku rejîmeke hanekî ji teror kirina kesan heta li cihên giştî da bombe danînê çi tirsek din nîn e û evana bûne xîmê siyasetên hikmetê û wan bikartînin. Wekî gotina pêşîyan; "ji koze ew tête derê, ya ku têda ye". Ji vê hindê xafil ku pê pev anîna atmosfera tirs û wehşetan jî, terora kesan çu caran nabe sebebê vê hindê ku di îradeya kesên azadîxwaz û şoreşger da sistîyê çêke. BeIkî berowajî vê da bihêzter ji pêş, dirêjîyê bi şerê xwe didin û heta dibe delîwe ku wijdana insanî û bereyê azadîxwazîyê bihêztir be.

Niha tevî weşandina vê agahdarîyê, em bîranîna teror û şehîd kirina kek Elî, germ digirin û tevî şertên îroyîne cihanê û rojhilata navîn û bi taybetî di Kurdistanê da ji hemû komel û partîyên siyasî yên Kurdistanê dixwazin, ji bo mafê gelê Kurd ji hemû meseleyên piçûk û negirîng û ixtilafên grupî derbaz bin û di cepheyekê da bibin yêk. Em bibawerin, ku ev yêke dê bibe sebebê dilgermî û berxwedana gelê Kurd li Kurdistana Îranê û hêvîyeke mezin ji bo paşerojê û bersiveke pozîtîv li serdilê kes û karên şehîdên serbilinde Kurdistana Îranê. Di dawîyê da, em di vê rojê da teror kirina kek Elî Kaşifpûr, bi tundî şermzar dikin û ji dewleta Tirkan dixwazin ku sebebkarên vê cinayetê bibîne û ceza bike. Hêvîdarin ku emê ji berê zêdetir û baştir hev bigrin û deynê xwe ji bo seranserî Îranê bi taybetî gelê Kurdistanê û şehîdên Kurdistanê û şehîd kek Elî Kaifpûr, bînin cih. Bîra wî hêja be, ruhê wî şad be.

Komek ji dost û hevsengerên berê yên kek Elî û binemala wî:

**Rûniştîyên Hollandê / 15.8.1991**

# BÎRANÎNEK LI SER ELÎ KAŞIFPÛR

Xeber pir kurt bû û min bawerî pê nedikir. Lê rast bû. Rastîyeke tal û nexweş û dilhingêv. Ji bo qaseke kurt, min li kesê ku xeber anîbû nihêrt û paşê, min bi çend caran li ser wê yêkê, jî wî pirs kir. Tişta ku min ji wî bihîstibû min çend caran anî bîra xwe. Di dawîyê da bi neçarî min qebûl kir ku ew yêke rast e.

BeIê, di wê nîveşeva tarî û kambax ya “Konyayê” da, desteyeke bextreş û xulamok, ji bo bi cihanîna planê qirêj yê melayên Îranê, bi kincên polîsên Tirkîyê dikevin mala Elî û ji wî dixwazin ku digel wan biçe merkeza polîs û ew yêke bû destpêka dawîya jîyana Elî ya pir bi şanazî û rûmet. Roja dî, cenazeyê Elî yê di xwûnê da gevezbûyî, hate peyda kirin. Her bi mirîtî jî, dîsan dîtina rûyê Elî yê bi tesmîm, bêtirs û ciddî, dida xuyanê ku ew di jîyana xwe da xwudanê çi karnameyeke berbiçav û bêhempa bûye... Û her seetekê piştî şehîdbûna Elî Kaşifpûr, xeber di mintiqê da belav bû. Rûyê Elî yê geş di demê şehîdbûnê da jî her wekî demê jiyanê bi semîmî bû. Elî ji mirinê neditirsiya û mirov digot qey wî ew “mirine” pêşbînî kiribû û ber bi wê ve çû bû da nîşan bide ku ew dê rêya xwe ya hilbijartî heta dûmahîkê bidomîne. Ew bi xelkê xwe bawer bû. Ji bo xelkê xwe jîya, ji bo wî xelkî têkoşî û di dawîyê da jî her di rêya bidestxistina armanca gelê xwe da şehîd bû.

Birastî, EIî xwudanê şexsîyeteke bêhempa bû. Kêm kes hene ku bi dîtin û nasîna wî di bin tesîra taybetmendîyên wî yên sincî (exlaqî) yên hêja da nemabin. Axivtina li ser şexsîyeteke ewha dijwar e. Meger ku mirov ji bo vê yêkê rûhîye û xasyetên wî yên berbiçav û şoreşgerane bide pêş çavên xwe û ji wan alîkarîyê bistîne. Birastî, hilbijartina bêjeyan ji bo qedirnasî ji şexsîyeteke wisan pir bi zehmet e. Rola ku kak Elî di tevgera şoreşgerane ya gelê Kurd ya nêzîk û nihayîn da Ieyist û tesîra ku wî danî ser, dê her û her di bîra wan kesan da, ku ji bo rizgarîya gelên bindest û bitaybetî gelê Kurd dixebitin, wekî diyardeyeke xwudan qîmet û giranbiha bimîne û qet ji bîr naçe.

Elî 9 salan di rêveberîya Partîya Demokrat ya Kurdistana Îranê da bi çalak û bi sadiqane ji bo armancên gelê xwe û tevgera wê ya şoreşgerane xizmet kir. Elî azadîya gelê Kurd û ya gelên dî yên bindest ji bin nîrên zordest û paşverûyan û herweha damezrandina demokrasî û edaleta civakî ji xwe ra kiribû armanc. Kak Elî 12 salan, çek di milan da, li çiyayên Kurdistanê gerîya; ji bo hişyar kirina çînên gel, têkoşî; li dijî dîktatorîya reş ya melayan şer kir; tehlûkeyên dîktatorîya şaşik bi seran, bi şev û roj da zanîn. Ew ji bo pêkanîna civateke ku têda zordarî û kedxwarî tunebe, bê rawestan xebitî. Di rêveberîya partîyê da jî, ew tim terefdarê radîkalîzekirina tevgerê bû. Piştî guhartinên hindurî yên partîyê, Elî ji bo

bicihkirina xîçên siyasî yên nû yên rêveberîyê û hilbijartina bernameyek radîkaltir û demokratîk û şoreşger, bi dil û can xebata xwe domand. Her ji ber wê yêkê û ji ber rola wî ya ber bi çav di rêvebirin û organîzekirina têkoşîna çînên bindest û zehmetkêş da bû, ku kîna dijminê tevgera meşrû ya gelê Kurd Ii dijî wî zêde kir.

Di wan 12 salên têkoşînê da, Elî bê rawestan û bi awayekî aşkera li dijî paşverûtîyê şer kir û ji bo wê ku zehmetkêş bi başî mafên xwe binasin, bi rêkûpêkî bi wan ra dida û distand û ji bo ku ew têkoşîneke gur û geş û aktîv ji bo bidestxistina mafên xwe yên neteweyî û demokratîk pêşda bibin, rê nîşanî wan di da. BeIê, ev xebatên de, di 12 salên têkoşînê da ji bo Elî bi bûn bername û çalakîyên herroj. Qet ji bîra min naçe, ew gava ku qirar bû ji bo mehekê û ji bo izinê biçe Fransayê. Xema dilê wî ya herî mezin ev yêke bû ku ew dê mehekê ji xelkê xwe dûr bikeve û wê yêkê li wî eser dikir û dilê wî di êşand. Ji ber ku Elî birastî mêrê meydana emel û pratîkê bû. Bawerîya wî bi xelkê û rola wan di têkoşînê da hebû. Ew bi dil û can ji bo organîzekirina çînên xelkê dixebitî û şêweyên têkoşînê û emelîtirin rêya biserketinê nîşanî wan dida. Ew tim li ser tehlûkeyên sektarîzmê û dûrketina ji xelkê disekinî. Di sewîya birêveberîya partîyê da jî, ew yêkek ji wan kesan bû ku qet neditirsiya û digel wê jî ku mintiqe ji aiîyê rejimê ve bi têkrayî hatibû mîlîtarîzekirin, teqrîben timamî dewrana xebata xwe ya siyasî di kûrahîya navçeyên ku di bin destên dijmin da bûn, derhaz kir.

Her çend ku birîneke kûr di singê wî da hebû (sala 1979ê birîndar bibû) û wê birînê tesîr danîbû ser dilê wî, lê dîsan jî, ew 12 salan timam li çiya û deştên Kurdistanê û gund bi gund gerîya, bi hezaran kemîn û dafikên dijmin pûç kirin û bi vî awayî karnameyeke geş û pir bi serfirazî û serbilindîyê li paş xwe hêla. Birastî jî, mehbûbîyeta ku wî di nav xelkê da qezenc kiribû, netîceya wan taybetmendîyên wî bû.

Elî herweha ku di pirsên siyasî da ciddî û di têkoşînê da bê westan bû, herweha jî xwudanê exlaqekî şoreşgerane û hêja û di danûstandinên xwe yên civakî da dilovan, biatife û nimûne bû. Mirov, ji reftara wî ya di nav civatê da û ji rabûn û rûniştina wî ya şexsî pir tişt hûdibûn. Ew xwudanê dilekî nerm û bişewat bû. Her gava ku ji bo memûrîyetê an ji bo bicihanîna karekê hatiba binkeyên merkezî yên partîyê, piştî vegerê, dinyayeke xatira û tecrube ji bo me dihêlan û diçû.

Tim behsê xelkê û têkoşînê dikir û bi dil û can ji wan hez dikir. Piştî wê ku ew diçû navçeya memûrîyeta xwe, ez bi hefteyan, li ser wan roj û seetên ku me bi hev ra derbaz kiribûn, difikirîm. Pirî caran ku nûçeyên biserketina pêşmerge û komîteya di bin berpirsiyarîya Elî da, digihîşte destê me, min bi dîtina wan ihsasa serfirazî û serbilindîyê dikir û min şanazî dikir ku ez digel şexsîyetekî ewha dost im û em bi hev ra di têkoşînekê da ne. Nîgeranîya min tim ev bû ku nebe ku qezayek biqewime û ew nikaribe rola ku ew dikare di tevgerê da

bileyize, bibe serî. Mixabin, sed cara mixabin ku ew nigeranîya min di dazdemîn sala beşdarîya wî ya di şerê li dijî dîktatorîya islamî da, derkete rastîyê.

Bêşik, Elî di dostanîyê da mirovekî durust û bêhempa û têkoşerekî bêrawestan bû. Ji roja ku min ew nasî û heta wê gava ku min bi dilekî kul û kovan û keder xeberê şehîdbûna wî bihîst, min ji wî û ji jîyana wî pir tecrube qezenc kiribû. Gelek bîreweriyên min digel wî hene. Lê her li goreyî dersên ku ez ji wî hûbûme, ez di xwe da cesaretê dibînim ku bêjim ku nikarim çu yêkê ji wan hilbijêrim û di vê bîranînnameyê da li ser bi axivim. Ji ber ku her hereket û Iivîneke wî tijî ders û tecrube bû.

Ez bi şehamet dibêjim ku di tevgera gelê Kurd da, Elî kadirekî bitecrube û hêja, rêber û rênîşanderekî karezan bû ku dikarî bi serketinî teorîya şoreşgerane vegerîne û bêxe pratîkê û bi alîkarîya fikra xwe ya şoreşgerane û pêşkevtinxwaz, têkoşîna şoreşgerane ya zehmetkêşan di çarçoveya berpirsiyarîtîya xwe da bi rêve bibe.

Nebûna Elî ji bo tevgera gelê Kurd valahî û xusareteke bi kul û kovan e. Pir kirina vê valahîyê jî hêsan nîn e. Hemû kesên ku Elî û xebata wî ya bi şanazî û serfirazîyê ve tijî dinasin, bi şehîdbûna wî dilê wan êşîya û ji bo wî daxdar û xemgîn bûn. Zehmetkêşên Kurd, bitaybetî çînên tengdest û hejar yên navçeya bakûra Kurdistana Îranê, ji nav çûyîna Elî, valahî û xusareteke diltezîn zanîn û ji ber şehîdbûna wî ketin şînê.

Elî çû ser heqîya xwe û em bi dilên kovan û keder û tijî ji mereq di cih da man. BeIê, bêşik wî niha em ji bîr kirine û bi aramî di aramgeha xwe da raketîye. BeIê, şehîdbûna Elî ji bo me rastîyeke tahl û bi dil êş e, ku em bi neçarî divê wê rastîyê qebûl bikin, lê em ji bîr nekin ku rastîyeke dî ya ku dilê mirov xweş dike jî heye û ew jî şanazî, serbilindî û serfirazîyana ne ku ji me ra wekî diyarîyeke giranbiha hêlaye.

Belê, Elî niha bê ruh û giyan di aramgeha xwe ya sar da raketîye, lê bîra wî tesîrên jîyan û çalakîyên wî yên pir bi şanazî û sehr bilindîyê, fedakarîya wî û ders û tecrubeyên giranbiha û birûmet ku wî di cih da hêlane, dê di dilê dostên wî û di dilê gelê Kurd yê bindest da bi timî bijîn.

Bi vî awayî jîyan û “mirin” bi xwe serbilindî û şanazî ye. Ew dê her di dilê me da bijî û bîra wî dê heta hetayê domdar be.

**E. Hicab**

# ELÎYÊ HEVAL!

Min hingê EIî nas kir ku ez biçûk bûm. Ewî mekteba seretayî (destpêkê) timam kiribû û renge jî di sala yêkê ya mekteba navîn da bû. Babê min, ez teşwîq dikirim ku ez digel Elî hatûçûyê bikim û ji bo kar û barê dersxwandinê, ji wî hevkarîyê werbigirim. Rojekê min ew li mala mamê wî ku cîranê mala me bû, dît. Bêyî wê hindê ku xwe ji min mezintir ihsas bike, digel min axivt. Wê demê ku ez di sala pêncan ya seretayî da bûm, Elî pirtûkên xwe yên sala şeşan wekî xelat dane min. Her wisa gelek ez teşwîk kirim ji bo dersxwandinê û rênimanî kirim. Wê gavê Elî ji bo min û gelek kesên wekî min pêşrewek bû ji bo fêrbûn û jîyanê. Paşê û heta sala 1970an em ji hev dûr ketin û me hev û du nedît.

Lê paşê min ew di sala 1979an da dît ku êdî ew bibû xortekî di cil û bergekî dî da. Û ji wan xortên ku di bakûra Kurdistana Îranê da xwanda bû û ji bo xelkê zehmetkêş xebat dikir û ew organîze dikirin ku mafê xwe yê civakî û şexsî biparêzin. Xanên mintiqeyê ku milk û gundên xwe ji dest dabûn, wisa dizanîn ku ji bo wan şoreş hatîye kirin û dem hatîye ku ew mal û milkê xwe yê ji dest çûyî ji cotyaran werbigrin. Gelek ji wan Xanan bi zora çek û hêza ku di mintiqeyê da hebûn, fayde birin û gundî ji mal û gundan avêtin der û ji nû ve besata Xanîtîya xwe pahn kirin. Ez ji dûr û nêzîk ve şahidê xebata Elî bûm ku çawan mafê cotyaran diparast û herwisa pêşî Ii sitem û zordarîyên Xanan digirt. Ew bi xwe jî ji binemaleke zehmetkêş bû. Mirov dikare bêje ku EIî ji bo yêkitîya neteweyî dixebitî û ew bibû armanca wî. Her di wî halî da dixwast nîşanî hindek xwudan milkan bide û wan serwext bike ku cotyar sebebê rewş wan ya nebaşe ekonomî nîn in.

Elî bi vî rengî dixwast çirûskên xebata neteweyî û çînatî ku wê demê di seranserê Îranê û Kurdistanê da diçirisî, ji bo aştîyê di mintiqeyê da bikar bîne. Wê gavê Elî hate bal min û ji min xwast ku ez jî rêya wî bigirim û jê ra arîkar bim.

Min pêşnîyara wî qebûl kir, çûnkî min bawerî bi Elî hebû û rêya min ya siyasî wê demê û pê ve hate kivş kirin û min rêya Elî girt. Demeke dirêj ku rewşa me baş bû, me karî wextekê ji bo fêrbûna siyasî veqetînin û fêrbin. Ji hingê û paşve, me bi şêweyeke resmî xîmê (xerzê) komelê di minteqeyê da danî û dest bi xebatê kir. Ez di hemû civat û civînên ku ji bo gundîya dihatin amadekirin da, tevî Elî têda beşdar dibûm. Gelek nekêşa Elî karî xwe di dilê xelkê mintiqeyê da bi cih bike û bi vî rengî yêkemîn hêza leşkerî ya partîyê di bakûrê da ji xortan hate çêkirin û dîsan gelek nekêşa ku em bûne hêzeke siyasî û leşkerî ya mezin.

Elî di mintiqeyê da giranî dida ser hişyarkirin û agahkirina xelkê û me bi bêimkanat û dest tengîya xwe karî hindek kovar û traktan biweşînin û bi xelkê bidin xwandin. Hizûra Elî di nav gel û bitaybetî zehmetkêşên navçeyê da dibû sebebê dilgermî û hêvîdarîyê ji şoreşê û herwisa serketinê. Heta demê ku partîyê hêza bergirî ya neteweyî (bergirê millî) ji xelkê pêkanî, ev hêza paş partîzan, pahn û berîntir bû. Mintiqeya coxrafî ya ku Elî têda dixebitî, têra xebata wî nedikir Iê ew hêvîdar bû ku çirîskên agirê berxwedanê di seranserî Kurdistanê da geş bike, bitaybetî di bakûra Kurdistana Îranê da.

Di sala 1980an da desteyek ji hevalan hatin şandin ji bo arîkarîya hevalên têkoşer yên mintiqeya Kotorê. Elî dixwast ku ew yêkemîn kes be ligel wê desteyê , Iê heval razî nebûn. Çûnkî wan dizanî, lazime Elî di mintiqeya xwe da be. Di encamê da hevalek dî hate hilbijartin û şandin. Wê demê, xelke Kotorê û pêşmergeyan rejim êxistibûn tengasîyeke mezin, heta wê hindê ku Benîsedir serok komarê hingê yê Komara Îslamîya Îranê, destûr da Ieşkerê xwe û got; “Bi vî şêweyî ez destûrê didim ku esker nabin pêlavên xwe yên eskerî (potîn) ji pê xwe bîne der” heta ku şoreşê di çiyayên Kurdistanê da bêdeng bikin. Ez naxwazim ji cinayetên eskerê Benîsedir behs bikim. Çûnkî ew xala reş di tarîxê da hatîye sebitkirin û milet evê yêkê baş dizane û ji bîr nake.

Di destpêka şerê Îranê û Îraqê da û piştî ku pêşmergeyên me ji Kotorê vegeryan, me meqerê xwe Ii gundê Axçeqeleyê di mintiqeya Somayê da bi cih kir. Lê mixabin bingeha me ya Axçeqeleyê ji alîyê hêzên hewayî yên rejima Îranê ve hate bombekirin û wê bombebaranê nîv seet kêşa û pişkek ji xanîyên gund hatin wêran kirin û hindek kes hatin kuştin û birîndar kirin.

Elî jî yêk ji birîndaran bû. Parçeyekî raketê bi singê Elî ketibû û xwûneke boş jê diçû. Me jî imkanên dermanî çunebûn ku bikarin Elî derman bikin. Lê nabe em ji bîr bikin ku hevalên me yên “Partîya Sosyalîsta Kurdistana Tirkîyê” ji bo necata Elî û birîndarên dî, xebatake hêja kirin lê mixabin wan jî imkanên dermanî yên lazim nebûn. Kêm mabû ku em Elî ji dest bidin. Heval Cangîr, wê demê endamê komîteya merkezî û berpirsiyarê mintiqeyê bû. Heval Cangîr, karî bi şêweyekî nepenî Elî bişîne nexweşxaneyeke Urmîyê. Divê ku li vê derê ji Çirîkên Fedayî yên XeIk (Eşrefi) jî sipasî bête kirin, çûnkî wan jî gelek zehmet kêşan û arîkarîya Elî kirin. Hêj çend roj ji mana Elî li nexweşxaneyê derbaz nebibûn, ew ji aIîyê xulamên rejimê ve hatibû naskirin.

Pêş ku bête girtin, wan hevalan karîn wî ji nexweşxaneyê birevînin û ji destê rejîmê xilas bikin û derbazî mintiqeya azad bikin. Çu caran ez neşêm ji bîr bikim ku ew li ber mirinê bû, lê wî xwe berze nedikir, bi mêranî tev mirinê dest û pence nerim dikir û dildarî didane me û ji me dixwast ku divê em dirêjîyê bidine rêya wî.

Hêj birînên wî ha çênebibûn ew vegerîya çeperê şoreşê. Em diketin bin çengê wî û gund bi gund digerîyan û di civatên xelkê da beşdarî dikir. Pê hewseleyeke bê hemta guh dida pirsên xelkê û bersîvên wan dida. Çu caran kontrola xwe ji dest nedida û heta eger heqaret û tohin jî lê hatiban kirin, bikenîn bersîva terefê xwe dida. Di dawîya her civînekê da derîyê hemû malan jê ra vekirî bûn Iê ew diçû mala yê herî feqîr. Em tev Elî diçûn nik wan feqîra û her ew xanî bibûn cihên civînên Elî yên veşartî û bibûn girêyên bawerîyê û hevgirtinên gundî û zehmetkêşan. Di dawîya her şevekê da komikên nepenî dihatin çêkirin û rênimanîyên pêvîst dihatin dan.

Di mesela cudabûna komika heft kesî da ya piştî kongreya çaran, Elî yêk ji wan kesan bû di mintiqeyê da ku dijî wê desteyê rabû. Gerçî hejmara kesên wefadar bi partîyê ji çend kesan derbaz nedibû, dîsan di hemberî desteya heft kesî da ku piranîya hêzên leşkerî û siyasî yên mintiqeyê pişt serê xwe hebûn, dîsa jî ew teslîm nebû û ji tehdîdên wan netirsîya û ji biryara xwe paşve nekişiya.

Kek EIî û hevalên wî ji bo parastina xwe çûn gundê Keynesîyê di şirîta sînorê Îranê û Tirkîyê û wê derê da cih girtin. Hetanî hêzên arîkar yên partîyê Ii navenda Kurdistanê ji bo arîkarîya wan gihîştine mintiqeyê, ew di wî gundî da man û berxwe dan. Pê wê berxwedanê karîn plan û nexşeyên desteya heftkesî ji xelkê xwe ra ron bikin û partîyê karî careke dî xwe di nav mintiqeyê û xelkê da cih bike. Elî ser wê bawerîyê bû ku dibe tev kesên desteya heftkesî bi nermî û dostînî reftar bête kirin lê mixabin ew dîtina Elî qebûl nekirin û di encamê da xwûna xortên demokrat bi destê hev hate rijandin û eve bû destpêkek ji bo şerê birakujîyê û hetanî demekê jî dirêjî hebû. Piştî çend mehan rewş hate guhartin û hêzên partîyê di mintiqeyê da ji çend rêya ve ketine ber êrişan. Ji alîyekê desteya heftkesî û rexê dî ve jî hêzên Qiyadeya Muweqqet û hêzên hikumeta Îranê, pişta wan girt. Hêzên partîyê ketine tengasîyê û qerar da ku ji bo demekê bakûra Kurdistanê xalî bikin.

Elî tevî hevalên xwe piştî çend rojên bi şer û rev, karîn xwe bigihînine mintiqeyên azadkirî yên di destên hêzên partîyê da. Wê rewşa nû û dûrbûna ji mintiqeya xebata xwe, Elî gelek nerehet dikir û zecir dikişand. Ewî xebat dikir daku bi mintiqeya xwe ra temasê bigire û vegere wê derê û dirêjîyê bide xebatê. Elî di axira payîza 1981an da karî vegere bakûrê.

Hêj çend roj mabûn ku ew vegere, ew mijûlî amadekirina tiştên seferê bû û her rojek diçû û nêzîk dibû ku ew biçe, rûyê wî geştir dibû. Hevalên Elî nedixwastin ku ew di wan şertên nebaş û nexweş da biçe mintiqeyê, Iê sebir nekir û demê ku diba çûba wî hereket kir û çû bakûrê. Cara dawîyê ku min Elî di Kurdistanê da dît havîna 1982an bû. Ew êrişa rejimê ya duyan bû ku êrişeke pahn û berîn bû hatibû ser mintiqeya azad ya bakûra Kurdistana Îranê.

Wê carê rejîm bi planeke dî hatibû meydanê anku bi hêzeke mezin ji hewa û erdê ra êriş kiribû, Iê wê carê Elî û hevalên wî navçe di cih da nehêlan û hêzên pêşmergeyan bi desteyên

biçûktir dabeş kirin. Bi vî şêweyî dirêjî dane şerê partîzanî û berxwe dan. Elî heta dawîya jîyana xwe ku di Tirkîyê da hate şehîdkirin, dirêjî da wê rêyê û rêveberî kir. Min Elî digel hêvî û daxwazên wî di navçeyê da hêla û piştî hefteyekê ez vegeryame merkeza Kurdistanê. Xêncî ji wê hindê ku di rêya weşanên partîyê û radiyoya partîyê da me dikarî ji xebat û kiryarên Elî û hevalên wî agahdar bibin û di her firsetekê da me ji hev ra name dinivîsîn û bi hev ra dişêwirîn.

Herçend şertên xebatê zehmettir dibûn, meydanên xebatên siyasî û eskerî tengtir di bûn, Elî zêdetir bi serketinê hêvîdar di bû. Herçend rejimê tund û tîjî nîşan dida, ewî jî bi wê endazê têkoşîna xwe tundtir dikir. Elî pê çend desteyên biçûke pêşmergeyên partîzan, di mintiqeyê da heta wî cihî karîbû ku rejimê halê amade bûnê da, di ordîgehên Urmîyê û Selmasê da bihêle. Elî di her firsetekê da xwe digihande bajêrên nêzîk û ji bo armanên xwe xebat didomand û bi xelkê ra daxivt û ji ber wê hindê jî bû, herroj hevalên Elî yên Azerî zêdetir dibûn û heta dawîyê jî ji Elî ra wefadar man. Min û Elî, di dûv kongreya partîyê ya heftan da hevdu dît.

Zivistan bû û befireke stûr ketibû û hemû rêyên ku diçûne bakûrê hatibûne girtin û ji alîyê rejimê ve jî dihatine kontrol kirin. Lê Elî, di vî şertê hanekî da jî ji bû kongreyê xwe gihandibû cihê kongreyê li merkeza Kurdistanê. Ew gelek westiyabû lê dîsan dikenî û nedixwast nîşan bide ku westiyaye. Herçrnd rewşa siyasî ya kongreyê gelek xwe nebû û nehezê Elî gelek bûn, lê Elî dengên pêvîst ji bo endametîya komîteya merkezî anîn û careke dî bû endamê komîteyê û hêj bêhna xwe venedabû ku dîsa vegerya bakûrê, ku wê demê ji bo gelek kesan hêsan nebû biçine bakûrê û xebatê bikin.

Çend rojên ku em li bal hev bûn, mêhvanên polîtburoya partîyê bûn. Min hevkarîya EIî kir ji bo amadekirina tiştên pêvîst bo navçeyê û rêya wî. Ew wekî hercar dikenî û digot; “ji biyografiya min ve şaxa neyne û gelek sade binivîse.” Paşê zêdetir kir û got; “em dê ji te ra deng û behsan rêkin, ku di radyoyê da bêne belav kirin”. Piştî hingê ku min di sala 1983an da Kurdistan bicih hêla, danûstandinên min bi Elî ra, tinê name nivîsîn bûn. Min ji binemala wî dipirsî, lê ewî berê ji binemala xwe ya mezin anku zehmetkêşên Kurdistanê ra dinivîsî û methê wan dikir û digot; “wan hêj em di meydana xebatê da tinê nehêlane û Ii pişta me sekinîne.”

Cara dawîyê, pêş şehîdbûna wî, di sala 1987an da Ii Parisê min Elî dît. Digel sê endamên dî yên partîyê ji bo bêhnvedaneke çend hefteyan hatibûn Parisê. Ez û hevalek çûne pêşîya wan. Polisê balefirgehê ji pasaport û kaxezên wan îrad girtin û

kêm mabû ku wan rêkene Îranê. Me ji polisa tika kir ku ez li bal wan bimînim û ji wan ra tercumanîyê bikim.

Di encamê da dexaleta Partîya Sosyalist ya Fransayê ku wê demê kongreya Lilleyê hebû û sekreterê Partiya Demokrat kek Doktor Qasimlo jî yêkek ji mêhvanên kongreyê bû, karîn Elî û hevalên wî bînine Parisê û îqameta yêk mehîjî wan ra bistînin. Şeva wan ya yêkê di Parisê da bû ku ji alîyê Doktor Qasimlo serokê partîyê ve di restoranteke Çînî Ii mintiqeya Parisê ya sêzdan da hatin mêhvankirin.

Elî mehekê li Parisê ma, lê piranîya wextê xwe di civînan da digel hevalan derbaz kir û herwisa digel kesên ku ji partîyê nerehet bûn û gilî û gazinde hebûn, temas girt û guh da gotin û xwastinên wan. Ewan civînan hindek tesîrên nebaş danîne ser Êlî.

Elî piştî mehekê vegerîya Kurdistanê û gihişte hevalên xwe yên Kurdistanê û wekî hercaran dest bi xebatê kir û paşê jî di kongreya heştan ya partîyê da beşdar bû, Iê mixabin ev kongreye di tarîxa partîyê da kongreyeke pîroz û serketî nebû. Çûnkî, partî bû du parçe û gerçî Elî bi parçebûnê razî nebû jî lê wî rêya xwe da dîyar kirin û alîyê “rêveberîya şoreşger” hilbijart. ÊIî dîsan bû endamê komîteya merkezî ya Partîya Demokrat - rêveberîya şoreşger û di wan şertên nexweş da jî vegerîya bakûra Kurdistana Îranê û dest bi xebatê kir.

Wê çaxê mixabin herdu parçeyên partîyê digel hev ketine şer. Elî şerê birakujîyê nedixwast û di mintiqeya ku ew têda, nehêla şer çêbe. Çûnkî, Elî ew şere bi zerara gelê Kurd û bi mafê dijminên Kurdan dizanî. Di axirîn nameyên Elî û temasên wî yên telefonê da ku piştî parçebûna partîyê jî, me danûstandin bi hev ra hebû, Elî ji wê rewşa nû ku hatibû pêş, razî nebû. Wê demê ku jin û zarokên Elî di Tirkîyê da nikarîn derkevin û biçin ewrupayê, ew bi mecbûrî ji bo çareserkirina rewşa nebaşe wan çû Tirkîyê. Lê mixabin jê ra davik danîn û şehîd kirin.

BeIê, eve bû jiyana xweşmêrekê ku hemû heyî û neyîya xwe ya şexsî, siyasî, zarok û

binemala xwe fedayî armancên gelê xwe kirin.

**Tahir Nexîn / Adar 1996**

# JI DEST DANA HEVALEKÎ TÊKOŞER

Xeberê ji dest dana Elî, bêşik yêk ji xeberên herî tahl bû di jîyana min da. Bawer kirina vê terora hov, bo min gelek kêşa. Çend sal ji ser şehîd bûna Elî derbaz bûne, Iê niha jî roj nîn e ku nişkêve rûyê wî yê têrken neyête peş çavên min û ez wî nebînim. Di demekî wisa da, bêyî kontrol diçime nav xatireyên çend salên berê yên hevaltîyê û ew demên pêkve hatine jîyan wekî filmekê yêk bi yêk ji ber çavên min derbaz dibin û ji xwe dipirsim; bo çi? û kî? û ev pirse wekî beraşan mejîyê min dihêrin.

Me hemûyan bi taybetî Elî, rêya xebatê ji bo xilas kirina neteweyê xwe bi zanahî hilbijartibû û mirin di wê rêyê da çu caran bo me biyanî nebû, Iê şehîd bûna Elî, em hemû hejandin, çûnkî neteweyê Kurd û hevalên Elî hewcetî bi mana wî hebûn. Elî çi di demên xortanîya xwe da, çi di demên xwandinê da ji min û xortên menteqê ra bibû nimûne. Elî, digel hemû zor û zehmetîyên ekonomîk, karî xwandina xwe di rêzên bilind da timam bike û di universiteyê da cih bigire. Ev xwe nişandanên Elî, bûne sebebê wê yêkê ku xortên menteqê bi xwe bihesin û dawîya demên tarî yên nexwandayîyê bînin…

Demê ku Elî di universiteyê da bû, tevî xebatên şoreşgerî bû, ku têkoşîna ji bo civateke demokratîk geştir bike. Piştî şoreşa 1979an ya Îranê, Elî xwandina xwe di cih da hêla û ji bo bidestanîna daxwazên gelê xwe çek hilda û kete pêşîya xortên Kurd yên dewera bakûra Kurdistanê ya li bindestê Îrane û gihişte nav rêzên Partîya Demokrat ya Kurdistanê. Elî, her ji destpêkê nîşan da , ku ew gencîneyeke ji bo partî û neteweyê xwe. Hebûna Elî di nav me da ji bo çêkirina komîteyên siyasî yên

Partîya Demokrat, arîkarîyeke mezin bû û rêya xebatê ji me ra hêsantir dikir. Elî ji bo berhev kirin û pêkanîna kadroyên siyasî û xebata rêxistinî ya di nav gel da, gelek xebat kir û ev wezîfeye hildabûn ser milê xwe.

Bîranîn û hevaltîyên salên 1980an heta 1985an tev EIî gelek in, lê ez nikarim hemûyan li vê derê bi cih bikim. Li tenê dikarim bêjim, ku Elî ji bo me çirayekî geş bû, ku rêya têkoşîna me ron dikir. Dan û standinên Elî yên mirovî û îradeya wî ya polayî di hemû rewşan da bibû sebebê wê hindê ku derîyên hemû mal û komelgehan bo wî vekirî bûn. Elî, digel xebatên xwe yên siyasî û rêxistinî, hergav li pêş hêzên Ieşkerî yên partîyê di bizavên leşkerî da û rûniştinên siayasî û mûgehîyên pêşmergeyan da beşdar dibû. Ji ber vê yêkê Elî, di nav pêşmerge, heval û hogirên

xwe da gelek xwudan rûmet bû. Min gelek rêvingîtî û xebat digel Êlî hebûn, lê ya dirêj ku gelek bi xatire bû, di sala 1981an da ye ku cm tevî grûpeke pênc kesî çûne polîtburoya ya partîyê daku pirsên navçeya xwe digel rêvebirîya partîyê biaxivin û dîsa vegerine cihê xwe.

Di destpêka adara 1981an da, di rojek ji rojên gerim û bihetav da, em bi hev ra ji gundê Howesinê ji bo alîyê menteqa Serdeştê bi rê ketin. Li ser mercên di bakûra Kurdistana Îranê da heyî û problemên ku  polîtburoya ji me ra pêk di anîn, em bi neçarî çar mehan li wê derê man. Wî demê em li wê derê diman, ez û Elî çu caran ji hev cuda nebûn û her em li bal hev man. Hevaltî, dostî û li hev nêzîkbûna mirovan, di demên wisa û seferên dirêj û îza da xûya dibe. Min, Elî di wan mercên weha yên tarî û tengasîyê da baştir nas kir û peymana hevaltîya digel wî bihêztir bû.

Taybetmendîyên ku EIî bi germî nîşan didan; muhbet, xweborîn û berxwedan bûn. Şêweya dan û standin nêzîk bûna zû ya Elî ya digel komelên xelkê Kurdistane, hergav bo min cihê rêzgirtinê bû. Ev hêza nepenî ya di dilê wî da bibû sebebê wê yêkê ku em Ii her alîyekî Kurdistanê bana jî, bi germî dihatin mêhvankirin. Piştî çend mehan, got û bêjên digel hevalên partîyê û li hêvîya biryarên wan mayînê jî çu encam neda, Min digel hevrêyan biryar da ku divê em vegerine menteqê.

Lê Elî, li vê derê jî nîşan da ku, îradeyeke polayî û bawerîyeke kûr bi got û bêjan heye û bi her cureyî em jî razî kirin ku li benda Dr. Qasimlo bimînin heta ku ew ji sefera Ewrupayê vegere. Ev biryara Elî ya bihevsele, bû sebebê guhurîneke mezin ku heyeteke polîtburoya bête menteqa me û destkevtên biqîmet jî bêne dest.

Bûyerên sala 1985an yên menteqê bûne sebebên hindek guhurînên cure cure û yêk ji wan jî ji hev cudabûna min û EIî bû. Lê min nûçceyên xebatên wî ji dûr ve dibihîstin. Elî ji sala 1985an heta roja şehîd bûna xwe her endamê komîteya merkezî ya Partîya

Demokrat bû û herweha berpirsiyarekî mezin yê pêşmergeyan û berpirsê navenda Agirîyê jî bû.

Demê ku ez ji Kurdistanê derketim, ji sala 1985an û pêve mixabin ku min û ÊIî hevdu nedît. Lê di sala 1989an da rojekê zenga telefonê Iêda û çawa min guhik hilda her guhê xwe, li milê dî dengê Mizefer bû û ji Parisê li min degerîya. Piştî axivtineke kurt got ku niha dê guhikê telefonê bidete hevalekê ka dê nas bike an ne! Piştî bihîstina deng, min li qêrînê da û got: “Elî tu yî? Ma dibe ku ez dengê te nas nekim!”

Di vê xeberdana dirêj da me halê hevdu pirsî û me gelek tişt anîn bîra hevûdu. Paşê jî me xatira xwe ji hev xwast. Bi axivtina wê telefonê em herdu jî gelek şa bibûn. Lê mixabin û hizar mixabin, ew axivtin temasa me ya dawîn bû. Ez dikarim bêjim ku, min hevalekî hêja û

xwudan rûmet ji dest da û cihê wî di nav me da vala ye. Lê ew her û her di dilê me da dijît. Rêz û siyanet bû bîranîna Elî!

**Têmûr Mûradî / Adar 1997**

# HEVRÊ ELÎ KAŞIFPÛR

Min û Elî carna wisa gazî hevdu dikir: Hevrê. Elî, hevalekî şoreşger û di nav endamên partîya demokrat' da jî hevaleki sosyalîst bû. Heta mirov dikare bêje ku, ew sosyalîstekî ortodoks bû. Wî, digel rizgarîya welatî, Kurdistaneke sosyalîst jî bo xwe

kiribû armanc. BeIêm digel vê bîr û bawerîya xwe, şertên şoreşa neteweyî jî ji bîr nedikirin û şertên civatê didan ber çavên xwe û goreyî wê xebata xwe didomand. Ji ber vê çendê jî rûmeta wî di nav pêşmerge û her baskên xelkê da gelekî bilind bû.

Ji xwe piranîya pêşmergeyan jî ji binemalên hejar dihatin, Iewma sempatîya pêşmergeya li beramberî wî di dereceya herî bilind da bû. Vêca ji ber ku bêjeya “hevrê” di literatura sosyalîstan da manayeke biqîmet hebû, me jî wisa gazî hevdu dikir; hevaltîya rêya têkoşînê ya bi bîr û bawerîyên sosyalîstî ve hatîye raçandin û nexşandin...

Hevrêyê têkoşer Elî Kaşifpûr, nêzîkî salekê bû ku Ii Trkîyê dijî. Li hêvîya qebûlîya penaberîya Rêxistina Koma Neteweya bû. Jin, zarok û dayîka wî jî li wê derê bûn û pêk ve diman... Êvareke heyva tebaxê (15-ê tebaxê 1990) sê kes, ku du ji wan bi cilikên polîsên Tirka bûne, derîyê Elî diqutin û dadikevin mala wî... Bê pirs û bersiv radikêşin û dibin.

Jin û zarokên wî hawarê dibin cîranên xwe, lê bêfayde ye... Roja paştir serê sipêdê li rexê rêya Konya û Ankarayê cendekê Elî tête dîtin... Êrişkeran çawa wê şevê biriban, her demildest şehît kiribûn... Şîn û girî û xemeke giran dikeve nav mal, zarok û cîranên Elî...

Xebera xemê zû belav dibe. Partîya Elî vî xeberê reş zû werdigre, Iê dikare çi bike!.. Birayê Elî yê jê biçuktir Kerîm jî, bilez ji Hollandê tête Tirkîyê û Ii ser şehît bûna Elî radiweste, derîyên resmî yên dewleta Tirkîyê diqute. Lê ew bizav jî bêfayde dimîne...

Li goreyî dewleta Tirkîyê ev cinayete ne aşkera ye. Çu bersiveke têrker û zelal nadine birayê Elî, Kerîm... Partîya Elî, nameyekê ji bo serokkomarê Tirkîyê Turgut Özal rêdike û jê dixwaze ku dewleta Tirkîyê vê cinayeta li ser axa Tirkîyê hatîye kirin, aşkera bike... Lê belê bersiva vê nameyê jî nayête dan û şehadeta hevrê Elî di çarçoveya fermî da “tarî” dimîne!..

Belêm ji alîyê binemala Elî, ji alîyê partîya Elî û ji alîyê dostên Elîyê hêja ve, şehadeta wî ne tarî ye, gelek û gelek ron û zelal e, aşkera ye weki ronahîya rojê. Baş tête zanîn ku rejîma islamî ya Îranê, ev kiryare bi hevkarîya ajanên Tirkîyê kirîye. Wan, hevalê têkoşer Elî Kaşifpûr şehît kirîye. Rejima Tirkîyê, ku dijmina gelê Kurd e, helbet naxwaze vê cinayeta

sîyasî, ku ji alîyê rejimeke dagîrkere wekî xwe, anku Îranê ve hatîye kirin, aşkera bibe. Ji ber ku destê wê jî têda ye. Heke ev kiryare aşkera bibe dê destê rejima Tirkîyê jî têda bête dîtin. Lewma naxwaze ev pirse bête aşkerakirin...

**Portreya Elî**

Elî Kaşifpûr, li sala 1957-ê li gundê Pîrancikê li navçeya Somayê, ku girêdayî bajêrê Urmîyê ye, di maleke destteng û rêncber da hatîye dinyayê. Elî xwandina xwe ya seretayî li gundên Howesin û Dozê, ya navînî jî li Urmîyê timam kirîye. Berî şoreşê jî li Zanîngeha Tebrîzê sosyolojî û paşê jî li Zanîngeha Tehranê hiqûqa polîtîk xwandîye...

Çawa şoreşa 1979ê destpêkir, hevrê Elî xwandina xwe ya bilind ji sinifa dawîyê berda û hat wekî pêşmergeyekî sade tevî şoreşê bû... Bi zîrekî, fedakarî û jîrîya xwe di nav rêzên şoreşê da wezîfeyên herî grîng û bilind wergirtin... Piştî peşmergetîyeke demkurt, bû serokê rêxistina PDK-Î li navçeya Somayê... Wî ev wezîfeya xwe bi serfirazî domand...

Di kongreya 5. ya PDK-Î da jî, bû endamê komîteya merkezî... Hevrê EIî ev wezîfeya xwe heta şehîtbûna xwe domand. Elî herweha yêk ji damezrênerên PDK-Î (rş) bû. Piştî kongreya 8, ya PDK-Î (tayê Dr. Qasimlo), Kek Elî digel refek hevalên xwe ji PDK-Î cuda bûn û PDK-Î (rş) ava kirin û bû endamê komîteya merkezî...

Hevrê Elî bi destûra partîyê li Tirkîyê bû û li hêvîya bersiva Rêxistina Koma Neteweya bû ku bibe penaber li welatekî Ewrupayê...

Piştî cuntaya leşkerî ya 12ê Îlona 1980ê li Tirkîyê, em bi refek hevalên xwe ve çûn Kurdistana îranê û Ii nik PDK-Î man. Demekî dirêj li navçeya ku kek EIî berpirsîyar bû, pêk ve jîyan... Kek Elî, heval û dostekî hêja yê me jî bû. Wî di timamî demê kar û xebata xwe ya şoreşgerî da piştevanîya me jî dikir. Di wî demî da kek Elî dilsozîya hevaltî û hevrêtîyê bi başî nîşan da...

EIî, hem di pêşmergetîya xwe da, hem jî di karê rêxistinî yê partîyê da nimûneyê cesaret, fedakarî û jîrîtîyê bû... Di şer da pêşmergeyekî bêtirs bû. Di karê rêxistinî da jî mirovekî zana bû. Di peywendîyên digel pêşmerge, xelk û kadroyên partîyê da jî gelekî nerm û bisebir bû... Bi qedir bû ji ber ku qedirê hevalê xwe dizanî... Bi rûmet bû ji ber ku di karê şoreşgerîyê da ji dil bû...

Sala 1980ê, rejîma islamî ya Îranê, wekî navçeya Somayê bombebaran kirî, di wê êrişê da kek Elî jî birîndar bû. Birîna wî giran jî bû. Lê partîyê ew bi hevkarîya peywendîyên xwe yên veşartî, rêkire bajêrê Urmîyê û di nexweşxaneyeke şexsî da hate saxkirin... Piştî em Emelîyateke giran dîsa bi ser xwe ve hat û zivirî ser kar û xebata xwe ya şoreşgerî...

Mixabin, vê carê dijmin bi awayekî nemerdane Elî şehît kir. Belê divê dijmin bizane ku şoreşa Kurdistanê bi kuştina Elîyan nayê sekinandin. Elîyek diçe, bi sedan Elî radibin li rêzên şoreşê radiwestin...

Elî, serê xwe ji bo Kurdistaneke serbixwe ye têr azadî, aştî û demokrasî da. Em li ber bîranîna birûmet ya hevrê Elîyê têkoşer, bi rêzdarî radiwestin. Xema binemala wî û partîya wî, xema xwe dizanin. Careke dî jî serxweşîyê didine binemal û partîya wî ya têkoşer...

**Rojan H.**

Kanun 1990

Not: Ev nivîsare, di hejmara 7. ya Hêza Welatparêz da bêimza hatibû weşandin. Bêlem min ew nivîsar ji bo vê pirtûkê ji nû ve amade kir û herweha jî hindek zêdehî û serastî lê kirin. Rojan.

**Rojnameya Hêza Welatparêz, hj. 7, Kanûn 1990, Danmark**

# NAMEYA CELÎL GADANÎ JI ÖZAL RA

Celîi Gadanî, sekreterê giştî yê PDK-Î (rş) bi navê polîtburoya partîyê, nameyekê ji bo Turgut Özal rêdike ku kuştina kek Elî Kaşifpûr bête aşkera kirin... Em vê nameyê, li jêr diweşînin...

**Birêz Turgut ÖzaI, serokkomarê Tirkîyê**

Bi bihîstina dengûbahsên dinyayê û teyîda meqamên dewleta Tirkîye, endamê komîteya navendî ya partîya me Elî Kaşifpûr, ji alîyê sê kesan ve, ku ihtimaleke xurt e ew girêdayî Komara Islamî ya Îranê ne, ji mala xwe li bajêrê Konyayê, şeva 15-ê tebaxê hatîye revandin û her wê şevê hatîye kuştin.

Hevalê me li bin Hîmayeta qanûnên dewleta we li Tirkîyê dima. Ji ber vê yêkê, ev cinayete hem dijî hakimîyeta dewleta Tirkîyê ye, hem jî dijî qanûn û peymanên navneteweyî ye... Heke dewleta Tirkîyê Ii hember vê kiryarê bêdeng bimîne wê çaxê dê firset ji bo kesên girêdayî rejima Islamî ya Îranê derkeve ku cinayetên dî jî bikin.

Em ji cenabê we, dawa dikin ku hem vê cinayetê mehkum bikin, hem jî yên ku ev cinayete kirî, bidin girtin û ceza kirin û ji encama vê yêkê jî, ji kerema xwe me agahdar bikin. Digel rêz û spasên me.

Bi navê buroya polîtik ya PDK-Î (RŞ)
**Celîl Gadanî**, sekreterê giştî

30. 8.1990

**Rojnameya Hêza Welalparêz, hj. 7, Kanûn 1990, Danmark**

# DEWLETA TIRKÎYÊ, BERSIVAV NAMEYA PDK-I (RŞ) NADE...

**Sekreterê PDK-Î (rş) CelîI Gadanî, ji ÖzaI ra name rêkir, ku kuştina Elî Kaşifpûr ron bike**

Tiştekî aşkera ye ku rejimên dijî şoreşa Kurdistanê her dem ji bilî êrişên giştî yên li ser gelê Kurd û Kurdistanê dikin, şerkerên hêja û egît yên şoreşa Kurdistanê jî yêk bi yêk û bi awayên nemerdane dikujin... Eve demekî dirêj e ku rejima lslamî ya Îranê van kara dike... 1988-ê li Qibrisê li bajêrê Larnakayê endamekî komîteya navendî ya Komela Îranê şehît kirin... Par jî meha tîrmehê li Avusturyayê serokê PDK-Î Dr. E. Rahman Qasimlo digel du hevalên wî, di kombûneke hevdîtênê da şehît kirin... Isal jî di 15-ê meha tebaxê da Ii Tirkîyê endamê komîteya navendî ya PDK-Î (rş) EIî Kaşifpûr şehît kirin...

Ji ser ve mehek borî neborî, di meha îlonê da, vê carê li Swêdê li bajêrê Vesterosê, kiça Qazî Mihemedê serokkomarê Komara Kurdistanê ya Mahabadê, Efat Qazî, hevjîna Emîr Qazî, ku serokê Partîya Serxwebûna Kurdistanê ye, bi pakêteke bombeyî şehît kirin. Ev hemû cinayetên hov bi awayên terorî hatin kirin... Wekî kes yên ku van cinayeta dikin hêj nehatine girtin, lê belê dews û hêza Ii pişt van kiryara wekî ronahîya rojê xûya ye...

Rejîm, cinayeta gelek bi hostahî û awayên profesyonel dike... Helbet, ev awayên terorî qelsîya rejîmê nîşan didin. Rejim nikare şoreşa gelê Kurd rawestîne. Lewma jî bi awayên terorê serok, rêvebir û kadroyên bijare yên şoreşê dikuje... Belê vêca ev metode bêkêr in. Çu faydeyê tirsê ji ecelê ra nîn e.

Dijmin ji şoreşa gelê kurd ditirse, nikare rûberûyî gelê kurd bibe, lewma van êrişên nemerdî bi kar tîne... Helbet şehîtbûna yêk bi yêk kadroyên Kurd bi destê dijmin, windabûneke mezin e, lê belê şoreşa Kurdistanê ji alîyê kadro û şerkerên egît ve çu cara kêmasîyê nakêşe. Dijmin, divê vê çendê baş bizane...

**Rojnameya Hêza Welatparêz, hj. 7, Kanûn 1990, Danmark**

BIRA 2

# DAXUYANÎYÊN PDK-Î (RŞ)

# BÎRANÎNA HEVALÊ ŞEHÎD ELÎ KAŞIFPÛR

**Komîsyona Weşana Partîya Demokrata Kurdistana Îranê - Rêveberîya Şoreşger**
**Tebax 1990**

**Ragihandina polîtburoya**

Ji bo şehîdbûna kek Elî Kaşifpûr, endamê komîteya navendî, ku bi destê kirêgirtîyên Komara Islamî ve hat şehît kirin.

Hevwelatîyên birêz. Xelkê xebatkar yê Kurdistanê. Kadir û pêşmergeyên mêrxas yên Partîyê. Em bi mixabin û keserekî giran radigihînin ku Ii nîveşeva bîst û çarê vê mehê hevalê têkoşer kek Elî Kaşifpûr, endamê komîteya navendî, li ser rêya bajêrê Konya - Ankarayê li Tirkîyê, pê destê çend kes ji teroristên Komara Islamî ya Îranê ve hate şehîd kirin. Heval Elî Kaşifpûr, di sala 1336a hetavî (1957a zayînî) li gundê Pîrancixê, ser bi bajêrê Urmyê ve ji binemaleke zehmetkêş ji dayîk bû. Kek Elî xwandina xwe ya destpêkê li gundê Howesinê û ya navînî li bajêrê Urmîyê xilas kir. Paşê çû zanistgehê û di wê derê da biranşa hiquqa polîtîk xwand. Di mehên pêş şoreşê û serhildana xelkê Îranê ya dijî rejima Şahîtîyê da, kek Elî dest bi têkoşîna xwe ya sîyaset kir û gava şoreşa gelên Îranê di sala 1979a zayînî da (1357a hetavî) serket, heval Elî Kaşifpûr ku danişcûyê (xwandekar) sala dawîyê yê hiquqa polîtîk li Tehranê bû, xwandina xwe di cih da hêla û ji bû ku di bizava neteweyî û demokratîk ya gelê Kurd di Kurdistana Îranê da beşdar be, vegerya gundê xwe û piştî demekê hate nav rêzên partîyê.

Bîr û bawerîya kûr ya kek EIî û daxwazên gelê Kurd Ii Kurdistana Îranê, bûn sebebê wê hindê ku kek EIî bibe yek ji kadirên jêhatî yê Partîya Demokrata Kurdistana Îranê. Sedaqet û dilsojî û îmana kek Elî, bi armancên wî bûne sebebê wê hindê ku ew bibe endamê komîteya navîn û heta pêkhatina pêvîste Rêveberîya şoreşger.

Sê cara bû endamê komîteya navîn, û li bizawê tarîxî ya 1988an da, ew yek ji pazdeh rêberên partîyê bû ku agahdarîya deh xalî imza kir. Heval Elî Kaşifpûr, temamî salên xebat û têkoşîna xwe ya di nav rêzên partîyê da, çi wan salên ku endamê komîteya navîn bû û çi pêş ku bibe endamê komîteya navîn, li dijî wan kesan bû ku dixwastin rêya raste Partîyê navhev bidin, beramberî wan radiwesta û di her dem û şertên dijwar da bergirîya partî û armancên wê dikir.

Heval Elî Kaşifpûr, sala borî ji bo bi cih kirina hindek karên partîyê ku li alîyê rêveberîyê ve jê ra hatibû diyar kirin, vegerya bakûra Kurdistanê û her wisa hatin û çûna wî bo Tirkîyê jî, ji bo wan kara bû ku rêveberîyê sparti bû wî.

Kek Elî Kaşifpûr, endamê binemaleke zehmetkeşe gundî bû. Ji nêzîk ve digel zehmet û êşên komela zehmetkêş aşina bû û bi timî dost û alîkarê mafê revaye wan bû, her ji bo wê hindê dixebitî û dost û alîgirê mafê neteweyî yê vê cunê bû û daxwazên wan diparastin û berevanîya wan dikir.

Heta di encamê da, pê destê qirêje hindek ji teroristên xulamokên rejîma Îranê ve hate şehîdkirin û dilê bi daxwaza rizgarîyê ya xelkê sitem lê kiriye Kurd û zehmetkêşên welat ve tijî, rawesta.

Hevwelatiyên hêja! Xelkê xebatkare Kurdistanê! Kadir û pêşmegeyên gernase partîyê. Eve cara yêkê nîn e ku cinayetkarên mêjoke rejîma Komara Islamî, hemû yasayên navneteweyî pêpes dikin û cinayetên ha yên tirsonek dikin. Di çend salên derbasbûyî da gelek endamên opozisyona Iranê û şexsîyetên siyasî yên dijî rejîma Komara lslamî, pê destên teroristên vê rejîmê hatin şehîd kirin.

Teror kirina heval Elî Kaşifpûr, ne yekemîn iqdama cinayetkarane ye, ku ji alîyê dest û hevpeywendên rejîma dijî insanî ya Komara Islamî ve tête encamdan cinayetê yekê û ne jî axirîn iqdam dibe.

Lê belê, mixabin em dikarin bêjin heta niha ev dewletên iddia dikin û dibêjin em alîgirê mafê mirovan in, di beramberî van cinayetê savnak yê ku ji alîyê mêrkujên bin destê rejîmê û pê destûrên cinayetkare desthilatdarên Îranê ve têne kirin, bêdeng mane û bi vî cureyî ji bo axundên xwûnxwar û destperwerdeyên mirovkuje vê rejîmê, rê xweşkirine ku dirêjîyê bidine karên xwe yên dijî insanî.

polîtburoya Partîya Demokrata Kurdistana Îranê, xeyn ji derbirîna kul û keserên xwe di beramberî teror kirina bêbextî ya heval Elî Kaşifpûr da, serxweşîya xwe dibêje

binemala wî şehîdê serbilind û li hemû komelên xelkên Kurdistanê, bi taybet zehmetkêşên navçeya Soma û gundîyên Howesinê, li hemû komelên siyasî yên Îranê û

miletan, Koma azahîya (efuya) navneteweyî, komîteya navneteweyî ya Xaça Sor û komîteya bergirîya mafê mirov ya ser bi neteweyên hevgirtî, dixwaze ku vê kiryara cinayetkarane ya rejîma Komara Islamî bi tundî mehkûm bikin. Kurdistanê û timê sazumanê beşerdostên navneteweyî, bi taybet ji koma navneteweyî ya

Herwisa polît buroya me ji dewleta Tirkiyê, ku wekî dewletên dî yên cihanê agahdarîya mafê mirov imza kirîye, dixwazin ji bo girtin û cezadana amilên vê cinayet savnak bi ciddî iqdamê bike.

Rêz bo bîra heval Elî Kaşifpûr, endamê komîteya navendî ya Partîya Demokrata Kurdistana Îrane. Mirin û neman bo rejima cinayetkar ya Komara Îslamî.

**polîtburoya  Partîya Demokrata Kurdistana Îranê - rêveberîya şoreşger.**
**69-5-28 / 18.08.1990**

# AXIVTINA KEK CELÎL GADANÎ, DI MERASIMA BÎRANÎNA ŞEHÎD ELÎ KAŞIFPÛR DA

Di gel silavên germ û xêrhatina we ya germ, mêhvanên hêja, hevrêyên xoşevîst, xwûşk û birayên ezîz.

Di her danekê (feslek) û di her salekê da şoreş netirstirîn û wefadartirin xortên xwe gorî azadîya serfiraz kirina miletê xwe dike. Di meha gelavêjê da du Iawên partîya me, kek Elî Kaşifpûr û Kamiran ŞêxiIisIamî, du Iawên biemeke gel, du lawên xweborî û fedakar di rêya azadîya welat û serfiraz kirina gelê xwe da serê xwe feda kirin.

Herduk sengerên xebatê bûn; yêk di qada şer da rû bi rû dijî Ieşkerên kevnepereste Komara Islamî, li nav axa welat, hevalê me yê dine têkoşer kek Elî Kaşifpûr, di demê birêvebirina memurîyetê li ser axa Tirkîyê pê destê terorîstên Komara Islamî hate şehîd kirin.

Kek EIî yazdeh salan xebitî, ji bo hindê bel ku miletê wî serkeve. Kek Elî wefadar û emekdarê Partîya Demokrata Kurdistana Îranê bû ku bi hemû wicuda xwe hêvîdarîya demokrasîya rastîn ya nav civatê di kir birastî ew newestîya û şev û roj û wext û bêwext hizra wî da bû ku çawan baştir bi kare erkê ku partîyê spartî bûye, bîne cih. Di dirêjîya yazdeh salên xebata nav rêzên Partîya Demokrata Kurdistana Îranê da, ji bo Iehzekê jî terdîd û du dilî nehatine ber dilê wî.

Kek Elî berewankerekî rastîye sîyaseta partîya xwe bû, di her demekê û di beramberî her kesekê da, ku kêmtirîn inhiraf di nav xetê partîya da, mêrane radiwesta, bitaybet netirsîya wî di wê derfetê da der ket ku xwe da alîyê rêveberîya şoreşger û xetê xwe, da xuya kirin. Kek Elî dikarî wekî gelekan ku partî alîyek dî ve birin, bimîne û ser wê hindê jî gelek pêşniyar jê hatine kirin, Iê çu caran berjewenbî û sûda gelê xwe fedayî berjewendûya xwe ya şexsî ne kir û mêrane têkoşa û hewil da û her wekî niha ku hûn di bînin heta axirîn lehza jiyanê bi rêbaza partîya me wefadar ma.
Kek Elî di gel wê hindê ku bo miletê xwe mafê çarenûs dixwast û di hemû çalakîyên

xwe yê sîyasî da hewil di da ku siloganên partîyê tev menayên xwe yên rast hevbigrin. Dostê zehmetkêşan bû û bergirîya mafên zehmetkêşan bi bû sebebên hindê ku gelek caran ji alîyê derebegên bakûrê (bakûra Kurdistana Îranê) tiris lêdan û hate tehdît kirin û davik jê ra danîn. Lê belê, ew çu caran amade nebû ji bo lehzekê jî mafê bindestekî bi de zordarekê yan jî derebegekê.

Sebra kek Elî di demên cur be cure xebatê da, bitaybetî şertên pir alozî û tevlîhevîya bakûra Kurdistana Îranê, gelek caran tev fitne û pilanên gelek tund rû bi rû bû lê her tim pê kiryarên xwe yên xweşik û bi dîtina xwe ya rast pilan pûç dikirin û birastî heq dida heqdaran.

Kek Elî di alîyê siyaseta cîhanî da, emperyalîzm dijminê neteweyê Kurd û hemû bindestên cîhanê dizanî, ku ev dijmine çu caran nikare tev van aştîyê bike û di beramberî itiqad û bîr û bawerîya kûre ku bi sosyalîzmê hebû û wisa dizanî, ku birastî tenê sosyalîzm dikare hemû bindestan, birsîyan, hejaran û bêwaran ji bo hemîşe necat û rizgar ke. Kek Elî xweyîyê exlaqekî şoreşgerane yê bitewawê mana bû, hevrêyekî rast û qatiê di cihê xwe da bû, digel her cure xwenîşandanekî borjuwazî û borjuwazîyê biçûk û her cure dem û dan û standinekê, her cure rêya û tezwîr û tezahureke mixalif bû.

Kek Elî endamekî emeknase partîya me bû, di gel vê hindê da jî ku çend caran bû endamê rêveberîyê, hergiz ji bû Iehzekê jî xwe berze nekir. Di her endaze berpirsiyarîya ku di kete ser milên wî da, zêdetir ihsasa mesûlîyetê dikir û bi wî awayî telaş û koşişa xwe di bire serî. Kek Elî, serketin di tekoşîn û xebatê da di dît. Kek Elî dostê wan hemû xortên wefadare partîyê bû ku bi dil û can di rêya gihîştin bi armanca partîya xwe da têdikoşîn.

Kek Elî, ji bo hêza gel, bi yêkitî û biratîya di nav komela Kurdîtîyê da ya here erziş qayîl dibû. Ji bo vê, dijî her cure dijayetîya nerast û ne reva û nementiqî bû û zor ji bo yêk dest bûna partîyê û ji hev nêzîkbûna partîya me, digel partî û komelên dî hewil di da û hewil da.

Sercema wê karakter û şexsîyeta kek Elî bû, ku karî bû wî di nav civata bakûra Kurdistanê da yêk car zor xoşevîst bi ke û birastî xelkê bakûra rojhilat Kurdistanê pir bi dil hez lê di kir û her wisa nav rêzên partîyê da jî di her cihekê ku karek biba û karbikira, zor zû cihê xwe vedikir. Hemû hevrêyên partîyê hez Iê di kirin û ser wê hez

lê kirinê jî, jê ra gelek elaqe nîşan di dan. Ji alîyê dî ve, ev sercema karakterê ku me bas lê kir û ev kar û kiryarên sadiqane ku kek Elî xwe nîşan da bûn, evana hemû bi bûne sebebê wê ku zordarên navçeyê, xulamokên bêmejî yên rejimê, dijayetîyeke taybetî dijî wî bi kin.

Gelek caran ji bo navbirin û şehîd kirina wî her di Kurdistana me da pilan û desîse hatine danîn, lê wî bi zanabûna xwe û hevrêyên xwe, ew pûç kirin û di nehayetê da rejîma kevneperest ya Komara Islamî di roja 24ê gelavêjê (15 tebaxê) da derfet peyda kir û bi şêweyeke gelek ne ciwanmerdane pê cil û bergên memurên hikumeta Tirkîyê, di çine jor û digirin û di bin, roja paştir bi mixabin cenazeyê wî tê te dîtin.

Rejimê jo bo gelek saziman û komeleyên dî jî nexşe û plan hebûn û hene. Ji bo partîya me jî demekê xerîkê pilan çêkirinê bû û hindek ji wan pilana, partîya me keşif kirin û hindek ji wan kesan ku memurê birêvebirina wan memurîyetan bûn, hatine nas kirin û mehkeme û ceza kirin. Ez hêvîdar im ku bi xebata hevrêyan, rojekê ev cinayetkarane jî dê bêne nas kirin û dê bigihine cezayên kiriyarên cinayetkarane yên xwe. Rejima kevneperest ya Komara Islamî, we di hizire ku pê navbirin û teror kirina gelek dirindane, wan hevalana dê bikare netirsîya şoreşgeran bîne xarê û îman û bîr û bawerîya wan jar bike. Lê belê dijmin gelek şaş e. Her yêk ji wan cinayetan ne tenê şicaeta pola ya gelê Kurd û xebatkerê meydana îroyîne têkoşînê nayîne xwarê, belke hurmeta wan pitir û pitirtir dike û wadar dike ku bi hisabeke zêdetir ji bo milmilanîya dijmin amade bin.

Di rastîyê da wan planane nexşekî girîng hene ji bû aşkera kirina gelektire mahîyeta çepele vê rejîm û di bin sebebê vê hindê ku rejîm ji alîyê raya giştî cihanî û efkara umumî ve terorîstperwer tête zanîn.

Bênas kirin û di esas da evana nîşanên taybetîyên rejîmê ne. Rejimeke ku dest li ser her cure imkanekê danîye û di ixtiyarê da ye û rejîmeke ku heşt sale tev dewleta Îraqê şer kirîye û yazdeh sale jî dijî hêzên xebatgere Îranê şer dike, vî şerî di Kurdistanê da rengeke dî yê taybetî hebû û heye û di vê pênavê da bi dehan hezar li qirêjxwarê xwe ji dest daye û ser vê hindê re jî, dest dibe hindek kiryarên ne ciwanmêrane û terorîstî û terorîzim kirîye yêkek ji şîvên zor adî û memulî yên siyaseta xwe ya rojane.

Eve xwe nîşana wê hindê ye ku vê rejîmê digel wê jî ku kuştin û birîneke aşkera xwe neparastîye û her di sala borî da hezaran law û têkoşerên Kurdistanê û Îranê û

hezaran insanê zehmetkêş û helandî bi hêceta dexalet di sîyaset û dijayetî digel rejîmê, di zîndan li navbirîye heta di wê firseta kêm da ku ji bo wan destketîye, ji bo terora şexsîyetên siyasî yên partîyan û sazimanan, xwe neparastîye û eve nîşana riswayî ya herçi zêde ya vê rejîmê û nîşana vê hindê ye ku ev rejîme hilweşandina xwe bi aşkera dibîne, bê itibar bûna roj bi roj zêdetir bi aşkera ihsas dike, ihsas dike, ber wê ye ku rehmê sexîr û kebîra nake û bi dîtina wan mirin ji bo her şoreşgerekê wezîfeyeke dînî tê hesabê.

Xûya ye ev kesên ku hanekî kevneperest û dirinde bin, bêşik nikarin ji vê zêdetir umîd bi man û beqaya xwe bi bin. Kek Elî û yên wekî wî her di roja yekim ku hatine meydana xebatê, xwe ji bo wê hindê amade kirine ku di beramberî her planekê da, her kevneperestîyekê da, her zordarekê da xwe piçûk neken û di rêya rizgarîya gelê xwe da bi sexavet canê xwe pêşkêş biken. Hemû insanên şoreşger, têkoşer û fedakar, hemû şoreşgerên rastî bi mirin di rêya armanca xwe ya pîroz da iftixarê dikin.

Kek Elîyê me jî gihîşte iftixara xwe, nîşan da ku bi çi şêwan û di çi şertan da ji bo lehzekê bêhina xwe veneda û heta axirîn Iehzê jî bi guman bi xebata xwe ya fikrî, bi xebata xwe ya teblîxî, di her firsetekê da jî bo vî her wekî wê ye di rneydana şer da beramberî hêza dijmin çi deman ji xweşmêrtirîn pêşmergeyan paratir nebû. Wê derê da jî gelek mêrane şehîd bû,

xûya ye şehîdbûna her hevalekê, her rêyeke azadîyê û serbestîyê wezîfa me ye bi hev ra pê hevbîr û bo çûnekê li hev bicivin, zêdetir dike. Bi wê wateyê ku em divê cihê xalîye wan hevalan bi hêz kirina bîr û bawerîya xwe, bi têkoşîna zêdetire xwe pir biken. Herwisa heta niha, hatîye nîşan dan çeka wî hevalî nakeve erdê, bîr û bawerîya vî hevalî namire û roj bi roj zêdetir geş dibe, em jî divêt wezîfa wî hevrêyê xwe yê şehîd, birêve bibin û hetanî axirîn lehza jiyanê rêvingê rêya pir iftixare wan bin.

Mêhvanên hêja, hevalên xoşevîst, ez dixwazim ji vê firsetê istifadeyê werbigrim u erzî xizmeta we bikim ku rewşekî aloz di navçeyê da pêkhatîye.

Ajawe ketîye timamîya dewerê hevsengîya siyasî ya rojê bi tundî xerîke bête guhartin, her di wan alûgorane da, me dît Komara Islamî bi şêwekî çavenerêkirî, ser qewlê wan xwe salên borî da gihîştine pîrozî û serkevtineke mezin û herwisa tê te pêşbînî kirin di netîce da wan awansên ku vê dawîyê de wergirtine û bi destve anîne, ji caran dirindetir êrişê bi kete ser hevrêyan di derve û zor, ji bo wê ez pêvîst dizanim ji hemû hevrêyan

bixwazim ji hemû heval û xebatgerên derveyî welat bête xwastin ku ji hemû deman pitir hişyar bin, ku nebine gorî armancên pintûye ser bi rejîma Komara Islamî, bi taybetî di vê firsetê da erzî we hevalan bikim, ku menfeet ji bo hindek ji dewletan, hindek ji hukumdarên wan welatane li ser hemû tiştekî din ve ye.

Gelek caran pîvan (qiyas) wisa têne rakirin û danîn ku xwûna insana di hisab û kitabên wan da çu nirxek namîne, heta niha bi dehan kes ji têkoşeranên partîyan û sazimanan û komeleyan hatine teror kirin, gelek ji wan bi medrekên gelek ron hatine derxistin û ron kirin ku amilên birêvebirina wan teroran e, bi gotina karbidestên bi nav dîplomatên Komara Îslamî ne, lê heta niha ji bo Iehzekê jî biryarekî tund nehatîye girtin. Ji bo careke din serxweşîyê li hemû kadir û pêşmergeyên Partîya Demokrata Kurdistanê dikim û sipas hevderdî û bi gazî hatina we hevrêyên xoşevîst û xebatkarên meydana îroyîne xebatê dikim û hêvîdarim rêya wan şehîdan ya serbilind, çu caran winda nakin û bi rê û rêbaza wan hetanî axirîn nefes û axirîn dilopa xwûna karwanê xebata xwe, her bi nêzîk bûna her çi zêdetir ji armancên xwe nêzîk bin û hidayet kin.

Bîrariîna Elî û hemû şehîdên serbilind yên gel û şehîdên rêya rizgarîyê pîroz be û rêya wan pir rêvî be. Sipas dikim.

## BIRA 3

# MESAJÊN PARTÎ, RÊXISTIN Û KESÊN SÎYASÎ

# BIRÊZ POLÎTBUROYA PARTÎYA DEMOKRATA KURDISTANA ÎRANÊ - RÊVEBERÎYA ŞOREŞGER

Digel rêz û silavan.

Bi mixabinî me xebera terora ne cewanmerdane ya kek Elî Kaşifpûr, endamê komîteya navendîya Partîya Demokrat ya Kurdistana Îranê, pê destê cinayetkarên Komara Islamî, bihîst. Em vê kiryara dijî insanî bi tundî (tujî) şermizar dikin û ji bo vê hindê em hevderdîya xwe digel we yên bi hurmet derdi birin. Carek din silav.

**Komîteya navendîya Komela Kurdistanê Partîya Komunîsta Îranê (Komele)**

**69-05-29 / 19.08.1990**

# HEVALÊN POLÎTBUROYA YA PARTÎYA DEMOKRAT YA KURDISTANA ÎRANÊ - RÊVEBERÎYA ŞOREŞGER

Silavên me yên rastîn qebûl bikin. Xebera terora cinayetkarane ya hevalê şoreşger kek Elî Kaşifpûr, ji alîyê terorîstên Komara lslamî, em ji kûrahîya dil xemgîn kirin.

Eger çi serokên Komara Islamî pê çêkirina kiryarên cinayetkarane dixebitin ku ser opozisyona şoreşger, perdeya tirs û wehşetê hakim bikin, lê ya rast ev e ku ew pê van kiryaran herwisa perîşanîya xwe, li beramberî opozisyonê nîşan didin.

Bêşek ev terorên ha, ne tenê nikarin kêmasîyekê Ii ser xwastin û têkoşîna opozisyona şoreşger ji bo navbirina rejîma Komara Islamî hebin, belkî me ji bo bi cih anîna vî emrê şoreşger ji berê tundtir û rijdtir dike.

Em ji bo teror kirina nacewanmerdane ya kek Elî Kaşifpûr serxweşîyê dibêjine we û temamîya endam û pêşmergeyên Partîya Demokrata Kurdistana Îranê - rêveberîya şoreşger.

Ji alîyê komîteya navendî ya Sazimana Çirîkên Fedayî yên Xelkê Îranê.

**69-6-1 / 22.08.1990**

# JI “NEBERDÊ XELK” - HEJMAR 74 YA SAZIMANA ÇIRÎKÊN FEDAYÎ YÊN XELKÊ IRANÊ

Di demê şevê, dawîya seetên roja 24 meha Mordada 69 an da, du kes ji xulamên teroristên rejîma Xumeynî pê cil û bergên polisê Tirkîyê û kesekî din pê ciIên sivîl diçine cihê runiştina malbata kek Elî Kaşifpûr li bajêrê Konya li Tirkîyê û bi zorî wî dibin û teror dikin.

Kek Elî Kaşifpûr ji bo hevkarîya mabata xwe çû bû Tirkîye û ji alîyê teroristan ve hate terror kirin. Endamê komîteya navedî ya Partîya Demokrat ya Kurdistana Îranê - rêveberîya şoreşger bû û wî jî ragihandina yêkan ya rêveberîya şoreşger, imza kiri bû.

Em tevî şermizar kirina vê terora howane û nemana kek Elî Kaşifpûr, serxweşîyê dibêjine Partîya Demokrata Kurdistana Îranê - rêveberîya şoreşger û binemal û kes û karên kek Elî Kaşifpûr.

# BI NAVÊ XWUDAYÊ BEXŞENDE Û MIHRIBAN

**Bi hurmet, birayên polîtburoya Partîya Demokrata Kurdistana Îranê - rêveberîya şoreşger.**

Tevî silavên şoreşgerî, daxwaza me serketina bizava reva ya gelê Kurd e. Eve cara çendan e ku destên gemare teroristên rejîma xetakare melayan pê xwûna pake lawên din yên xebatgerê Kurd sor dibe û movikên kevneperest yên tûre û diIreşe rejîma Islamî, planekî dîtire nû dijî azadîxwazên zana wek Elî Kaşifpûr hate şehîdkirin. Em jî piştî mehkûm kirina vê kiryara pintûye dijî insanî, serxweşîya xwe pêşkêşî hemû kes û karên wî şehîdî û we yên bi hurmet û hemû kadir û endam û pêşmergeyên “PDKÎ.-RŞ” dikin û di xem û keserên we da beşdar in.

Teroristên krêgirtî û amilên dem û dezgehên axundî (melayan), divê bizanin ku ev şêwe kiryarên dijî insanî yên wan nabin sebebê wê hindê ku xebata dijî bê ser û çavî û sitem û zordarî ji kar bikevin, belkî agirê gur û tureyîya azadîxwazan bi tintir dike û xwûna geşe şehidan dibe hêzekî dîtir ku di nav demarên şoreşger û bizava rizgar kirina Kurdistanê da.

Bi hêvîya vê hindê ku tamamê xem û şîn (matem) kek Elî Kaşifpûr yê bi be serekanîya xebata bêwestîyana hevsengerên wî û ronahîyê bi de têkoşîna berdewam û cihê wî yê xalî pir bike.

polîtburoya Sazimana Xebat şoreşger ya Kurdistana Îranê.

**69-6-1 /22.8.1990**

# JI BO POLITBUROYA KOMÎTEYA NAVENDÎ YA PDKI-RŞ

Digel silavên şoreşgerane. Nameya we ya tarîxa 69-5-31 (21 Tebax 1990)an ku di bara terora ne ciwanmerdane ya kek EIî Kaşifpûr endamê komîteya navendî partîya we, duhûnê 69-6-1 (22 Tebax 1990)an me wergirt. Tevî nîşan dana tenefirekî kûr ji wê cinayeta rejîma Islamî û serxweşî gotin û hevderdî kirin tev we û her wisa binemala kek Elî û ji we daxwaz dikin ku zêdetir ji bo wê hindê  ku rejîma qirêj û xirabe Islamî nikare ji gelê gernase Kurd zêdetir şehîdan bistîne.

Ji ber ku merasim di polîtburoya we da, di tarîxa 69-6-2 (23 Tebax 1990)an da pêk têt, mixabin ku bi sebebê tengavbûna demê, em nikarin di wê rê û resmê da beşdar bin û em ji we lê borînê dixwazin.

Sipas ji bo vexwandina we û careke dî silav.

Partîya Rêncberan ya Îranê

Komîteya Kurdistanê 69 - 6 - 2 (23 Tebax 1990)

# BO BUROYA POLÎTBUROYA PDKÎ-RŞ

Di gel silavên şoreşgerane, xebera teror kirina kek Elî Kaşifpûr min ji radyoya BBC bihîst.

Şehîdbûna kadirê xûyaye Partîya Demokrat, cihê kul û keseran e. Rejîma paşvemayî û xwûnrêj ya melayan dîsan cinayeteke mezin xuliqand û destên xwe yên çepel bi xwûna xebatgerekî Kurd sor kirin. Lê belê gelê Kurd pê wan rû davane (qewimînan) ser daxwazên xwe yên reva tûjtir di be û dirêjiyê dide xebata xwe hetanî pîrozîyê.

Ji bo wê rûdava bikeser, ez serxweşîya xwe di dime Partîya Demokrata Kurdistana Îranê - Rêveberîya Şoreşger û we pêşmergeyên bi hurmet yên gernas û binemala wî şehîdî.

Ruhê wî şa û gelê Kurd xweş be.

**Seyid Izedîn Husênî**
69 - 5 - 29 / 19 - 8 - 90

# BIRÊZ POLÎTBUROYA PDKÎ-RŞ

Tevî silavekî germe birayane. Xeberên terora kek Elî Kaşifpûr bi keser û dilsoj bû. Ez ji kûrahîya dil ve serxweşîyê di bêjime we û hemû kadir û endamên partîya we. Ez xwe şirîkê xem û şîna we dizanim. Ez bawer di kim ev kiryarên karbidestên Komara Islamî ne tenê qîrîna şoreşgerane ya gelê Kurd û gurîya xebata me ya rewa kêm nake,belku nîşanên Iawazî û zebûnîya dijminên şoreşa Kurdistanê ye.

Tola wan hemû xwûnên ku bûne sebebê geş kirina şoreş û zêde kirina gurîyên wî agiri ku hezarên mîna kek Elî hatîye hil kirin, direng yan zû lê belê hetmen gurîya wî agirî dê can û Ieşê dagîrkeran û text û bextê wan bike rijî.

Bilind û bihurmet be bîra kek Elî Kaşifpûr. Herbijîn ji bo birayên xwe.

**Umer Êlxanî**
13. 06. 69 / 05. 09. 1990

# PEYAMA SAZIMANA KURDISTANÊ YA PARTÎYA

Birayên”PDKÎ-RŞ”, beşdarên hêja yên di wê rê û resmê da. Em terora cinayetkarane ya kek Elî Kaşifpûr, endamê komîteya navenî ya “PDKÎ-RŞ” pê destên kirêgirîyên Komara Islamî şemizar dikin. Her ji bo vê bûnê ji alîyê komîteya navendî ya Komelê û hemû pêşmergeyên Komelê hevderdîyê û serxweşîya xwe pêşkêşî komîteya navendî ya Partîya Demokrata Kurdistanê û malbat û kes û karên kek Elî û herwisa peşmergeyên Partîyê dikin û xwe pişkdarê xema we dizanin.

Xûya ye ev kiryare, li ber çavê her insanekî  xweyî şeref û azadîxwaz karekî mehkûm e, ku rejîm dixwaze dest hilata xwe ya çepel û dijî insanî pê teror û reşekujî û idama rabigre. Pê hukmê şerê cûnatî û tund yê civata karker û zehmetkêş, hukumdarîya kapîtalîst şêve û dijî insanî, şêve di encamê da ye bi gor kirin û ser kavlên vê nîzama genî, nizama dirindane ya ji her cure teror, reşekujî, idam, zindan, îşkence û zulim û istismarekê dûr ve bête avakirin, eve hukmê tarîxê ye ev cure rejîmane direng yan zû diçine kirsdanka tarîxê û eva cara yêkê nîne ku Komara Islamî terorîstên xwe li derveyî welat bi kar tîne û her wisa cara axirê jî nîn e.

Komara Islamî di yazdeh salên hukumdarîya xwe ya reş û kevneperest da, ji çi cinayetekî di beramberî mixalifên xwe da dest neparstîye û daxwaza serkut kirin û çaw tirsandina komeleyên milyonî yên xelkê, dirêjîyê di de vî karê xwe. Em bi bawerî ne ku civata xelkê pê kerib û kînekî zêde ve ji bo nav birin û şkest dana siyaseta dijî insanîyê tê bikoşîn. Em  ji nîşan dana wêzarî û kerbên xwe ji vê kiryara dijî beşerî ya Komara Islamî, hemû insanekî şerif û azadîxwaz ji wan welatanê ku niha xebatkar û hêzên siyasî yên Îranê tê da dijîn, gazî dikin ku rê nedine meydana hatin û çûnê plangêre terorîstên Komara Islamî ji alîyên hukumetên wan welatane ku tê bigehin

Û dengê itiraza xwe li dijî her cure sistî û çavpoşînek ku bi her hêncetek ji alîyên wan dewletan ji Komara Islamî ra tê te kirin, bilind bikin û bixwazin ku terorîst bê ne peydakirin û cezakirin.

Careke din em serxweşîya xwe li komîteya navendî ya “PDKI-RŞ” û hemû pêşmergeyên partîyê û keş û karên kek Elî Kaşifpûr dikin.

Mirin û neman ji bo Komara Islamî.

Bijî bizava şoreşger ya gelê Kurd.

# HEVAL Û DOSTÊN KOMÎTEYA NAVENDÎ YA PDKÎ (RŞ)

Mixabin em ji xeberên terora cinayetkarane ya heval Elî Kaşifpûr endamê komîteya navendî ya Partîya Demokrata Kurdistana Îranê -Rêveberîya Şoreşger, agahdar bûn. Em digel mehkûm kirina vê kiryara terorîtîya rejîma Komara lslamî ya Îranê, şehîdbûna hewal û hevsengerê we, serxweşîyê di dine we û endam û pêşmergeyên partîyê û malbata wî şehîdî. Ev kiryara terorîstî ya rejîma Komara Islamî ne ya yêkan e, ne jî axirîn kiryar bi vî şêweyî di be. Pilanên cinayetkarane û terorîstî yên kirêgirtîyên rejîmê di çend meh û salên borî da, nîşan di de ku rejîma Islamî bernameyên pahin û berîn ji hêzên siyasî yên derveyî welat ra hene.

Hukûmeta hejok û hilzizrîye (bêsibat bûye), ji pêşhatina hindek qewimînên siyasî yên nehatî pêşbînî kirin wehşet heye û rejîm ni kare hindek siyasetên xwe yên darijandî icra bike, evana bûne sebeb ku rejima qirêje Islamî ji bo pevanîna rêya rehetîyê hukûmetê re, dest avêtîye siyaseta terora rêveber û kesên siyasî. Kiryarên terorîstîye Komara

Islamî û kuştina necamêrane ya rêveberên hêzên siyasî, em bawer di kin ku agirê kerib û kîna şoreşgere hêzên bizava pêşketî û şoreşger dijî rejîma dijî beşerî ya Islamî, dê geştir ke û bi şêweke bênav ber, şerekî tund û dirêj dê serbigre û hêzên pêşketî û şoreşger bi hevkarîya hev wî şerî bikine meydana şerekî seranserî û hemû alîyî.

Rejîma Feqîyan nav birina rêveberên bizava pêşketî û şoreşger tenê rêya çareya xwe dizane û bizav jî divê di beramberî cinayetên bêhejmare Islamî, berxwedaneke kêrhatî ji xwe nîşan bi den. Ji bo vê hindê sazimana me careke din vê terorê mehkûm dike û pêwîst dizane ku hemû saziman û hêzên pêşketî û şoreşger li beramberî kiryarên cinayetkarane yên Komara Islamî, çi li nav û çi Ii derveyî welat, tund bi sekinin û hêvîdar in ku xema ji destdana wî şehîdî dê wê rêyê hêsan tir bike. Digel silavên gerim.

Politburoya komîteya navendî ya Sazimana Karkerên Şoreşgere Îranê (Rê ya karker)

Yekê meha şehrîver 69 (22 Tebax 1990)

# PEYAMA SAZIMANA ÇIRÎKÊN FEDAYÎ YÊN XELKÊ ÎRANÊ

Gelî heval û dostan,

Em hemû vira civyane da ku mixabinîya xwe ji terora cinayetkarane ya kek Elî Kaşifpûr nîşan bi din û bîranîna wî gerim xweyî bi kin. Terora cinayetkarane ya kek Elî em ji dil xemgîn kirin. Hem bi delîlê şexsîyet û rola kek Elî di bizava welatê me da û hem ji bo wê hindê dijminê azadî û milet digihe yêkek ji armancên xwe yên şûm da serket.

Lê gelî hevalan, ev zerbên ku bi şoreşgeran di kevin, tinê xem û xiyal nabine nesîbê wan, bel ku her zerb û şikestek ji wan ra di be azimûn û dersek ji bo duwa rojê.Kek Elî, yêkemîn qurbanîyê terorên siyasî yên Komara Islamî ne bû ku bi şêwekî sîstematîk di zêdetir ji dirêjîya salekê da tête terror kirin.

Ev cinayetane berî niha li Viyana, Qibris, Kurdistan û Siwîsê da bi şeweyên cur  cure qewimîne û bê şik eger cidî û ji hemû alîyan da opozisyona şoreşger, dijî wan cinayetan nesekine, Tirkîye jî axirîn cihê cinayetan nabe. Komara Islamî pê teror kirina xebatgerê opozisyonê, armancên girîng digere. Rejîm ji bo vê hindê ku xebatê li ber opozisyonê tengav bike, dixwaze pê teroran bitîrsîne û wehşetê biêxe nav opozisyonê.

Ev terorane nîşan di din ku Komara Islamî bi zeef û bêçare bûna xwe di beramberî daxwazên civata agahe milet da bê deng maye û nîşan di de beramberî kirin gel felaket îro ku hemû alîyan da xelkê serhildaye û dijî sebebkarê wê felaketê da şer dixwaze, wan jî tiştek çinîne ku bersiva vê daxwazê bi din û Komar nav xelkê da bi tevavî tenê maye. Terorên siyasî jî nikarin vê tenê manê bi cebirînin û xêncî xwe verkutana bê hêvî tiştekî din nîne.

Me îman bi vê hindê heye ku tev xelkê û ji bo armancên pêşîya me ve xebatê bikin, ev terorana ni karin îradeya me bihejînin, belkî dê me di rêya dirêjîdana şoreşê ku dijî sermayedarîyê da destpêbûye, dê me tund û tujtir bi ke. Mezin be bîranîna hevalê şoreşger kek Elî Kaşifpûr!

Sernixûn be rejîma teror, îşkence û îdama, Komara Islamî!

Pêk bêt rejîma Komara Demokratîk ya Gel.

# BIRAYÊ HÊJA KEK CELÎL GADANÎ, SEKRETERÊ PARTÎYA DEMOKRATA KURDISTANA ÎRANÊ (RŞ)

Bi mixabinî û teesuf em ji şehadeta Iawê mêrxasê xelkê Kurdistana Îranê kek Elî Kaşifpûr endamê komîteya navendî ye PDK Îranê - rêveberîya şoreşger, li Tirkiyê agahdar bûn. Bi vî şêweyî dijminê dij beşerî, careke din jî bê çare bûnê û istibsalê dest bi cinayeteke rezîlane û wehşîyane kir, ku çu caran ji bîr naçe.

Rejîma dijî beşerî ya Xumeynî ji bû dirêjîdan bi temenê xwe yê qirêj, daxeke rûreşîyê ya mezin li enîya berma xwe daye, ku xêncî serkut kirin heta pê terorên derveyî sînorê Îranê jî ni kare dirêjîyê bi de temenê xwe.

Ez ji alîyê Şûraya Millî ya Miqawemeta Îranê (Şêwra Neteweyî ya Berxwedana Îranê) û tevayî Mucahidîn û şerkerên leşkerê azadîbexşe neteweyî, serxweşîya

xwemalî ji we re û kadir û pêşmergeyên partîyê û tevayî miletê sitem lêkirîyê Kurdistana Îranê û malbata wî şehîdê mezin û xwudanqedire xwe,pêşkêş dikim.

Bêşik ev xwûna pak ya di kele û tevî çemê bi denge xwûna şehîdên me, di demekî ne hind dûr da, dê bibe agirekî gur û her alîyê bigre û dê berbi canê melayên cinayetkar yên hakim û dê binyatên wan bike rejû.

Tevî bawerîya bi pîrozîyê.

**Mesud Recewî**
Berpirsê Şêwra Neteweyî ya Berxwedanê û Fermandarê hemû Leşkerê Azadîbexşe Neteweyî yê Iranê.

Yêkê Şehrîwera 1369ê
22. 8. 1990

# ROJNAMEYA KEYHAN YA HEWAYÎ, HEJMAR 894, RÛPELA 4

Çarşem 7 şehrîwar 1369 beramberî 29ê tebaxa 1990an da terora endamê komîteya merkezî ya Partîya neqanûnî ya Demokrat Ii Tirkîyê da.

Grupa demokrat ya Kurdistanê di bêje ku endamekî nasyare wan,li Tirkîyê da hatîye teror kirin. Berdevkê vê grupê li Parîsê da gotîye ku Elî Kaşifpûr yêkek ji endamê komîteya merkezî yê vê partîyê roja 14.8.1990 ji alîyê sê kesên çekdarê nenas ve bi cihekî birin û roja paştir cenazê wî peyda bûye. Ev di halekê da ye ku dewleta Tirkan kiryarên xwe yên aşkera dijî Kurdan tundtir kirîye, berdevkê navbirî bi aşkera (telwîhen) di bêje destê Îranê vê terorê da heye û Îranê mitehim dike.

BIRA 4

# NIVÎSARÊN JI TIRKÎ HATINE WERGERANDIN

# DI CINAYETÊN SÎYASÎ DA XELEKEKE NÛ: ELÎ KAŞIFPÛR HATE ŞEHÎTKIRIN

Piştî şehît kirina Sekreterê Giştî yê Partîya Demokrata Kurdistana Îranê Dr. A. Qasimlo û hevalên wî li Vîyanayê û heta îro, dijî tevgera welatparêz ya Kurdisiana Îranê,ji alîyê dijminên gel Kurd ve bi zanahî û sistematîk cinayetên siyasî têne kirin. Bi şehît kirina endamê komîteya merkezî yê PDK Îranê, Elî Kaşifpûr, xelekeke nû hate danîn.

15ê tebaxa borî li Tirkîyê, li bajêrê Konyayê şehît kirina endamê komîteya merkezî yê PDK Îranê Elî Kaşifpûr, di nav cinayetên siyasî da xelekeke herî giring tête hejmartin, ku ji alîyê dijminên gelê Kurd ve bi sistematîk têne kirin. Me ev cinayeta "tari", ku ji alîyê çapemenî, raya giştî ya pêşverû û demokrat ve nayê zanîn û bihîstin, ji bo xwandevanên Kurdistan Pressê, li goreyî belgeyên ber dest û agahdarîyên dor berê Elî Kaşifpûr lêkolîy

**Elî Kaşifpûr kî ye?**

Elî Kaşifpûr sala 1957ê li Urmîyê, li gundê Pîrancikê, di malbateke xîzan da hatîye dinyayê. Paşê ligel malbata xwe li gundê Howesinê cîwar bûye.

Xwandina xwe ya ewil li vî gundî, ya navîn li Urmîyê xilas kir. Gava ku li Universiteya Tehranê, li fakulteya siyasî, di sinifa dawî da bû, di 1979an da dijî dîktetorîya Şah, têkilî tevgera gelerî bû. Piştî despêka şerê Xumeynî ya dijî gelê Kurd, li nik gelê xwe, di nav refên PDKÎ da bi tekoşêrî cih girt. Ji ber hindê mecbûr ma, zanîngeh di sinifa dawîyê da terik kir.

Li navçeya Soma-Bradosta, di komîteya herêmê ya PDKÎ da xebitî. Piştî kongreya PDKÎ ya çara, ku 17ê sibatê sala 1979an da li Mahabatê civîya bû, bû

mişawirê komîteya merkezî. Wê demê nexweşîyên ku di nav refên PDKÎyê da peydabûn, ku ji wana ra di gotin"guruha heft neferî" (ya Xenî Bilûryan û hevalên wî) dijî wan derket û li herêmê refên partîyê xurt kirin. Di kongreyên 5, 6 û 7 da li ser hev bû endamê komîteya merkezî. Paşê bû berpirsiyarê pêşmergeyan li komîteya Araratê. Di demê kongreya 7. û 8. da cudahîyê destpêkir. Ligel muxalefetê, ku bi navê PDKÎ - rehberîya şoreşger tête naskirin, cihê xwe girt. Sala 1988ê di konferansa muxalefetê da bû endamê komîteya merkezî.

Elî Kaşifpûr, li herêmê xwudan rûmet û evîneke bilind bû. Di zemanê xwe yê vala da, li gundê xwe bi çandinîyê ve mijûl di bû. Bi gundîyan û bitaybetî bi xortên gund ra di nav peywendîyên gerim da bû. Bo ku xortên gund bixwînin, herdem ew teşwîq dikirin.

Ew pêşengekî sîyasî yê numune û her weha ajîtator û propagandîstekî hêja û fermandarekî pêşmerge ye bijare bû. Di meşandina tevgera eskerî da, dilê gel û pêşmergeyan xweş, dilê dijmin reş dikir, xewa wan direvand. Ji ber hindê şehît kirina wî li herêmê êş û janeke kûr peyda kir. Hêj jî li mala Elî Kaşifpûr xem û şîn dom dike. Dayîka wî ya pîr Nîşan Pîrutî, bi dilê xwe yê xemgîn li çokên xwe di de, hevjîna wî ya ciwan Fatma, bi keser û axîn dilorîne. Şoka bûyerê ji ser xwe ne avêtine. Her çar zarokên Kaşifpûr, ku Ii pey wî mane, di bûyerê nagihin û ji her tiştî bêxeber,temaşayî rewşa malbatê dikin.

**Cinayet çawa pêk hat?**

Xanima Elî Kaşifpûr, digel çar zarokên xwe ji zemanekî dirêj ve, di bin ewlehîya Komîserîya Penaberîya Yêkîtîya Koma Neteweyan li bajêrê Konyayê hatibûne cîwar kirin. Elî Kaşifpûr jî li Kurdistana Rojhilatê bû. Daxwaza penaberîya malbata Kaşifpûr ji alîyê hikumeta Hollandî ve hatibû qebûl kirin. Ji ber ku Elî Kaşifpûr ne amade bû, muameleyên wan yên penaberîyê nedihatin meşandin û hevjîn û zarokan nedikarîn biçine Hollandê. Bihara borî, ji ber van muameleyan Elî Kaşifpûr tê te Tirkîyê. Piştî wî demekê dayîka wî jî tête seradanîya wan. Bê guman ji van çûn, hatin û mayînan dezgehên fermî tim agahdar in. Xûya ye ku emnîyeta canê wan jî di bin berpirsîyarîya van dezgehên fermî da ye. Ji ber ku muamele dûr û dirêj di kêşin, Elî Kaşifpûr jî mecbûr dimîne serî li penaberîya şexsî di de. Muamele dimeşin û ew jî li benda encamê ye. Piranîya wextê xwe li mala xwe derbaz dike, gelek kêm derdikeve derve û di peywendî û girêdanên xwe da hesasîyek micid nîşan dide.

Dijminên gelê me, bi salan, bi rêyên cure cure ceribandine ku wî ji halê rakin. Daku bigihine armanca xwe ewan pir helvest dane pêşîya xwe. Heta 15ê tebaxa 1990ê ev helvest û komployên dijmin hatine betal kirin.

Şeva 15ê tebaxa 1990ê di seet 12ê şevê da, du kes bi libasên polis yek jî sivîl, sê kes têne mala Elî Kaşifpûr. Pirsa wî dikin. Dibêjin em polis in. Elî Kaşifpûr xwe dide nasîn. Paşê ev sê kes dibêjin ku ji ber karekî pêwîstî divê tu bi me ra bêyî qereqolê. Elî Kaşifpûr jî cilikên xwe li xwe dike, bi wana ra derdikeve û diçe. Wekî nazivire malê, xanima wî dikevê şikê. Ji polîsekî berpirsîyarê penaberan ra telefonê dike. Polîs “netirse, endîşe neke, heke polisan biribe, dê lehzeke dî bêt” di bêje. Dotira rojê termê Elî Kaşifpûr, dest û milên wî girêdayî û gullebarankirî, Ii ser rêya Konya û Ankarayê tê te dîtin. Helbet li goreyî belgeyên polîs cinayeteke di jî dikevê nava rêza “faîlên meçhûl”.

Li vê derê yêk ji xalên girîng ev e; Demê cinayetê,anku 15ê tebaxê. Çunkî roja 15ê tebaxê li Kurdistana lranê rojeke taybetî ye. Wekî tête zanîn, roja damezrandina PDKÎ ye. Her weha îsal di 15ê tebaxê da, PDKÎ damezrandina 45. salîya xwe pîroz dikir. Gelo, pêkanîna cinayetê di vê rojê da tesadufî ye?

XaIa girîng ya duwemîn jî; ew kesên ku hatine mala Elî Kaşifpûr bi cilikên polîsan bûne û bi Tirkîyeke gelek xweş axivtine. Girîngtirîn xala dî jî; cihê ku cesed Iê hatîye dîtine, ku pir nêzîkî îstesyona polîsên trafîkê ye. Gelo, ma eve jî hind tiştan nayînin bîra mirov, an eve jî tesadufi ne?

Cenaze li goreyî daxwaza dozger, li Konyayê, ji alîyê şaredarîya bajêr ve tête veşartin. Ew, vêgavê Ii Konyayê, li xerîbîyê, ji welatê xwe bi kîlometreyan dûr di tirbeya xwe da radizê. Dost û hevalên wî, di nav kesereke kûr da ne. Lê li serê çîyayên Kurdistanê pêşmergeyên egît, ku zanahî û ceribandinên eskerî ji Elî Kaşifpûr û gelek Elî Kaşifpûran sitandine, bi mêrxasî şer dikin. Dibêjin; “sund be, em xwûna wan Ii erdî nahêlin”. Dijmin qehir dikin, derbên mezin lê didin, şev û roj nabêjin bi mêranî welatê xwe di parêzin.

Lê di halê da tiştek heye; jan û êşa dilê me be jî, rastîyek e: Dijmin li her alî, bi her rengî lêdide. Eve ne tiştekî ecêb e. Lê em? Gelo em çi dikin? Em dê tenê di cenazeyan da Iorîyan bêjin û bi gotinan xwe bixapînin û bêjin “em teslîmî terorîzmê nabin”?

**S. Bengîn**

Kurdistan Press / 26 çirî 1990, Swêd
(rûpel / 10)
(Wergêrê ji tirkî: Bedirxan Epözdemir)

# DAXÛYANÎYA DI ROJNAMEYA MILLIYETÊ DA (15 TEBAX 1991)

**Bîranîn**

Hevalê me yê hêja Elî Kaşifpûrê Îranî 15. 08. 1990ê Ii bajêrê Konyayê hatîye terorkirin. Em, wekî malbat, dost û Iêzimên wî, her cure terorê şermizar dikin û wî di dilê xwe da dijînin. Em ji dezgehên fermî daxwaz dikin, ku kuştedar bêne girtin.

Malbat û hevalên wî

(Kurdîya wê: Rojan H.)

# DAXÛYANÎYA DI ROJNAMEYA ÖZGÜR GÜNDEMÊ DA (15. 08. 1992)

Endamê komîteya merkezî ya Partîya Demokrat ya Kurdistana Îranê, Elî Kaşifpûr, roja I5 Tebaxa 1990ê; bi destê kuştedarên kirêgirtî yên rejîma Îranê ve hate şehîtkirin, ku bi destura Komîserîya Penabera ya Yêkitîya Koma Neteweyan, bo demekî kurt Ii bajêrê Konyayê wekî penaber dijî. Hikumeta Komara Tirkîyê, divê vê kiryara terorê, ku li ser axa wê hatîye kirin, bide aşkerakirin.

Xelkê Kurdistanê Elî ji bîr nake, Alaya têkoşînê ya Elî, di destên ewle da ber bi serketinê ve pêl dide.

Em Elî bi evîndarî bîr tînin.


Malbat û hevalên wî

(Kurdîya wê: Rojan H.)


## BIRA 5

# ALBUM

# BÎRANÎNA ELÎ KAŞIFPÛR (1957 – 1990)



# EIÎ (YÊ LI MILÊ RASTÊ) DIGEL CANGÎR IŞMAÎLZADE LI GUNDÊ XWE, HOWESINÊ. SAL 1980



# ELÎ (YÊ LI PÊŞÎYÊ) DIGEL HEVALÊN XWE YÊN PÊŞMERGE LI GUNDÊ XWE, HOWESINÊ. SAL 1980



# ELÎ (JI MILÊ ÇEPÊ VE LI SER PÊYA YÊ SÊYEMÎN) DIGEL DR. QASIMLO Û HEVALÊN PARTÎYÊ. SAL 1981



# ELÎ LI ALÎYÊ SERDEŞTÊ. SAL 1986



# ELÎ DIGEL HEVALEN XWE YÊN PEŞMERGE. SAL 1986



# ELÎ (JI MILÊ RASTÊ VE YÊ SERÎ) DIGEL HEVALÊN XWE YÊN PÊŞMERGE. SAL 1986



# ELÎ (JI MILE RASTÊ VE YÊ SERI) DIGEL HEVALÊN XWE YÊN PARTÎYÊ



# ELÎ (YÊ DI NÎVEKÊ DA) DIGEL HEVALÊN XWE YÊN PÊŞMERGE



# ELÎ (JI MILÊ RASTÊ VE YÊ DUYÊ, TIZBÎ DI DEST DA NE) DIGEL HEVALÊN XWE YÊN PEŞMERGE




# ELÎ (YÊ LI MILÊ RASTÊ) DIGEL BIRAYÊ XWE, KERIM. SAL 1989



# ELÎ (YÊ DI NÎVEKÊ DA) DIGEL BIRAYÊ XWE, KERÎM Û HEVALEKÎ XWE. SAL 1989



# ELÎ (YÊ LI MILÊ RASTÊ) DIGEL BIRAYÊ XWE, KERÎM. (BERÎ MIRINA XWE MEHEKÊ. DI HEWŞA MALA LI KONYAYÊ DA.) SAL 1990, MEHA 7



# Î (JI MILÊ ÇEPÊ VE YÊ SERÎ) DIGEL HEVALÊN XWE YÊN PARTÎYÊ LI PARISÊ. SAL 1987



# ELÎ (YÊ LI MILÊ RASTÊ) DIGEL TAHIR NEXŞÎN LI PARISÊ SAL 1987



# ELÎ (YÊ LI BER PANKARTÊ) DI RÊVEÇÛNEKE PROTESTOKIRINA REJIMA ÎRANÊ DA LI PARISÊ. SAL 1987



# ELÎ (YÊ LI MILÊ RASTÊ) DIGEL MIZEFER BEGZADE LI PARISÊ. SAL 1987



# GORA ELÎ LI GORISTANA KONYAYÊ. SAL 1993



# BIRAYÊ ELÎ, KERÎM LI SER GORA WÎ. KONYA, SAL 1993



# HEVALÊ ELÎ, MIZEFER BEGZADE LI SER GORA WÎ. KONYA, SAL 1993



"... Elî hevalekî şoreşger û di nav endamên 'partîya demokrat' da jî hevalekî sosyalîst bû. Heta mirov dikare bêje ku, ew sosyalîstekî ortodoks bû. Wî, digel rizgarîya welatî, Kurdistaneke sosyalîst jî bo xwe kiribû armanc. Belêm digel vê bîr û bawerîya xwe, şertên şoreşa neteweyî jî ji bîr nedikirin û şertên civatê didan ber çavên xwe û goreyî wê xebata xwe didomand. Ji ber vê çendê jî rûmeta wî di nav pêşmerge û her baskên xelkê da gelekî bilind bû. Ji xwe piranîya pêşmergeyan jî ji binemalên hejar dihatin, lewma sempatîya pêşmergeya li beramberî wî di dereceya herî bilind da bû..."

Rojan H.

